We evaluated 160 epicedes according to verse type, it was found out that 61 are qasides, 7 are odes (gazelle), 35 are murabba(square), 21 are muhammes (pentestich), 24 are mesnevis, 5 are terci bends, 1 is terkibi bend, 2 are museddes, 1 is muselsel, 2 are murebbe' and muserra terkib-tercii bend verse types were written.

As result of evaluation that done on 160 epicedes it was found that when these epicedes were written 8 bahir 18 aruz prosodies were used and the most used prosody was fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun prosody was used 49 times.

### **Destpêk**

Êş û elema ku ji ber mirina kesekî bi însan re peyde dibe pir dijwar e ku ji ber vê yekê dilê însan diîşe û pê mehzun dibe. Li gorî Paul Velery “Bedena însên, cîhanê dike du beş: A ewil cîhana reng û xweşiyê û ya duyemîn jî cîhana êş û elemê” (Breton, 2019:19). Derheqê êş û elemê de Breton jî wisa dibêje: “Eşa ku di nava bedena însên de cî girtiye, têkiliya wî him ji dunyayê û him jî ji însan bi xwe qut dike” (Breton, 2019:19).

Ev êş û elema ku bi însan re peyde dibe û di destpêkê de di nav civak û gelan de wek şîn û zêmarê xwe nîşan dida, di edebiyata rojhilat de wek mersiye *tê binavkirin ku* mersiyeñûs di mersiyeýen ku dinivîsin de ji ber mirinê; *şînê digirin, dikanferyad û fîxan*, dua dikan, pesnê kesê mirî didin, rondikan dirjînin û ji felekê re bertek nîşan didin.

Me di vê xebata xwe de berê xwe da kevneşopiya mersiyeýê ya ku di edebiyata kurdî ya kurmancî ya klasik de cî girtiye û di van sedsalên dawî de gelekî zêde pêşve çûye. Lewra heta îro di warê mersiyeyan de yên ku bi kurdiya kurmancî hatine nivîsandin de tu xebatê zanistî û ‘ilmî nehatine kirin ku ev yek jî pêdiviya hebûna xebateke berfireh û zanistî derxist holê. Di vê gotarê de dabeşkirina mersiyeyan a li gorî sedsalan li ser 279 mersiyeýen ku hatine berhevkirin, hat kirin û dema ku mersiye ji hêla teşe û qalibê ve hatin nirxandin û derheqê wan de rêje hatin dayîn jî bes 160 helbest di vê çarçoveyê de hatin nirxandin ku me yek bi yek qalib û behra van mersiyeyan tespit kir û li gorî van tespit di nav xebata xwe de cî da van daneyan. Her wisa beşen ku pêwîst e di mersiyeke klasik de hebin beş bi beş hatin nirxandin û ji mersiyeñûsan mînakêن cûrbecûr hatin dayîn. Bi vê xebatê *tê armanckirin* ku destpêk, pêşveçûn û rewşa dawî ya kevneşopiya mersiyeýen ku bi kurmancî û bi şîklê klasik hatine nivîsandin bê tesbîtikirin da ku xwînêr û lêkolîner karibin jê bi hêsanî feyde bigirin.

206

### **1. Mersiye**

Mersiyeaya (مراحی مرضیة) ku koka wê ye di erebî de tê maneya “li ser kesê mirî girî û ji bo wî şîn girtin (Toprak, 1990: 2). Di ferhengan de derheqê mersiyeýê de pênasên wisa tên kirin: Matema manzûmî (Kanar, 2011:788); Lawij, xweşniyaz, xweşxwaz, dûrika miriyan (Îzolî, 2013:885); Helbesta ku ji bo tê de pesnê kesê mirî bê dayîn û xemgînî û kovana ji ber mirinê bê nîşandan, hatiye nivîsandin (Pala, 2014:306); Nezma ku bi mebesta diyarkirina wesfên baş ên zilamekî ku miriyê û ji bo anîna zimên a ji ber êş û kerba ku ji ber mirina wî zilamî têن kişandin, hatine nivîsandin (Sami, 1978:1321); Strana matemî ya ku ji bo tê de pesnê kesê mirî bê dayîn hatiye nivîsandin, helbestên ku nexusim ku di wan merasimên ku ji ber salvegera Hesen û Huseyînê lawên Elî tên tertîpkirin, têxwendin (Redhouse, 198:1805); Bi girî hejmartina başî û qencyîn kesekî ku miriye (Naci, 1990: 602). Mersiye, wek terîm jî bi gelempêrî ji wan helbestên ku piştî mirina kesekî ji bo nîşandayîna xemgîniyê hatine nivîsandin re tê gotin (Îsen, 2012:4).

Meriv dikare helbestên ku wek mersiye hatine nivîsandin wek cihê lêgerîna derd û kulan û tesellî-kirina dilê ku ji ber fîraqê êş û elemê dikşîne bi nav bike. Lewra kesê ku mir êdî nema tê. Ev heqîqet ji teref însanan ve pir baş tê zanîn ku ji ber vê yekê helbestvan ji bo barê dilê xwe parîkekî be jî sivik bike, tişten di dilê xwe de di helbestê de tîne zimên. Bi vê yekê huzna ku ji ber windakirina kesê ku jê tê hezkirin di van kelîmeyê mersiyeyê de dibe xwedî ruh (Göçemen, 2020). Helbestkar dema ku vê yekê dike exlebe di destpêkê de huzn û xemgîniya xwe tîne zimên. Piştî vê yekê şâ'ir dest bi duayan û daxwazkirina sebrê dike. Lewra kesê bawermed dizane ku Xweda di Qur'ana Kerîm de dibêje: "Qesem be! Em ê we piçekî bi tîrs û birçîbûnê; bi kêmkirina mal û can îmtîhana bikin. Mizgînê bide wan kesen ku sebir dîkin. Ew, dema ku tiştek tê serê wan dibêjin 'Em ji bal Xwedê hatin û em ê vegezin ba wî'" (Beqere:154-155). Ji ber vê yekê kesê ku mersiyeyan li ser nasê xwe dinivîsîne digel şînê serî li sebr û duayê dide. Breton di berhema xwe de derheqê çareseriya êş û elemê de wisa dibêje: "Însanê bawermend divê bi sebir be û li ber xwe bide. Ji bo kesê bawermend dermanê ewil ibadet û dua ye (Breton, 2019: 88). Divê bê gotin însan ji ber êşa ku dikşîne sebir dike, lê belê digel vê sebrê carcaran di mersiyeyan de ji ber mirina ku pêk hatiye ji felekê re sîtem, gazin û gîlî tê kirin (Bayram, 2018). Ji bili vê yekê ger ji mirinê re kesek bûbe sedem di şûna felekê de ji wî kesî re bertek tê nîşandan û nifir li wî kesê musebbîb tê kirin (Yörür, 2018) û bi vî awayî ji bo nifşen bê ew mersiye di warê yadkirin û bîranînê de dibin amûreke muhîm (Korkmaz, 2002) û di nav civakê de cihekî taybet digirin û însanan dîkin bin tesîra xwe.

Mersiyeya ku di edebiyata erebî de derketiye holê û ji wê derê jî di nav gelên Rojhilata Navîn de bi gotineke din di nav faris, kurd û tirkan de belav bûye, ji bo bê nivîsandin divê muheqqeq pêwendîyê kesê nivîskar û mirî bi hev re hebe da ku karibe wê êş û elemê di bedena xwe de hîs bike û derd û kulen xwe di helbestên xwe de bîne zimên. Lî belê ev qaîdeya ku me anî zimên carinan derbasdarbûna xwe winda dike. Bi gotineke din mersiye li ser kesekî mirî yê ku têkiliya wî, bi kesê nivîskar re tune ye jî dikare bê nivîsandin. Lewra kesê ku mir ger di nav civakê de bê nasîn, jê bê hezkirin û yan jî rayedarê dewletê be wê demê ev nêzbûn û têkilî dibe yek alî (Canım, 2010:130) ku di edebiyata rojhilat de mînakên vê gelek zêde hene.

Helbesta yekemîn a ku însan ji ber êş û elama fîraqa mirinê gotiye bi şîklê mersiyeyê ye û ji ber ku Kabîl, birayê xwe Habîl qetil kiriye Hz.Adem bi vî şîklî mersiyeyek gotiye (Toprak, 2004:215 ). Latîfi derheqê helbesta yekem a bi şîklê mersiyê de agahîyeke wisa dide:

"Di wan kitêbên dîrokî de veşartî ye û di qisseyêن wan kesen xwedî lisan in û ehlê karê xwe ne de eşkere ye ku Hezrefî Adem; bavê însanan e, melekên muqarrabîn jê re çûne secdê û ferhenga axavtinê cara yekem jê re hatiye daxistin û ew yekem kes e ku kelama bi qafîye kiriye. Û ji dema wî vir ve ev kelama bi qafîye hat gotin û her ku çû zêdetir bû. Dema ku Kabîl birayê xwe Habîl qetil kir, ji dilê pak û paqîj a Adem aleyhîsselam rehetî û kêfxweşî koç kir û di çavên wî de ji ber vê qetlê nûr nema. Lewra Habîl him lawê wî û him jî dostê wî bû. Ji ber vê yekê perîşan bû û her tim çend beytên ku di terza mersiyeyê de bûn bi deng dikir û dixwand"(Latîfi, Vgz: Canım, 2018:12).

Digel ku tê zanîn mersiyeya ewil a ku hatiye nivîsandin ne bi zimanê erebî ye jî wek gelek teşeyen nezmî, mersiye jî di edebiyata erebî de derketiye holê û ji wir jî di nav edebiyata rojhilat de belav bûye. Destpêka kevneşopiya mersiyeyê ya di nav ereban de ji wan merasimên cenazeyê di dewra

cahiliyê de dest pê dike. Faruk, derbarê vê yekê de di xebata xwe de agahiyeke wisa dide: “Destpêka mersiyeyê ya di edebiyata erebî de digihêje wan gotinên bi qafîye û bi aheng ên ku di dewra cahiliyê de ji teref jinan ve di merasîmîn cenazeyê de dihatin gotin” (Toprak, 2004:215). Nimûneya herî kevnar a mersiyeyê di edebiyata erebî de mersiyeya Hansa ye ku wê mersiyeya xwe li ser du birayê xwe yên ku di şer de hatine kuştin nivîsandiye (İsen, 1944:5). Hansa dema ku birayê wê yê bi navê Muawîye di şerekî de tê kuştin, li ser wî şîn girê daye û rondik barandine. Pişti kuştina Muawîye, di şerekî din de jî kesê bi navê Sahr ê ku birayê Hansayê ye, dema ku hewl dida tola birayê xwe hilîne tê kuştin (Mawaldı, 2020:35) ku Hansayê li ser wî jî şîn girtiye û li ser her du birayê xwe mersiye gotine. Kevneşopiya mersiyeyê ya ku di edebiyata erebî de pêşve çû û gihaşt lütkeya xwe digel temamî taybetmendiyê xwe derbasî edebiyata farisî bû. Li gorî çavkaniyan kevneşopiya mersiyeyê di edebiyata farisî de di sedsala VIIIan de dest pê kiriye (İmamî, 1369:9) û di vî warî de mersiyeñûsê ewil Rûdekî (m.940) ye ku wî mersiyeyek li ser Ebu'l Hesenê Muradî (m.914) û mersiyeyek jî li ser Şehîdî Belxî (m.935) nivîsandiye (Selçuk, 2013:7). Mersiyeyê ku di edebiyata farisî de hatine nivîsandin dîbin sê beş: Mersiyeyê ku li ser padışah û mezinên dewletan hatine nivîsandin, mersiyeyê ku li ser şexs û malbatê hatine nivîsandin û mersiyeyê mezhebî (Mu'temem, 1333:47). Di edebiyata İranê de di van çend sedsalân dawî de ji van her sê beşan mersiyeyê mezhebî pir zêde derketin pêş û niha jî balan dikşînin li ser xwe. Ev mersiye, piranî li ser Hz. Huseyîn û ehlî wî yên ku di 10ê Muharrema sala 61ê Hicrî (Mîladî: 10 Cotmehê sala 680) de li Kerbelayê hatin qetilkirin, hatine nivîsandin (Kirmanî, 1371:104) ku ji ber vê yekê ji bo van mersiyeyê mezhebî navê *Maqtelê Huseyn* (Güven, 2017:36) jî tê bikaranîn. Di warê mersiyeyê Kerbelayê de berhema mensûr a herî kevnar di sedsala IXemîn de ji teref Molla Huseyîn Kaşîfi (m.1504) ve hatiye nivîsandin ku navê vê berhema wî Rawzatu'-Ş-Şuheda ye. Di vê kitêba ku ji çend rawzayan pêk tê de qala wê musîbeta ku hatiye serê Hz. Huseyîn û ehlî wî tê kirin (Kirmanî, 1371:110). Ji heyama Safewîyan pêve di warê mersiyeyê mezhebî de gelek zêde mersiye hatine nivîsandin. Lewra di dewra Safewîyan de Şîitî bû mezheba fermî ya dewletê ku ji ber vê yekê di vî warî de gelek zêde şâ'ir mersiye nivîsandin (Yazıcı, 2004:218) û ev kevneşopiya mersiyeyê ku derheqê meseleya Kerbelayê de hatin nivîsandin hebûna xwe heta roja me ya îro bi şikleke xurt domandin. Her sal di 10ê Muharremê de li İranê ji bo Hz. Huseyîn û ehlî wî bêñ bîranîn merasîmîn bi navê sînezen têñ tertîpkirin û li ser şehadeta wan mersiye têñ gotin, şîna wan tê girtin û li ser wan rondik têñ rijandin. Di edebiyata klasik a tirkî de jî, di warê mersiyeyê de helbesta ewil di sedsala XIVan de ji teref Ahmedî (m.1413) ve li ser mirina Suleyman Şahî (m.1387) begê Germîyanan hatiye nivîsandin (Çavuş, 2008). Pişti wî di wê qonaxê de Şeyhî (m.1431) dîsa ji Yaqubê duyemîn (m.1429) ê ku ji mala Germîyanan e re di teşeya tercîbend de mersiyeyek nivîsandiye (İsen, 1944:8).

### 1.1. Destpêk û Pêşveçûna Kevneşopiya Mersiyeyê di Edebiyata Kurdiya Kurmancî de

Em di sedsala XVIIan de li rastî nimûneya ewil a mersiyeyekê têñ. Li gorî M. Xalid Sadînî û Celâdet Bedirxan (m.1951), Feqiyê Teyran (m.1660) li ser wefata helbestvanê hevdemê xwe Melayê Cizîrî (m.1641) mersiyeyeke bi navê *Îro Girya Me Tê* nivîsandiye.

Ev mersiyeya ku Sadînî û Bedirxan diyar dike, Teyran li ser wefata Cizîrî nivîsandiye ji 24 çarîr neyan pêk tê.

Feeqî vê mersiyeya xwe bi qaliba arûzê ya *Mustef'ilun Mustef'ilun (Recez - - + - / - - + -)* nivîsandiye. Dema ku em li naveroka helbestê mêze dikan, dibînin ku ev helbest di sala 1640î de hatiye nivîsandin. Feeqî dîroka wefata Cizîrî bi vê çarînê bi me dide zanîn:

*Heyf eyn û lam bûne cuda  
Şîn û girîn dîsa te da  
Em razîne b' emrê Xuda  
Herçî ji dergahê te tê* (Sadinî, 2014:139)

Divê bê gotin, di warê dîroka jidaykbûn û wefatkirina Teyran û Cizîrî de nîqaş û lihevnekirinek heye. Li gorî hinek nivîskar û lêkolîneran Teyran û Cizîrî hevdemên hev in û Teyran vê mersiyeyê li ser wefata Cizîrî nivîsandiye; lê belê li gorî hinek lêkolîner û nivîskaran jî Teyran û Cizîrî ne hevdemên hev in û Teyran vê mersiyeyê li ser Cizîrî nenivîsandiye.<sup>2</sup> Heger em mersiyeya bi navê *Îro Gîrya Me Tê* li ser navê Teyran bihesibînin, em dikarin bibêjin di sedsala XVIIan de bes Teyran mersiye nivîsandiye. Di vê bergehê de jî em dikarin bibêjin ku ev sedsal ji hêla mersiye û mersiyenûsiyê ve gelekî lawaz e.

Di warê mersiye û mersiyenûsiyê de ev lawazbûn bi heman awayî di sedsala XVIIIan de jî berdewam dike. Dema ku em li qerna XVIIIan mêze dikan em dibînin ku di warê mersiyeyê de şâ'irîn bi navê Axayokê Bêdarî (m.?)<sup>3</sup> û Ehmedê Xanî (m.1707) mersiye nivîsandine. Di vê qernê de Axayokê Bêdarî li ser du lawêñ xwe yên ku li pey hev wefat kirine û Ehmedê Xanî jî li ser Mîrê Bazîdê Muhammed Beg mersiyeyek nivîsandiye.

Mersiyeya ku Ehmedê Xanî li ser Mîrê Bazîdê nivîsandiye tev de ji 34 beytan pêk tê û destpêka mersiyeya wî wisa ye:

*Kanê Muhammed beg gelo? Ka Padîşahê Serhedan?  
Îro ji dil bigîrîn dilo! Ka Padîşahê Serhedan?* (Durre, 2002:336)

Mersiyeya ku Axayokê Bêdarî li ser mirina her du lawêñ xwe nivîsandiye ji 8 muxemmes/pêncîneyan pêk tê. Destpêka mersiyeya ku Bêdarî nivîsandiye jî bi vî awayî ye:

*Sed mixabin vê cewabê ez ji dil nalan kirim  
Taquet û qûwet nema min belkî ez bêcan kirim  
Leşkerê derdan geha min ji 'eqlî talan kirim  
Min nema qet xew bi carek bêser û saman kirim  
Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan kirim* (Doskî, 2020:42)

2 Ji bo agahîyên zêdetir ên derheqê mijarê de binêrin:

-M. Xalid Sadînî, *Feqîyê Teyran, Jîyan Berhem û Helbestêñ Wî*, Stenbol 2014, Weş. Nûbihar, r.36-54.

-Herokal Ezîzan(Celadet Bedirxan), *Klasikén Me*, Kovara Hawar, Stenbol 2012, Weş. Belkî h.33, r.559-560.

-D.N. Mackenzie, *Melayê Cizîrî û Feqî Teyran* (Jî Îngîlîzî: Abdullah İncekan), Kovara Nûbihar Akademî, Stenbol 2016, c:2, h.6 s.3, r.130-133.

3 Derheqê dîroka wefata Bêdarî de tu malumat nîne. Lê belê em dizanin ku Bêdarî mersiyeya xwe ya li ser du lawêñ xwe di sala 1728an de nivîsandiye ku ji ber vê yekê bes em dikarin bibêjin ku Bêdarî di sedsala XVIIIan de jiyyaye.

Ger Teyran û Cizîrî hevdemên hev bin û Teyran mersiyeya xwe ya bi navê *Îro Giryâ Me Tê* li ser Cizîrî nivîsandi be wê demê em derheqê mersiyenûsiya di sedsalên XVII û XVIIIan de dikarin bibêjin ku di edebiyata klasik a kurdiya kurmancî de mersiyeya ewil ji teref Feqiyê Teyran ve di sala 1640î de li ser wefata Melayê Cizîrî hatiye nivîsandin û piştî Teyran bi dorê em li rasta mersiyeyê Xanî û Bêdarî tê. Em dîroka nivîsandina mersiyeya Bêdarî dizanin, lê belê derheqê ya Xanî de agahiyeke teqezi li ber destêne me tune ye. Lê digel vê em dikarin bibêjin ku di vî warê de mersiyeya duyemîn a Xanî ye. Lewra tê zanîn ku Xanî di sala 1707an de çûye rehma Xwedê û Bêdarî jî mersiyeya xwe ya li ser du lawên xwe yên ku li pey hev wefat kirine di sala 1728an de nivîsandiye ku wî dîroka wefata lawên xwe di benda çaremîn (Doskî, 2020:42) a mersiyeya xwe de destnîşan kiriye. Ji ber van daneyan em dikarin bibêjin ku di edebiyata klasik a kurdiya kurmancî de mersiyenûsî bi Teyran dest pê kiriye û bi Xanî û dû re bi Bêdarî berdewam kiriye.

Di warê mersiyenûsiyê de di sedsala XIXemîn de bes em li rasta mersiyeya ku ji teref Weda'î (m.1850) ve hatiye nivîsandin tê. Ev mersiyeya Weda'î tevde ji 38 çarîneyan pêk tê. Weda'î vê mersiyeya ku ji 38 çarîneyan pêk tê li ser kuştina Şêxî Begê Mîrê Miksê (m.1821) nivîsandiye. Ji mersiyeya wî xuya dibe ku Şêxî Begê Mîrê Miksê di sala 1821ê de hatiye kuştin. Em vê yekê ji çarîna dawî ya mersiyeya ku hatiye nivîsandin fam dikin. Weda'î di dawiya mersiyeya xwe de dîroka mirina Mîrê Miksê, bi tîpên ebcedê wiha diyar kiriye:

*Ya qenc ew e em vê bikeyn*

*Navî li tarîxê bideyn*

*Bo 'Xeyn û Rê û Lam û Zeyn*

*Kanê Cihangêrê Cihan* (Dêreşî, 2012: 100)

210

Li gorî hesabê ebcedê ji misraya sêyem a vê çarîneyê ev tarîx derdikeve: X (1000), R (200), L (30), Z (7): 1237. Ev jî di dîroka mîladî de beramberê sala 1821ê ye.

Em dikarin bibêjin di sedsalên XVII, XVIII û XIXemîn de mersiyeyên ku hatine nivîsandin ji hêla teşeya nezmê ve exlebe bi çarîneyan û li ser edîb, alim, mîr û lawikan hatine nivîsandin.

Dema ku em derbasî qonaxa sedsala XXemîn dibin em dibînin ku di edebiyata klasik a kurdiya kurmancî de di warê mersiyenûsiyê de pêşveçûnek li darî çavan heye. Lewra di vê sedsalê de bi gelek cureyên nezmê tevde 111 mersiye hatine nivîsandiye. Navê mersiyenûsên sedsala XXan û hejmara mersiyeyên ku nivîsandise bi vî awayî ye:

Navê Helbestvan	Hejmara Mersiyeyê Wî
Şêx Evdirrehmanê Axtepî (Amedî, 2016)	1
Şêx Evdilqadîrê Hezanî (Hezanî, 2016)	1
Mela Mihemedê Liceyî (Liceyî, 2012)	5
Şêx Mihemed Kerbelayî (Kerbelayî, 1992)	1
Mela Abdullahê Hazrowî (Hazrowî, ?)	1
Mela Yahya (Yahya, 2021)	1

Mela Zubeyr (Taşkin, 2017)	1
Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî (Qewmanî, 2011)	5
Seyid Qedî Haşimî (Haşimî, 2016)	1
Mele Ehmedê Nalbend (Nalbend, -)	12
Seyid ‘Eliyê Findikî (Findikî, 2014)	4
Mehmet Nuri Payçu (Gümgüm, 2018)	1
Fehmî Begê Pêçarî (Demir, 2019)	4
Mela Surûrî (Gemi, 2018)	1
Ehmedê Namî (Temo, 2019)	1
Mela Ebdulfettahê Hezroyî (Hezroyî, 2012)	9
Mela Nezîrê Bedewî (Bedewî, 2012)	11
Mela Muhammedê Nûrî (Turğut, 2019)	1
Mela Beşîrê Bedewî (Bedewî, 2013)	4
Ebdurrehman Efem (Amedî, 2004)	1
Mela Sîraceddinê Xelîlî (Gümüş, 2020)	3
Şêx Mûsayê Şêxanî Gundikî (Çetîn, 2019)	1
Mela Yusrî (Gezer, 2015)	2
Şêx Mela İsmetullah (‘İsmetullah, ?)	1
Mela Zahirê Tendurekî (Tendurekî, 2007)	27
Şêx İsmetullahê Karazî (Karak, 2020 )	5
Mela Hesenê Qerenazî (Zinar, 1991)	3
Mela ‘Ebdussemed Comanî (Amedî, 2004)	2
Mela Mûsayê Mizî (Zinar, 1991)	1

Di vê sedsalê de li gorî wan sedsalên din ji hêla kesên ku mersiye li ser wan hatine nivîsandin ve gelek guhartin çêbûne. Dema ku em li helbestvanên vê sedsalê mêze dîkin em dibînin ku vêcarê mersiye li ser şêx, qîz, bira, bav, rewşenbîr, bûyera Kerbelayê û kesên ku di nav kurdan wek rêber derketine pêş hatine nivîsandin. Wek mînak: Şêx Evdirrehmanê Axtepî (m.1905), Şêx Muhammed Kerbelayî (m.1939), Fehmî Begê Pêçarî (m.1969) û Mela Muhammedê Nûrî (m.1977) li ser hedîseye Kerbelayê ya ku tê de Hz. Huseyîn hat qetilkirin; Şêx Evdilqadirê Hezanî (m.1908), Mela Mihemedê Liceyî (m.1912), Mela Mûsayê Mizî (m.?),<sup>4</sup> Mela Abdullahê Hazrowî (m.1947), Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî (m.1956), Mela Yahya (m.1951), Mela Zubeyr (m.1956), Mela Zahirê Tendurekî (m.1966), Seyid ‘Eliyê Findikî (m.1967), Mela Ebdulfettahê Hezroyî (m.1975), Mela Nezîrê Bedewî (m.1976), Mela Sîraceddinê Xelîlî (m.1983), Şêx Mûsayê Şêxanî Gundikî (m.1991), Şêx İsmetullah (m.1996), Mela Surûrî (m.1973), Mela Hesenê Qerenazî (m.1989) û Seyid Qedî Haşimî (m.1961) li ser wefata şêxan; Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî û Mela Muhammedê Nûrî li ser mirina bavê xwe;

4 Dîroka wefata wî nayê zanîn. Bes tê zanîn ku wî li ser wefata Şêx Muhammed Ziyaüddînê ku di sala 1924an de wefat kiriye mersiyelek nivîsandiye ku ji ber vê yekê me ew jî di nav mersiyanûsên sedsala XXemîn de nîşan da.

Ehmedê Namî (m.1975) li ser axayê xwe; Mehmet Nûrî Payçû (m.?) û Ebdurrehman Efem (m.1982) li ser alim û zanayan; Mela Beşîrê Bedewî (m.1981), Mela ‘Ebdussemed Comanî (m.1993), Mela Nezîrê Bedewî, Seyid ‘Eliyê Findikî, Fehmî Begê Pêçarî li ser kesên mîna Şêx Se’îd, Seîdê Kurdî, Mela Mis-tefayê Barzaniyê ku di nav Kurdan wek rîber hatine qebûlkirin; Mele Ehmedê Nalbend (m.1963) li ser kurr û xanima xwe û Fehmî Begê Pêçarî, Mela Beşîrê Bedewî li ser birayê xwe mersiye nivîsandine.

Dema ku em van mersiyeyê ku hatine nivîsandin bi tevahî binirxînin em dikarin bibêjin ku di sedsala XXemîn de edebiyat klasîk a kurdiya kurmancî hem ji ber hejmara mersiyeyan, hem ji ber kesên ku li ser wan mersiye hatine nivîsandin û him jî ji ber zêdebûna cureyên teşeyêne nezmê yên ku pê mersiye hatine nivîsandin gelek zêde pêş ve çûye. Tişta balkêş ew e ku digel ku mîrektiyêne kurdan hatibin rûxandin jî tradîsyona mersiyanûsiyê qet lê navber nehatiye dayîn û bi şikleke eşkere pêşve çûye. Di vê sedsalê de mersiyanûsê ku balan dikşîne li ser xwe Mela Zahirê Tendurekî ye. Wî di berhema xwe de li ser şêx û murşîdê xwe bi teşeyêne nezmê yên curbecur 27 mersîye nivîsandine.

Tradîsyona mersiyanûsiyê piştî sedsalâ XXan di sedsalâ XXIan de jî hebûna xwe bi şikleke xurt û dewlemend didomîne. Di vê sedsalê de helbestvan tevdî 164 mersiye nivîsandine. Navê mersiyanûsê sedsalâ XXIan û hejmara mersiyeyê ku nivîsandine bi vî awayî ye:

<b>Navê Helbestvan</b>	<b>Hejmara Mersiyeyên Wî</b>
Mela ‘Eliyê Baqûstanî (Baqûstanî, 2017)	7
Seydayê Tîrêj (Tîrêj, 2014)	14
Mihemmed Emîn Heyderî (Heyderî, 2011)	1
Şêx Muşerref Xinokî (Xinokî, 2018)	3
Mela Ebdullahê Kotalî (Sönmez, 2018)	3
Mela Ehmedê Zinarexî (Zinarexî, 2018)	1
Seydayê Gurdilî (Yetiz, 2012)	7
Abdulqadîr Bingol (Bingol, 2008)	1
Şêx Hamdullahê Behwarî (Behwarî, 2021)	2
Mela Abdullahê Babnîrî (Babnîrî, 2012)	5
Jan Dost (Dost, 2011)	1
Şêx Muhammed Nûrî (Kaya, 2019)	4
Mela Muhammed Gulnarê Miksî (Hakan, 2010)	1
Ehmed Yalar (Yalar, ?)	2
Mela Husnî Hezîn (Aykaç, 2015)	3
Mela Ehmedê Xelatî (Xelatî, ?)	97
Seyid Ehmed Erzen (Erzen, 2021)	1
Mela Imadeddin Reşpojan (Amedî, 2004)	2
Tehsîn İbrahîm Doskî (Doskî, ?)	5
Mele ‘Izzedînê Kefrî (Feqîr, 2008)	1

Muhammed Şîrînê Fetlewî (Amedî, 2004)	1
Mela ‘Ebdulhadiyê Comanî (Amedî, 2004)	1
Seyyid M. Hesîb Haşimî (Amedî, 2004)	1

Ji bo vê sedsala XXIemîn em dikarin bibêjin kevneşöpiya mersiyenûsiyê ya di sedsala XXan de bi heman xûrtbûn û dewlemendbûna xwe, hebûna xwe domandiye û di vê sedsalê de bi teşeyên curbecur tev de 164 mersiye hatine nivîsandin. Di vê sedsalê de Şêx Hemdûllahê Behwarî, Mela Ehmedê Xelatî, Mela Husnî Hezîn, Mela Abdullahê Babnirî, Seydayê Gurdilî (m.2021), Mela Ebdullahê Kotalî (m.2014), Şêx Muşerref Xinokî (m.2004), Mihemed Emîn Heyderî (m.2003), Mela ‘Eliyê Baqûstanî (m.2002) li ser şexan; Mela Ebdullahê Kotalî li ser birayê xwe; Mela Ehmedê Xelatî, Mela ‘Eliyê Baqûstanî li ser lawê xwe; Mela Abdullahê Babnirî li ser qîza xwe; Şêx Muhammed Nûrî li ser bavê xwe; Ehmed Yalar, Tehsîn Îbrahîm Doskî, Jan Dost li ser dayika xwe; Mela Muhammed Gulnarê Mîksî li ser mîrekî; Tehsîn Îbrahîm Doskî, Mela Abdullahê Babnirî, Şêx Muşerref Xinokî, Seydayê Tîrêj, Mela ‘Eliyê Baqûstanî li ser seyda û aliman; Mela Abdullahê Babnirî, Abdulqadîr Bîngol, Seydayê Gurdilî, Mela Ehmedê Zinarexî (m.2018), Seydayê Tîrêj (m.2002), Muhammed Şîrînê Fetlewî, Mela ‘Ebdulhadiyê Comanî (m.2004), Seyyid M. Hesîb Haşimî, Mela Imadeddin Reşpojan li ser kesayetên ku di nav Kurdan de wek rîber û pêşewa hatine qebûlkirin; Seydayê Gurdilî, Seydayê Tîrêj li ser siyasetmedaran; Seydayê Tîrêj li ser helbestvan û rewşenbîran; Ehmed Yalar ji ber daxwaza hevalê xwe li ser apê hevalê xwe û Seydayê Tîrêj jî li ser hunermendêñ kurdan mersiye nivîsandine.

Di vê sedsalê de helbestvanê ku di warê mersiyeyan de pir balan dikşîne li ser xwe Mela Ehmedê Xelatî ye ku wî ji ber wefata lawê xwe û dergistiya wî tevde 90 mersiye û li ser şexan jî 7 mersiye nivîsandine. Xelatî, van mersiyeyan piştî ku lawê wî û bûka wî di qezayê de rehmet dikin re dinivîse. Meriv dikare dîwana wî wek dîwana medhiye û mersiyeyan biwesfîne. Di dîwana wî de 148 helbest hene ku ji van 97 helbest mersiye ne.

Ji bo sedsala XX û XXIemîn tiştekî din a muhîm heye ku destnîşankirina wê pêwîst e. Dema ku em van her du sedsalan dinêrin em dibînin mersiyenûs herî zêde li ser şêx û lawên xwe mersiye nivîsandine. Li gorî xebata ku hat kirin, di sedsala XX û XXIemîn de 95 mersiye li ser şexan û 101 mersiye jî li ser kuran hatine nivîsandin. Mela Zahirê Tendurekî bi 27 mersiyeyen ku li ser şexan nivîsandiye û Mela Ehmedê Xelatî jî bi 90 mersiyeyen ku li ser lawê xwe nivîsandiye derdikeve pêş.


### 1.2.Li Gorî Sedsalan Hejmara Mersiyeyen ku Hatine Nivîsandin

Sedsal	Hejmara Merîsiyeyen ku Hatine Nivîsandin
XVII	1
XVIII	2
XIX	1
XX	111
XXI	164

## 2.Vekolîna Mersiyeyan ji Hêla Teşe û Rûxsarê ve

### 2.1. Mersiye ji Hêla Şiklên Nezmê ve

Di çarçoveya xebatê de 160 mersiye ji hêla teşe û rûxsarê ve hatin nirxandin û hat tespîtkirin ku ji van 160 mersiyeyan; 61 mersiye bi teşeya qesideyê, 7 mersiye bi teşeya xezelê, 35 mersiye bi teşeya murabbe'ê, 21 mersiye bi teşeya muxemmesê, mersiyeyek bi teşeya texmîsê, 24 mersiye bi teşeya mesnewiyê, 5 mersiye bi teşeya tercîî bendê, mersiyeyek bi teşeya terkîb bendê, 2 mersiye bi teşeya museddesê/şerîste, mersiyeyek bi teşeya muselselê, 2 mersiye jî bi teşeya Terkîb-Tercî'a Murebbe' û Muserra hatine nivîsandin.



214

Grafiik 1: Grafiika ku rêjeya cureyên helbestan nîşan dide

### 2.2.Taybetiyê Rûxsarâ

#### 2.2.1.Wezn

Di 160 mersiyeyen ku teşeyên wan ên nezmê cûr bi cûr in de tevde 8 cure behr hatine bikaranîn û mersiye bi 18 qalibê erûzê hatine nivîsin.

Behra ku di 160 mersiyeyan de zêdetirîn hatiye bikaranîn bi dorê behra remel, hezec û recez e. Wek qalib, ya zêdetirîn hatiye bikaranîn qaliba fa'latun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun a behra remelê ye ku pê 49 mersiye hatine nivîsandin; piştre mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun a behra Hezecê tê.

Em dikarin li jê re hejmara wezn û behrên ku pê 160 mersiye hatine nivîsandine wisa bi rêz bikin:

**Behrê Helbestan**

**Hejmara Helbestan**

**1.Behra Recez:**

Mustef’ilun Mustef’ilun Mustef’ilun Mustef’ilun	14
Mustef’ilatun Mustef’ilatun	6
Mustef’ilun Mustef’ilun	13

**2.Behra Hezec:**

Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun	32
Mefa’îlun Mefa’îlun Fe’ûlun	7
Mefa’îlun Mefa’îlun	7
Mef’ûlu Mefa’îlu Mefa’îlu Fe’ûlun	2
Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Fe’ûlun	4

**3.Behra Remel**

Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun	10
Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilun	49
Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilun	2
Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilun	2
Fa’ilatun Fa’ilatun	1

215

**4.Behra Muteqarib**

Feûlun Feûlun Feûlun Feûl	3
---------------------------	---

**5.Behra Munserih**

Mustef’ilun Fe’ûlun Mustef’ilun Fe’ûlun	1
---	---

**6.Behra Besît**


Mustef’ilun Fa’ilun Mustef’ilun Fa’ilun	1
---	---

**7.Behrê Muzari’**

Mef’ûlu Mefa’îlun Fe’ûlun	3
---------------------------	---

**8.Behra Muctes:**

Mef’ûlu Fa’ilatun Mef’ûlu Fa’ilatun	3
-------------------------------------	---



**Grafik 2: Graffika ku râjeya behrên erûzê nîşan dide**

### 3.Taybetiyê Mersiyeyê ji Hêla Naverokê ve

Me di beşa berî vê de ji hêla teşeyêne nezmê ve mersiyeyênu ku di edebiya klasik a kurdiya kurmancî de hatine nivîsandin nirxandin. Em ê di vê beşê de jî ji hêla naverokê ve mersiyeyênu ku hatine berhev-kirin, binirxînin.

216

Mersiyeyênu ku di edebiyata klasik a kurdî de hatine nivîsandin, di nav xwe de bi gelempêri beşen mîna; fanîbûn û zalimbûna dunyayê, sîtema ku ji felekê re tê nîşandan, şîngirtin, pesindayîn, kirina duayan, daxwazkirina sebrê û temenniyan dihewînin. Em ê li jê rê yek bi yek van beşan binirxînin.

#### 3.1. Mirin

Dema ku nas û hezkiriyêne ïnsanekî dimirin, êş û elema fîraqa wî kesê mirî zor û zehmetiyeke dijwar dide însen û wî gelek zêde mehzûn dike ku ji ber vê yekê tebatî nayê meriv. Lewra êş û elema mirinê tehl e û gelek zêde bi zehmet e. Ji ber vê yekê di vê pêvajoyê de cîhana êş û elemê ya însen dide pêşîya cîhana reng û xwesiyê ya însen (Breton, 2019:19) û dibe sedema kişandina êş û elemê.

Di mersiyeyêne kurdî de mirin geh dibe sedema kişandina êş û eleman, geh dibe deriyê wesletê, geh dibe xala dawîbûna derd û kûl û eleman û geh jî dibe wasitaya qebûlkirina barê giran a mirinê.

Di vê malika jêr de mirin dibe sedem ku mersiyenûs êş û elemê bikşîne û tehma zor û zehmet, tehl û nexwesbûna mirinê mêze bike.

*Wa hestera tehl e mirin tekye dîwan ma bê mezin*

*Ji qelbê hezîn dernakevin ji kî bikin şikayetê (Xelatî, ?:221)<sup>5</sup>*

<sup>5</sup> Li gorî beyanata Mele Ehmed, ji vê berhemê tevde 150 nusxe hatine çapkirin, lê belê li ser kitêba ku hatiye çapkirin ne navê çapxaneyê ne dîroka çapkirinê û ne jî bajara ku lê hatiye çapkirin nehatiye diyarkirin.

Di vê çarîna jêr de jî ji ber êş û elema ku ji ber mirinê tê kişandin mersiyenûs gazin û giliyan ji mirinê bi xwe dike û bêçaretiya xwe ya li hember wê tîne zimên.

*Ahîn ji destê mirinê,  
Fayde nake ji gotinê  
'Umir kin e di vê dinê,  
Kanî reisê ummetê* (Baqûstanî, 2017:95)

Mersiyenûs ji ber êş û elema ku dikşînin car car êdî nema idare dîkin û tebat nayê wan û ji bo dawî-bûna vê êş û elemê daxwaza mirinê ji Rebbê xwe dîkin.

*Heta mirinê ji bîr nakim Xuda derdê ciger zor e  
Şifa nabim xilas nabim me êş sîroz û qanser e* (Xelatî, ?:113)

Piştî êş û elema ku ji ber mirinê tê kişandin û daxwazkirina mirinê re, vê carê jî mirin xwe bi xwedîyê mersiyeyê dide qebûlkirin.

*Xweş tu bawer be bira her kes li ber roja xwe ye  
Ku ci qasî em bijîn dawî mirin para me ye* (Tîrêj, 2014:369)

Di hinek mersiyeyên kurdî de em dibînin şâ'ir formateke nû li mirinê bar dike û ji bo wesleta li Rebbê xwe mirinê teleb dike.

*Min ji îqbala xwo ew ro kirye gazinde û şekat  
Xwoşîyek min jê nedîte çend min kir bît û xebat  
Talibim wesl û riza te bessin ev 'emir û heyat  
Paşî mirinê serferaz bim ehlê îslah û reşad* (Nalbend, ?:3)<sup>6</sup>

### 3.2. Şîn-Girîn

Besa herî muhîm a mersiyeyan şîn û girîn e. Lewra mersiyenûs rîyeke ku ew tê de karibe bimeşe, derd û kûlên xwe yên ji ber mirinê lê bireşîne digere da ku ew karibe li wê derê derd û kulê xwe bîne zimên ku ew rê û war mersiye bi xwe ye. Dema ku mersiyenûs helbesta xwe dinivîsîne; êş û elama ku dikşîne tîne zimên, vê yekê li derdorê dide hesandin û ji ber vê yekê şînê digre û dest bi girî û nalînê dike ku di mersiyeyan de carcar tê dîtin bes ne şâ'ir tenê bi heman awayî temamê alem û tabîtetê jî digel mersiyenûs ji ber mirina ku pêk hatîye şînê digire. Di mersiyeyen kurdî de ji bo şîngirtinê exlebe peyvîn mîna: *Ax û ax, çû, rihlet kir, dirîx, hesret, ah û enîn, feryad, fixan, nale, feryadîres, hewar, qêrîn, heywax, zar û zar, birîn, nalîn, xezeb, fîraq, afat, bela û hwd.* têbikaranîn. Ji 160 mersiyeyen ku hatine nivîsandin bend an jî beytên ewil ên 96 mersiyeyan bi şînê, êş û elema fîraqê û şîngirêdanê dest pê dîkin.

Şair dema ku bi rastî û heqîqeta mirinê re rû bi rû dimîne dest bi ah û fixanê, nalenalê, feryad û fîxanê dike:

<sup>6</sup> Ev berhemâ bi navê "Baxê Kurda, Dîwana Mela Ehmedê Muxlus Kurê Emînê Nalbendê Bamernî" ya ku ji teref Tehsîn İbrahîm Doskî ve tê amadekirin hêj nehatîye çapkirin.

*Ez im tahî birînkûr im di nêv mecrayê van wadan  
Li min rabû çemê êş û elem ez qetr û her cadan  
Bi ahem xûn derûn dertê ji nêv ehşâ û ekbadan  
Bi heyran bim werîn bêjin gelî wildan û şehzadan* (Karak, 2020:264)

Barê firaq, êş û elema mirinê ji şâ'irî re ew qas giran tê ku ew destnîşan dike temamê mislimanan, ins û cinan, tiştên jîndar an nejîndar ji ber vê mirinê mehzûn dîbin:

*Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û melek  
Êşa fû 'ad medxa 'elek ser deftera ehlê dila* (Karak, 2020:267)

### 3.3. Pesindayîn

Di mersiyeyan de beşeke din a ku derdikeve pêş dayîna pesnê kesê mirî ye ku dema ku ev pesindayîn tê kirin ji hûnerên edebî gelek zêde sûd tê wergirtin û bi van hûneran ew kesê ku mirîye ger alim be, pesnê wî di warê ilmê de ger rêber be, pesnê wî di warê jêhatibûn û kêrhatibûn de û ger endamekî malbatê bi xwe be, pesnê wî yê di nav malê de tê dayîn û qala qencî û başiyên wî kesî tê kirin.

Dema ku em li mersiyeyen li ber destênen xwe mîze dikin em dibînin ku di bend an jî beytên ewil ên 18 mersiyeyan de, mersiye bi pesindayîna kesê mirî dest pê dike. Divê bê gotin ku di mersiyeyen kurdî de bi peyvîn mîna: *Canfida, Şîrîna Ferhad, Zîna Botan, şérîn, şehbaz, hebîb, dîlrûba, rimbaz, çeşmê şehla, esed, mislê Xalid, meş'ela, xawer, şemsa munîr, şêxê cihan, cewher, serwer, ehlê suhbet, şemsa dinê û hwd.* pesnê kesê mirî hatiye dayîn.

Ger kesê mirî, mîr an jî axa be wê demê di warê idarevantî, şervantî û mîrantiya wî de pesnê wî tê dayîn:

*Romê dema 'esker dikir  
Bê hedd û bê defter dikir  
Mîr leşkerê wan ker dikir  
Kanê Cihangêrê Cihan* (Dêreşî, 2012:95)

*Axê me Haco ê dilovan,  
Xemxwarê feqîr û jarêne Kurdan* (Temo, 2019:770)

Kesê ku mersiye li ser wî hatiye nivîsandin ger kesekî ku di nav kurdan wek rêber û pêşewayekî hatibe qebûlkirin be wê demê qala fazîlet, qencî û başiyên wî têne kirin û dû re di warê fedakarîyê de pesnê wî tê dayîn. Di çarîneya jêr de pesnê Şêx Seîd û di pêncîneyê de jî pesnê Seîdê Kurdî de tê dayîn.

*Wa şehîdê meyî Palo  
Dîsa rehber be delalo  
Milletê te mane halo  
Were pêş 'ya musulmana* (Zinarexî, 2018:104)

*Canfida bû qehreman bû, dest bi şûrê ilmê dîn,  
Nur dixwend û Nur dirêt û her zaman û an û hîn.  
Ger bixwazî wî binasî, wer Risalén wî bibîn.  
Beyreqa ko wî hilanî jibo vî dînê mubîn.  
Me çiqa pirsî û seh kir vê demê kes dî nebî.* (Bingol, 2008:165)

Eger mersiye li ser kesekî ehlê ilm û tesewûfê hatibe nivîsandin, wê demê pesindayîn bi peyvên ku bi ilm û tesewûfê re girêdayîne têñ kirin:

*Heyat û raheta dil bû di nav sahib dilan gul bû  
Di zikrê heq de bulbul bû gelo kan Hezretî Sanî* (Hezroyî, 2012:180)

Di kurdî de gelek mersiye yê li ser şehadeta Hz. Huseyîn hatine nivîsandin hene ku dema di van mersiye yê de pesnê Hz. Huseyîn tê dayîn navê wî bi Hz. Muhammed, Hz. Alî, Hz. Fatima û Hz. Hesen re tê zikirin ku ev yek ji bo nîşandana qedr û qiymeta Hz. Huseyîn tê kirin.

*Rewneqê fushetserayê Mustefa yî ya Huseyn  
Werdê der gulşennewayê dilkula yî ya Huseyn* (Demir, 2019:174)

### 3.4. Sîtema ji Felekê re

Ji berê ve dema ku di nav civakê de tiştekî nebaş an jî kovandar û elemnak pêk tê însan felekê wek berpirs û mesûldarê vî tişte ku pêk hatiye dibînin û gazinan jê dikin. Ev yek wek adetekê di nava civakê de cihê xwe girtiye û hêj berdewam dike.

219

Derheqê hêmana felekê ya ku dikeve nav hêmanê alema kozmîkê de gelek nirxandin hatine kirin û gelek mane lê hatine barkirin ku yek ji wan jî ji teref Îskender Pala ve hatiye kirin. Pala derheqê vê hêmana felekê de ku şâ'ir wê wek mesûlê mirinê dibînin, nirxandineke wisa dike:

*“Li gorî baweriya ku çavkaniya wê pergala Batlamyos e; dunya navenda kaînatê ye û 9 felek dunyayê dorpêç kirine. Bi dorê rêza van gerstêrk/seyyareyan wisa ye: Heyv, Utarîd, Zuhre, Tav, Merih, Muşterî û Zuhal e. Di feleka heştemîn de burc û stêrkên sabît ên ku naleqin hene. Di feleka nehemin de feleka atlas heye ku ev felek a herî mezîn û bilind e û temamê felekan dorpêç dike. Dema ku ev felek dizîvire zext li wan felekên din jî dike da ku digel wî bi aliyê ku ew dizivire ve bizivirin. Bi gotineke din ew, wanen jî vê yekê re mecbûr dihêle. Ji ber vê yekê ew felekên ku berawajiya îstîqameta xwe dizivirin tesîr li ser talîh, refah, bext, kêfxweşî û şadiya însanan dikin. Sedema gazin û giliyên însanan a ji felekê ev e. Ji ber ku pişti feleka nehemin ilmê Xweda dest pê dike, însan gazin û giliyên xwe li vê felekê dikin û wê wek mesûla qedera xwe dibînin»* (Pala, 2014:149).

Dema ku em li mersiye yê kurdi dinêrin em dibînin ku şâ'ir felekê wek mesûlê mirina ku pêk hatiye dibînin û jê gazinan dikin.

*Felek mala te nava sed hezar car  
Te em hiştin hejar û dilbirîndar  
Ka Berzanî kawayê Kurd û serdar  
Felek nîne li te bextê te li tu insan* (Bedewî, 2013:176)

Di mersiyeyên kurdî yên li ber destê me de ev peyv û wesf ji bo felekê têbikaranîn û bertek jê re tê nîşandan: *Xayîn, bêsoz, bêbext, neyar, zâlim, kor, xurt û zor, xiyanet, kîndar, bêwefa, rûsiya, mala te ne ava, feleka wêran, har, xeddar, bêminwet, bêtîbar, bêwicdan, bêdîn û hwd.*

### 3.5. Dunya-Axiret

Di bin vê beşê de ji bo peyvîn dunya û axretê em dikarin bibêjin ku di mersiyeyan de dunya geh warê xweşî û bextewariyê ye û geh jî cihê kişandina êş û eleman e. Lê her çiqas mirin ji şâ'irî re tehl were jî ew dizane ku ev dunya fanî ye û ew ê jî rojekê bimire û biçe axretê ku ew vê baweriya xwe jî ji dînê İslâmî werdigre û axretê wek warê wesletê dibîne. Di mersiyeyan de bi gelempêrî ji bo dunya û axretê ev peyv hatine bikaranîn: *Fanî, denî, behrê xem, qirêj, warê êş û eleman, ne hêja û biteqreq, 'alem, milk, bax, 'uqba, baqî, dar 'ul-beqa û hwd.*

Dema ku em li mersiyeyên kurdî dinêrin em di hinek cihan de dibînin ku dunya li ber çavê şâ'ir şêrîn û xweş e; lê belê bi mirina ku pêk tê dunya li ber çavên wî reş dibe.

220

*Evê dinya xweş û şêrîn bi çavê min çiqas reş bû  
Çikim ba zîv û zêr û mal di piştî şahê Zîlanî* (Yetiz, 2012:201)

Di mersiyeyan de tê dîtin ku mersiyenûs piştî kişandina êş û elama ji ber mirina kesê li ber dilê wî şêrîn e, vêcarê bi hebûna heqîqeta mirinê dihese û diyar dike ku ji mirinê rev tune ye û ew ê rojekê derkeve pêşîya wî bi xwe jî.

*Çi qasî tu li dinyayê bimînî  
Tu dê mirnê bi çavên xwe bibînî* (Tîrêj, 2014:144)

Ji ber êş û elama ku têt kişandin şâ'ir dike nale nal, feryad û fixan û dû re balan dikşîne li ser derbasdarbûyîn û fanîbûna dinyayê.

*Te bîghînin heyâ mala te ya heq  
Ji vê dinya ne hêja û biteqreq* (Tîrêj, 2014:144)

Mersiyenûs piştî van qonaxên ku me qala wan kir re vêcarê hêmana axretê derdixe pêş û axretê wek wargeha hatina ba hev a digel kesê ku wefat kiriye diwesfine û lavayî ji Xwedê dike da ku wî bigihîne wî kesê ku wefat kiriye.

*Eger ci dîtina te ma keser bo me- erdayê  
Xweda mehrûm neke-j wê qencîyê tu vî ricakarî* (Doskî)<sup>7</sup>

<sup>7</sup> Nusxeya vê mersiyê wek dosyaya wordê ji Tehsîn İbrahîm Doskî hat girtin.

### 3.6. Sebir

Şa>ir di mersiyeyên xwe de ji ber êş û elem û fîraqê him xwe tesellî dike û him jî kesên li derdora xwe. Ev têgeha bi navê sebir hema hema di temamê mersiyeyên kurdî de cihê xwe girtine û ew ji şâ'irî re bûne wargeha bêhnvedan, tesellî û taqatê. Dema ku sebir tê xwestin peyvên mîna *bike, bide, hêvî* tê bikaranîn.

Di mersiyeyên kurdî sebir bi form û şiklên cuda xwe nîşan didin ku em ê di vê beşê de digel mînakî li ser van birawestin.

Mersiyenûs ji ber êşa ku tê kişandin ji Xwedayê ku pê îman anîye sebrê daxwaz dike da ku ew li ber vê êş û elemê bibe xwedî taqet û sebir bike.

*Ger şestî umur kim û bimînim li heyatê  
Bêjim ji eswel da kul û derdê di sebatê  
Nabit ku xelas bin ji ewel ta sekeratê  
Hêvî ji Xweda min bide sebr û qene'atê  
Minet ji Xwedê ra ku ji bo min hewes i* (Zinar, 1991:264)

Di hinek mersiyeyên kurdî de piştî sebirkirin an jî sebirnekirinê şair ji qedera xwe re teslîm dibe û bes qezencikirina riza Xwedê teleb dike.

*Hikmeta wî kes nizanît çare teslîm û riza  
Keyf û xem xoşî û nexoşî pêkve nabin hemquerîn* (Nalbend, ?:28)

221

### 3.7. Dua-Temennî

Beşa duayê di temamê mersiyayan de beşeke muhîm û taybet e. Mersiyenûs di vê beşê de ji bo kesê mirî rehmetê teleb dike û ji Rebbê aleman daxwaz û temennî dike ku wî bike cennetê. Her wisa di vê beşê de dua tê kirin da ku sebrê bide wî bi xwe û ehlê kesê mirî. Mersiyenûs di vê beşa duayê de bi daxwaz û temenniyêن cuda cuda derdikeve pêşıya me.

Ji formên duayê ya ku ewil derdikeve pêşıya me û ji teref mersiyenûsan ve gelek zêde tê bikaranîn daxwaza rehmê ji Xwedê ye. Mersiyenûs bi lavayiyan ji Rebbê xwe daxwaz dike ku ew, rehma xwe li ser kesê mirî bibarîne û wî efû bike.

*Dikin hîvî ji te îlahî  
Rehmet bide li rûhe bahî  
'Efû bike birayê Dahî  
Dahiyê bi nal û derd û zara* (Bedewî, 2012:233)

Mersiyenûs dema vê yekê dike efûkirina xwe jî ji Xweda teleb û hêvî dike.

*Ilahî 'efû ke min û da û bab  
Di heşrî hilîne li ser min hisab* (Turğut, 2019:223)

Mersiyenûs bi duayên ku dike, ji Rebbê xwe ji bo kesê mirî daxwaz dike ku qebra wî bi nûrê tije bibe, bibe bexçeyek ji bexçeyê cennetê û fireh û geş bibe.

*Seyda rabû hicir kir berê xwe da axretê  
Seyda wacib eda kir Xuda lê kir rehmetê  
Qebra Seyda fire bî wekî Rewda Cennetê  
Soz û ehdek mezin bî tu car nakim ji balê* (Çetîn, 2019:168)

Formateke din a duayên ku ji bo kesê mirî tê kirin daxwazkirina têketina cennetê ye. Şa'ir bi duayên ku dike daxwaz dike ku ew biçe cennetê, têkeve nav hûriyan.

*Serde hat emrê humayûn pel ji darê weşîya  
Cem Xelîlullah li 'Urfayê Medîna Enbiya  
Rihleta qutbê cihanê huzn û şîn da her ciya  
Ci di nêv rewza cinan bax û bihişa hûriya  
Hûn bikin hemdê Xuda vê mujdeyê xem bes revîn* (Amedî, 2004:104)

Di berdewama hinek duayan de tê xwestin ku kesên ku mirine bibin cîranê Resûlê Xwedê û tê lavayîkirin ku Resûlê Xwedê ji bo wan bibe şefaatkar.

*Eya Rebbî dikim zarî ji zatê re eya Barî  
Bibî cennet evî jarî bi Nebîyê axirê zemanî* (Erzen, 2021)

Hinek gotinên ku di mersiyeyên kurdî de ji bo duayê têñ bikaranîn bi vî awayî ne: *Ya reb wê texî cennetê, şâ key bi lu'tfû rehmetê, salat û selamê mubarek temîz, her şâ bit ev cennetmegam, biçne cem seyda bedî' pê ra biçin cennetê, qebra Seyda fire bî wekî Rewda Cennetê ,em dikin hîvî ji te ya Reb bibe wî cennetê, bi wan re tu min jî bibî Cennetê, Bibî cennet evî jarî bi nebîyê axirê zemanî, rehmet û şefqet ji bo wan kullu yewmun fî mezîd û hwd.*

### 3.8.Nifir

Di mersiyeyên kurdî de em dibînin ku nifir li wan kesên ku Hz. Huseyîn û ehlê wî qetil kirine û li wan kesên ku ji qatîlen wî re bûne alîkar tê kirin. Di warê nifirê de mersiyeya ku herî zêde derdikeve pêş berhema bi navê *Mersiyename*'ya Mela Muhammed Nûrî ye. Ev berhem tevde ji 679 malikan pêk tê û tê de beşeke taybet a bi navê mel'ene (le'netkirin) heye ku ev beş tevde ji 124 malikan pêk tê.

Di çend beytên *Mersiyename*'ya Mele Nûrî de; ji Şemer, Sinan, Bin Ziyad, Bin 'Umer, Yezîd û ji kesên ku ji van kesan re bûne terefdar re wisa le'net tê xwendin:

*Idî le'netî ser Şemer hem Sinan  
Çewan wan şehîdkir Imami cuwan* (Turğut, 2019:205)  
*Li ser Bin Ziyad le'neta Zulcelal  
Çewan wî şehîd kir Huseyni delal* (Turğut, 2019:209)

Di warê le'netanînê de mala Aktepiyan jî bi mersiyeyêن xwe derdikevin pêş. Şêx «Ebdurrehman Aktepî û Şêx Mihemed Kerbelayî di mersiyeyêن xwe de wisa le'netê ji kesên qatil re dixwînin:

*Huseyn xonçeyê baxê Alê 'Eba*

*Şehîd kir ewî le'netî rû sîya* (Amedî, 2016:280)

*Sed hezar l'anet dibêjin ser Yezîd û tabi'an*

*Behrê wan mezlûmê meqtûlanê xakê Kerbela* (Kerbelayî, 1992:23)

### **Encam**

Ger Teyran û Cizîrî hevdemêن hev bêن qebûlkirin û ger mersiyeya bi navê *Îro Girya Me Tê* ji teref Teyran ve li ser Cizîrî hatibe nivîsandin wê demê em dikarin bibêjin ku mersiyeya ewil a bi kurdiya kurmancî di sedsala XVIIan de bi gotineke din di sala 1640î de hatiye nivîsandin û kevnoşopiya mersiyeyê ya di edebiyata kurdiya kurmancî ya klasîk de bi vê helbestê dest pê kiriye.

Kevneşopiya mersiyeyê her çi qas di sedsalêن XVII, XVIII û XIXan de lawaz be û di vî warî de gelek mersiye nehatibin nivîsandin jî em dibînin ku di sedsalêن XX û XXIemîn de ev kevneşopîya mersiyeyê gihaştîye lûtkeya xwe. Di encama lêkolînê de tevde 279 mersiyeyêن ku bi kurdiya kurmancî hatine nivîsandin, hatin berhevkirin û hat tespîtkirin ku di sedsala XVIIemîn de 1 mersiye, di sedsala XVIIIemîn de 2 mersiye, di sedsala XIXan de 1 mersiye, di sedsala XXemîn de 111 mersiye û di sedsala XXIemîn de jî 164 mersiye hatine nivîsandin. Weke ku ji hejmara mersiyeyêن ku hatine nivîsandin jî tê fêmkirin qernêن herî zêde yên ku tê de mersiye hatine nivîsandin sedsalêن XX û XXIemîn in û di warî de pêşîvan Mela Ehmedê Xelatî(97 mersiye) û Mela Zahirê Tendurekî(27 mersiye) ye.

223

Hat tespîtkirin, di sedsala XX û XXIemîn de herî zêde li ser şêx û kuran mersiye hatine nivîsandin. Di encama xebatê de derket holê ku di sedsala XX û XXIemîn de 95 mersiye li ser şêxan û 101 mersiye jî li ser kuran hatine nivîsandin. Di vî warî de Mela Zahirê Tendurekî bi 27 mersiyeyêن ku li ser şêxan nivîsandiye û Mela Ehmedê Xelatî jî bi 90 mersiyeyêن ku li ser lawê xwe nivîsandiye, pêşîvantîyê ji vê yekê re dikin.

Me ji hêla teşe û rûxsarê ve 160 mersiyeyan nirxand. Di netîceya vê nirxandinê de derket holê ku 61 mersiye bi teşeaya qesîdeyê, 7 mersiye bi teşeaya xezelê , 35 mersiye bi teşeaya murabbe'ê, 21 mersiye bi teşeaya muxemmesê, mersiyeyek bi teşeaya texmîsê, 24 mersiye bi teşeaya mesnewiyê, 5 mersiye bi teşeaya tercîî bendê, mersiyeyek bi teşeaya terkîb bendê, 2 mersiye bi teşeaya museddesê/şerîste, mersiyeyek bi teşeaya muselselê, 2 mersiye jî bi teşeaya Terkîb-Tercî'a Murebbe' û Muserra hatine nivîsandin. Weke ji daneyêن ku hatin dayîn jî tê famkirin mersiyeyêن kurdî herî zêde bi teşeaya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsandin. Her wisa hat tespîtkirin ku 160 mersiyeyêن kurdî bi 8 cure behr û bi 18 qaliban hatine nivîsandin ku ji van qaliban a ku herî zêde pê mersiye hatine nivîsandin qaliba fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilun a ku behra remelê ye ku pê 49 mersiye hatine nivîsandin.

*Mersiyename'*ya Mela Muhemmed Nûrî ya ku li ser meseleya Kerbelayê hatiye nivîsandin, di warê mersiyenûsiya kurdî de cihekî taybet digre. Lewra ev mersiye tevde ji 679 malikan pêk tê û ew bi vê hecma xwe di nav mersiyeyêن kurmancî de mersiyeya herî dirêj e.

Di ekseriyetê mersiyeyan de besên mîna; mirin, şîn-girîn, pesindayîn, sîtema ji felekê re, dunya û axret, sebir, dua-nifir hene ku ev beş di mersiyeyê kurdî de bi şiklekî xurt û baş hatine şuxilandin. Hat tespîtkirin ku di mersiyeyê kurdî de herî zêde beş û temayêن mîna; şîn, kişandina êş û elemê, reşgirêdan û rondikrijandin derdikeve pêş. Lewra ji 160 mersiyayan, tev de 96 helbest bi şîn, girîn û bi êş û elema ku ji ber mirinê tê kişandin, dest pê dikin.

Wek encam dikare bê gotin ku kevneşopiya mersiyeyê ya ku di destpêkê de lawaz û hejmara wê hindik bû, di sedsala XXan de bi şikleke aşkere pêşve çûye û di sedsala XXIemîn de jî hebûna xwe bi teşeyêن nezmê yên cûr bi cûr bi şikleke xurt û dewlemend hêj didomîne.

### Çavkanî

- Amedî, Z. (2004). *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî'uzzemân*. Diyarbekir: Söz.
- \_\_\_\_\_. (2016). *Şerha Rewdul Neîma Şêx Ebdurrehman Aktepî*. Diyarbekir: Seyda.
- \_\_\_\_\_. (2004). *Dîwana Seyda Hecî Ebdulfettah Hazroyî*. Diyarbekir: Destxet.
- Aykaç, Y. (2015). *Dîwana Hezîn*. Bîngol : Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanê Jîndar Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî Teza Lîsansa Bilind.
- Babnîrî, M. E. (2012). *Dîwana Babnîrî*. Stenbol: Nûbihar.
- Baqûstanî, M. 'E. (2017:94). *Dîwana Baqûstanî, Metn û Lékolin M. Zahir Ertekin*. Bîngol : Zankoya Soran.
- Bayram, M. (2018). *Enderunlu Fazıl'in III. Selim Mersiyesi (İnceleme-Metin)*. Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Haziran 2018: 19, Cilt: 21 - Sayı: 39, s.19-37.
- Bedewî, M. B. (2013). *Dîwana Bêxew*, Tehsin İbrahîm Doskî(amd.). Stenbol : Nûbihar.
- Bedewî, M. N. (2012). *Dîwana Dahî*, Tehsin İbrahîm Doskî(amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Behvarî, Ş. H. Helbestek ji dengê ku hatiye qeydkirin û ji yek jî ji qeyda ku li ser internetê hatiye weşandin hat deşîf-rekirin: <https://www.youtube.com/watch?v=Bla-1FAOXDI> adresinden alındı, Dîrok:26.03.2021.
- Bingol, A. (2008). *Kulîkîn Baxê Botan*. Stenbol : Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Breton, D. L. (2019). *Acının Antropolojisi*, İsmail Yerguz(Çev.). İstanbul: Sel.
- Canım, R. (2010). *Divan Edebiyatında Türler*. Ankara: Grafiker.
- Çavuş, M. S. (2008). *Türk Edebiyatında Mersiye*. Atatürk Üniversitesi Türkîyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, h.38, r:131-138.
- Çetîn, R. (2019). *Şêx Mûsayê Şêxanî Gundikî û Berhemên Wî yên Menzûm*. Mêrdîn: K.T. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Teza Lîsansa Bilind (Neçapkirî).
- Demir, Y. (2019). *Dîwana Namî(Fehmî Begé Pêçarı)*: "Meğmuru 'd Dewawîn". Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Turkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Teza Lîsansa Bilind(Neçapkirî).
- Dereşî, S. (2012). *Dîwana Weda'î*. Stenbol: Nûbihar.
- Doskî, T. Î. (2020). *Baxê Îrem, Geştek li Nav Şî'ra Kurmanciya Klasik, M. Zahir Ertekin(Amd)*. Stenbol : Dara.
- \_\_\_\_\_. (?). *Cima ey dil bi vî rengî tu iro key elemdarî*. Mersiyeya ku li ser Seydayê Nasuriddînê El-Banî hatiye nivîsandin, ev helbest wek word ji Doskî hat girtin.

- Dost, J. (2011). *Dîwana Jan*. Stenbol : Avesta.
- Durre, A. (2002). *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*. Stenbol : Keskesor.
- Erzen, S. E. (2021). *Dilo Rabe Feqîr û Jar Ketin Li Ser Te Kul Bê Miqtar*(Erzen vê mersiyeyê li ser apê xwe Seyyîd Elyê Findikî nivîsandiye). YouTube: Di 26.07.2021ê de ji malpera <https://www.youtube.com/watch?v=ZQOvjICEigI> hat girtin.
- Ezîzan, H. (2012). *Klasikên Me*, Kovara Hawar, Stenbol, Weş. Belkî, h.33, r.559-560
- Feqîr, B. (2008). *Kerbela Meşhedâ Îmam Huseyn (Tîpguhezî: Osman Akdax)*. Stenbol : Tevn.
- Findikî, S. E. (2014). *Dîwan (amd. Selman Dilovan-Huseyn Şemrex)*. Stenbol : Nûbihar.
- Gemi, A. (2018). Mersiyeyek li ser Wefata Şêx ‘Elî Riza Efendî, *Nûbihar*, 60-61.
- Gezer, S. (2015). *Dîwana Mela Yasîn Yusîrî, Metn û Lékolîn*. Çewlîg: Teza Lîsansa Bilind(Neçapkîrî), Zanîngeha Çewlîgê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Tirkiyeyê.
- Göçemen, Y. (2020). *Cahiliyeden Endülüsün Yıkılışına Kadar Arap Edebiyatında Şehir Mersiyeleri*. Kilis 7 Aralık Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, C:7, S:1, s:277-320.
- Gümgüm, A. (2018). *Dîwana Serda(Selaheddînê Gimgimî)- Derdê Welat*. Stenbol : Nûbihar.
- Gümüş, N. (2020). *Gulcivîn- Dîwana Mela Siraceddinê Xelili*. Stenbol : Nûbihar.
- Güven, A. M. (2017:36). *Sahâbe-i Kirâm’ın Hz. Peygamber İçin Yazdıkları Mersiyeler*. Konya : T.C. Necmettin Erbakan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslâm Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı Türk-İslâm Edebiyatı Bilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi(Neçapkîrî).
- Hakan, S. (2010). Ji Wida hetta Mele Muhammed Gulnarê Niksî û pêwendîya helbestvan û mîrên Miksê. *Nûbihar*, 45-47.
- Haşimî, S. Q. (2016). *Dîwana ‘Îrfan (Edisyon-Kritik-Amdeker M. Nesîm Doru)*. Stenbol : Nûbihar.
- Hazrowî, M. E. (?). *Ev mersiyeya bi navê “Hicreta sahib cemalî ey gelê yarê zebûn “ji teref Mela Abdullahê Hazrowî ve li ser Şêx Selîmê Hezanî nivîsandiye*. -: Destxeta Ehmed Yalar a li ber destê me.
- Heyderî, M. E. (2011). Mersiyeyek li ser Şêx ‘Elaeddîn, Tîpveguzhêr: Selam Ertekin. *Nûpelda*, 67.
- Hezanî, Ş. E. (2016). *Dîwan(Tîpguhêzî: Mela Birhanê Tarîni)*. Diyarbekir : Lîs.
- Hezroyî, M. E. (2012). *Dîwan (amd. Tehsîn İbrahîm Doskî)*. Stenbol : Nûbihar.
- Îmamî, N. (1369). *Mersiyelerayî Der Edebiyatê Farîsî Iran*. Tehran: Weşanxaneya Deftera Navendî ya Cihadê Danişgahî.
- Isen, M. (2012). *Dile Duran Ölüm*. İstanbul: Kapî.
- \_\_\_\_\_(1944). *Aciyi Bal Eylemek Türk Edebiyatında Mersiye*. Ankara: Akçağ.
- İsmetullah, Ş. M. (?). *Ev mersiyeya bi navê “Hewar e hey hewar e bû di seyda xem û xewxayê” Şêx Mela ‘Îsmetullah li ser Şêx Muhammed Selîmê Hezanî nivîsandiye*. ?: Destxeta Ehmed Yalar.
- Îzolî, D. (2013). *Ferheng(Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî)*. Stenbol: Deng.
- Kanar, M. (2011). *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*. İstanbul: Say.
- Karak. (2020). *Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn Û Lékolîn)*. K.T. Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî,, Teza Lîsansa Bilind a Neçapkîrî.
- Kaya, H. (2019). *Dîwana Şêx Muhammed Nûrî (metn û lêkolîn)*. Wan : K.T. Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê Enstîtuya

- Zimanê Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Kerbelayî, Ş. M. (1992). *Dîwana Kerbelayî*. Stenbol : Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Kirmanî, A. E.(1371). *Nigerîşî be Mersiye-serâî der Îrân*. Tehran:Weşanxaeneya Ittilâ'at
- Korkmaz, S. (2002). Tokatlı Sâîr Rîzâî Ishâk b. Hasan'ın Bir Mersiyesi. *Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Sayı : 12, s.185-202.
- Latîfî, *Latîfî Tezkiretü's-Şu'arâ ve Tabsîratü'n-Nuzâmâ*. (Amd.Rîdvan Canım) Ankara: T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü.
- Liceyî, M. M. (2012). *Dîwana Hadî* (Amd: Tehsîn İbrahîm Doskî). Stenbol : Nûbihar.
- Mackenzie, D. (2016). *Melayê Cizîrî û Feqî Teyran* (Ji Îngilîzî: Abdullah İncekan), *Nûbihar Akademî*, c:2, h.6 s.3, r.130-133.
- Mawaldî, Z. (2020). *Endülüs Döneminde Şehirler Hakkında Yazılan Mersiyeler*. Konya : T.C. Necmettin Erbakan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslâm Bilimleri Anabilim Dalı Arap Dili Ve Belâgati Bilim Dalı, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.
- Mu'temem, Z. (1333). *Şî'r û Edebê Fairîsî*. Tehran : Kitêbxaneya Îbnî Sîna.
- Naci, M. (1990). *Lugat-i Nacî*. İstanbul: Asr, <https://ia802907.us.archive.org/26/items/lgnaci0001na/lgnaci0001na.pdf> Dîrok: 22.05.2021, Seat:21.57.
- Nalbend, M. E. ( ?). *Baxê Kurda, Dîwana Mela Ehmedê Muxlus Kurê Emînê Nalbendê Bamernî*, Berhevkar: Tehsîn İbrahîm Doskî. Berhemâ Hêj Neçapkirî.,
- Pala, İ. (2014). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapî.
- 226
- Qewmanî, Ş. M. (2011). *Dîwan(amd. Muhammed Seydaoglu)*. Stenbol: Nûbihar.
- Qurana Kerîm û Meala Wê ya Kurdî, Süreya Beqere ayeta 154-155an, Werger*: Fîkrî Amedî, 2014 Enqere: Ensar.
- Redhouse, S. J. (198). *Turkish And English Lexicon*. Beyrûd: Pirtûkxaneya Libnanê, Beyrûd [https://turuz.com/storage/Dictionary/2016/0806-A\\_Turkish\\_And\\_English\\_Lexicon-Shewing\\_In\\_English-The\\_Significations\\_Of\\_The\\_Turkish\\_Terms-James\\_Willia, Jégirtin:22.06.2021.](https://turuz.com/storage/Dictionary/2016/0806-A_Turkish_And_English_Lexicon-Shewing_In_English-The_Significations_Of_The_Turkish_Terms-James_Willia, Jégirtin:22.06.2021.).
- Sadinî, M. X. (2014). *Feqiyê Teyran, Jiyan Berhem û Helbestê Wî*. Stenbol : Nûbihar.
- Sami, Ş. (1978). *Kamus-i Türk*. İstanbul, Türkiye: <https://www.pdfdrive2.com/kamus-i-t%C3%BCrk-d156729280.html> Dîrok: 16.06.2021 Seat: 15.09.
- Selçuk, E.(2013). *Îran Edebiyatında Mersiye Türleri*, Doğu Araştırmaları,s:2, s.5-22
- Sönmez, N. (2018). Mela Ebdullahê Kotaliyê û Helbestê Wî yên Kurmancî. *Nûbihar Akademî*, c.3, h.9, r.97-114.
- Taşkin, H. (2017). Du şîrên li ser Şêx Muhammed Diyauddîn yên Mela Zubeyr û Mela Abid. *Kovara Nûbiharê*, 54-59.
- Temo, S. (2019). *Antolojiya Helbesta Kurdî,c. II*. Stenbol: Agora.
- Tendurekî, M. Z. (2007). *Dîwan (amd. Mela Abdurrahman Biçici)*. Stenbol : Nûbihar.
- Tîrêj, S. (2014). *Dîwan(Xelat-Zozan-Cûdî)*. Stenbol: Peywend.
- Toprak, M. F. (1990). *Endülüs Şiirinde Mersiye, Yayınlanmış Doktora Tezi*, Ankara: Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doğu Dilleri Ve Edebiyatları Arap Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı.
- (2014), “*Mersiye*”, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, c:29, Ankara:TDV.
- Turğut, C. (2019). *Di Edebiyata Kurdî ya Klasik de Mela Muhammed Nûrî û Berhemên Wî*. Wan: Zanîngeha Van Yü-

- züncü Yılê Enstituya Zimanên Zindî Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsana Bilind a Neçapkirî.
- Xelatî, M. E. (?). *Dîwana Bîra Kul û Derda.* ( Li ser kitêba ku hatiye çapkîrin ne navê çapxaneyê ne dîroka çapkîrinê û ne jî bajara ku lê hatiye çapkîrin nehatiye diyarkirin. Şa'ir li ser kitêbê navê xwe Mela Ehmedê Mela Weysî daniye.)
- Xinokî, Ş. M. (2018). *Dîwan.* Stenbol : Banga Heq.
- Yahya, M. (2021.02.12). <http://necmussebah.blogspot.com>. http://necmussebah.blogspot.com: http://necmussebah.blogspot.com/2008/02/ah-cumle-ns-cimna.html adresinden alındı
- Yalar, M. E. (?). *Eywah Li Min Dil Zarî Bû Dünya Di Çehv Min Sarî Bû* . Ev helbest wek destxetê li ba Mamoste Nû-reddîn Ertekîn hat peydakirin.
- Yazıcı, T. (2004). *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, "Fars Edebiyatı- Mersiye"* c:29. Ankara: TDV.
- Yetiz, M. A. (2012). *Dîwan- Banga Yekîti Bo Azadiyê*, Amd:Abdulhakim Gunaydin. Stenbol: Nûbihar.
- Yörür, A. (2018). *Hasan Daniş Bey'in Kerbela Mersiyesi.* Hikmet Edebiyat Dergisi, Prof. Dr. Ali Nihad Tarlan Özel Sayısı, S:4, Aralık, s.680-694.
- Zinar, Z. (1991). *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî.* Stockholm : Yekîtiya Nivîskarêne Kurd.
- Zinarexî, M. E. (2018). *Dîwan*, Taha Nas, Tahirhan Aydin, Abdurrahman Adak, Zülküf Ergün(amd.) Stenbol : Nûbihar.



Çoban, B. (2021). Îdeolojî û Partîzanî di Romanên Kurdî yên Sovyetê da. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 6 (2), 229-244, DOI: 10.35859/jms.2021.892810

#### MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

**Article Type/Makale Türü:**

Research Article / Araştırma Makalesi

**Received / Makale Geliş Tarihi:** 02.01.2021

**Accepted / Makale Kabul Tarihi:** 08.09.2021

**Doi:** 10.35859/jms.2021.872810

## ÎDEOLOJÎ Û PARTÎZANÎ DI ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETÊ DA<sup>1</sup>

Betül ÇOBAN

Arş. Gör. Zanîngeha Mardin Artukluyê,  
Enstitûya Zimanê Zindî,  
Beşa Ziman û Çanda Kurdî,  
cbnbetul@gmail.com,  
ORCID: 0000-0002-2715-9885.

### KURTE

Piştî Şoreşa Cotmehê ya 1917an, li Yekitiya Komarên Sosyalist ên Sovyetê (YKSS) hikûmeta nû dest bi xebatên çandî dike û di 1934 an da Yekemîn Kongreya Yekitiya Nivîskaran dicive. Di vê kongreyê da realîzma sosyalist bi awayekî fermî dibe nêrîna hûnerî ya dewletê. Nivîskarên Sovyetê bivênevê bi rêgeza vê nêrînê berhemên xwe diafirînin. Realîzma sosyalist bi çend rêgezan rû dide û yek ji wan jî îdeolojî û partîzanî ye. Realîstên sosyalist ên ku bi vê rêgezê derdi-kevin qada hunerê berhemên bitez dinivîsin û hunera xwe dikan bin emrê doktrînekê an jî îdeolojîyekê. Tespitên xwe ji aliyê sosyalîzmê ve destnîşan dikan û bi awayekî zelal aliyekî îdealîze dikan û aliyekî jî reş dikan. Yekitiya Sovyetê rê li ber hemû miletan vedike ku ew bi zimanê xwe berheman biafirînin, çand û hunera xwe bi girêdayî şert û mercen Partiya Komunist vejînin. Kurdên Sovyetê jî ji van derfetên Sovyetan sûd werdigirin û dest bi afirandina berheman dikan. Ev gotar di mînaka heft berheman da taybetmendiyêن xeta giştî ya realîzma sosyalist vedikole û rengvedana wê ya îdeolojî û partîzanî ya li ser van berheman dide ber çavan di çarçoveya rêgeza vê teoriyê da. Ev dahûrîn rewşa

<sup>1</sup> Ev xebat ji teza nivîskarê ya bi navê “Şopê Realîzma Sosyalist di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê da (1935- 1991)” hatiye nivîsin. Di 2nd International Academic Conference of the College of Languages/ Kurdish Language Dep. /Nawroz University, 2019 Duhok ê da hatiye pêşkêşkirin.

romana kurdî ya Sovyetê dide ber çavan bê ka ew çiqas bi karîgeriya îdeolojiya Realîzma Sosyalîst hatine nivîsîn.

**Peyvîn Sereke:** Yekitiya Sovyetê, Realîzma Sosyalîst, Romana Kurdî, Éwra Kavkazê, Îdeolojî û Partizanî

### Sovyet Kürt Romanlarında İdeoloji ve Partizanlık

#### Öz

1917 Ekim Devrimi'nden sonra Sovyet Sosyalist Cumhuriyetler Birliği'nde yeni hükümet kültürel çalışmalarına başlar ve 1934'de Sovyet Yazarlar Birliği Kongresi toplanır. Bu kongrede Sosyalist Realizm devletin resmî sanat görüşü olarak kabul edilir. Sovyet yazarları ister istemez bu görüşün ilkelerine göre eserler ortaya koyar. Sosyalist Realizm birkaç ilke ile açıklanabilir ki bunlardan biri de "ideoloji ve partizanlık"tir. Bu ilkelerden yola çıkan sosyalist realistler güdümlü eserler yazarlar ve sanat ürünlerini bir doktrin ya da ideolojinin hizmetine sunarlar. Sanat ve sosyal hayatı dair tespitlerini sosyalizme uygun olarak belirlerler; açık bir şekilde taraf tutarlar, diğer fikirleri reddederler. Sovyetler Birliği her milletin kendi dilinde eserler vermesine ve Komünist Parti'nin ideolojisine uygun bir şekilde kültür ve sanatını yaşatmalarına olanak tanımıştır. Sovyet Kürt yazarları da bu resmî ideolojiden etkileneerek eserler yazmışlardır. Bu çalışma, Sosyalist Realizm hakkında birkaç temel noktayı açıkladıktan sonra, bu akımın gölgesinde yazılan Sovyet Kürtçe (Kurmanci) romanlarında "ideoloji ve partizanlık" ilkelerine odaklanır. Bu çalışmada tarihsel örüntüye uygun olarak Sovyetler Birliği'nde yazılmış yedi Kürt romanı ele alınmıştır. Bu analizler, Sovyet kürt romanının realist-sosyalist akımın etkisinde ortaya çıkışını ve bu eserlerde Sovyetler Birliği dönemi ideolojik etkisine hangi ilkelerle yer verdiği sunacaktır.

230

**Anahtar Sözcükler:** Sovyet Birliği, Sosyalist Realizm, Kürt Romanı, Sovyet Kürt Romanı, İdeoloji ve Partizanlık

### Ideology and Partisansip in Kurdish Novels of Soviet Period

#### Abstract

After the Revolution of October 17, in the Union of Soviet Socialist Republics, the new government began cultural activities and the First Soviet Writers Congress was held in 1934. In this congress, socialist realism was regarded as the official art view of the state. Soviet authors unavoidably produced works within this framework. Socialist realism emerged with a few principles and one of them is "ideology and partisanship". Soviet Kurdish writers were also affected by this ideology. In this study, after giving a few important notes about socialist realism, we will focus on the ideology and partisanship of Soviet Kurdish novels written in this current. For this study, in line with the historical pattern, we will deal with seven Kurdish (Kurmanji) novels written in the Soviet Union. We will analyze how ideology and partisanship are involved in these novels.

**Keywords:** Soviet Union, Socialist Realism, Kurdish Novel, Soviet Kurdish Novel, Ideology and Partisanship.

### EXTENDED SUMMARY

Socialist Realism is a view that is seen as the continuation of realism and highlights its main development with Soviet literature, and it has led to the formation of a homogeneous literature in this country from the 1930s until the dissolution of the Soviet Union. In 1934, the Congress of the Union of Soviet Writers convenes. In this congress, Socialist realism is accepted as the official art view of the state. Socialist realists, who set off from these principles, write guided works and present their works of art to the service of a doctrine or ideology. They determine their determinations about art and social life in accordance with socialism; they openly take sides, rejecting other ideas. Socialist realism, like other literary theories, has a different feature as well as being influenced by philosophical movements. The theorists of this theory are mostly politicians, and the most important pillar on which this driven literature rests is the Bolshevik regime and the Communist Party. Socialist realists interpret events as the result of political ends; they see the novel as a tool for the development of ideologies and society. Writers who act in accordance with this theory defend Marxism and a permanent revolution and propose to look at art with Soviet ideology. For this reason, they behave more like a politician than a novelist.

The Soviet Union allowed every nation to produce works in their own language and to keep their culture and arts alive in accordance with the ideology of the Communist Party. The Kurds, who fled from the Ottomans and took refuge in the Soviets after political turmoil and migrations and started to establish a new life here, will also be affected by this new world order. This will be a unique opportunity for the Kurds, who have not had the opportunity to create a literature in their mother tongue before. Therefore, Soviet Kurdish writers will also be affected by the current official ideology in this atmosphere after the Bolshevik revolution and will start to produce Kurdish (Kurmanji) works in their own language by taking advantage of these opportunities.

231

This study will focus on the Soviet Kurdish novel, which is characterized as the Caucasus school, consisting of mostly Yazidi Kurds living in the Soviet Union. The aim of this study is to examine the seven novels of seven Kurdish novelists written in the Kurmanji dialect of Kurdish in the Soviet Union between 1935-1991 in line with the ideology and partisanship principle of the socialist realist theory and to determine their common points. The way in which ideology and partisanship take place in these works will be shown. In determining these common points, seven novels written in the specified range will be examined, common aspects will be shown in terms of content and their effects will be determined in line with ideology and partisanship. It will be seen that Kurdish writers also benefited from the opportunities offered by the Soviet regime and wrote most of their works within the framework of this theory. This study will be important and decisive in terms of revealing that the Caucasian Kurdish novel was formed with the ideological and political atmosphere of its own period.

Caucasian Kurdish literature can be evaluated in three periods. The first one is the “Beginning Period” and many conferences and meetings were held in this period covering the years 1920-1937 in terms of awareness raising activities. Kurdish alphabet studies were carried out and the first literary examples were given with this alphabet; newspaper studies were made. During this period, the first Kurdish Kurmanci novel, *Şivanê Kurmanca*, was written by Erebe Şemo in 1935. The second period

is the “Pause Period” and covers the years 1937-1955. The main reason for this naming is that many writers were displaced due to Stalin’s immigration and exile policy and not much work was produced in this period. A few theatre plays and scripts are prominent works of this period. The third period is the “Mastery Period” between the years 1955-1991. Writers returning from exile begin to write with great zeal to avoid the eighteen-year pause. The heavy conditions of the Stalin period eased and a relatively comfortable summer environment was created. The seven works that will be examined in this study are the products of this period.

Of course, the works to be examined are not limited to these, but seven novelists and seven works will be sufficient as a sample group for a study in this context. Data analysis in qualitative studies is a challenging method for researchers. The scarcity or absence of standard methods can be seen as a problem in social studies, and many researchers analyse such studies based on their own scientific background. This study takes care not to stay away from scientific methods as much as possible. For this reason, of course, novels were chosen as the primary source. In the analysis, the data were compiled by scanning method and the works were examined with Marxist criticism.

According to Marxist criticism, literary works are responsible for reflecting the ideology of the period in which they were written. The works examined in this study have also reached this conclusion. Each writer praises the Soviet regime in accordance with the ideology of the period and highlights the good and beautiful aspects of the regime. Feudalism and the bourgeoisie are harshly criticized, the revolution and the Communist Party are idealized. Lenin and Stalin are seen as great liberators and are always praised. All the bad characters are the sultan, agha, bey, emir and feudal, who are the representatives of the ruling class. They oppress people, exploit labour, and are far from human values. Novel heroes are created in a uniform way far from being a character. They fight against the ruling class, feudalism and the bourgeoisie; they fight with the sultan, the agahs and the beys. They do not have human weaknesses; they approach everything ideologically. They give courage to the people in desperate and bad times, they do not give up on their great goals and ideals, no matter how much they suffer. They always educate themselves, serve the people; they become a good example and saviour for the people. All these show that the Soviet Kurdish novel, like its contemporaries, exhibits an ideological and partisan attitude in this respect.

### Destpêk

Li Rusyayê bi serketina Şoreşa Cotmehê û bi damezirandina sosyalîzmê ra realîzmeke nû ya civakî/sosyalîst derdikeve holê û ev yek jî di navbera civak û mirovan da têkiliyên nû û sincekî (etîk)yê civakî bi xwe ra tîne. Di huner û edebiyatê da armanceke civakî û berpirsiyariyek ava dibe. Bi vê berpirsiyariyê pêdiviyê gel bi rîyeke edebî dibe mijara hunerê. Realîzma Sosyalîst, şaxeke ji realîzmê ye û geşedana xwe bi edebiyata Sovyetê pêş ve biriye. Di 1934an da Yekemîn Kongreya Nivîskarêni Sovyetê dicive û bîryarek tê girtin ku Realîzma Sosyalîst ji wê dîrokê pê ve dibe nîrina hunerî ya fermî ji bo Yekitiya Sovyetê.<sup>2</sup> Bîryarêni berbiçav ên ku di vê kongreyê da hatine girtin esasen rîgezêni xwe, çavkaniyêni xwe ji nameya Stalîn werdigirin ku ev name 2yê Berfanbara 1930an da ji bo Demjan

<sup>2</sup> Ji bo agahiyêni berfireh ên derheqa realîzma sosyalîst da hûn dikarin binêrin: (Oktay, 2008) û (Kurtulmuş, 1996).

Bedny hatiye nivîsîn. Li wir Stalîmî nivîskar wek “endezyarênu ruhênu mirovan” şayesandiye (Tunali, 1993:149-150) û ev yek jî di kongreyê da ji bo teoriya Realîzma Sosyalîst bûye rîgezeke bingehîn. Li gor vê teoriyê divê nivîskara/ê sosyalîst hişê civakê ava bike, civakê bi îdeolojiyê bixemilîne û li hember kapîtalîzm û dagirkeryê serî hilde û xelkê bi rî bixe.

Realîzma Sosyalîst bingeha xwe ji nîrîna materyalîst werdigire û bi felsefe û îdeolojiya Marksîst şekil dide esasên xwe. Avakarênu estetîka marksîst Karl Marks û Engels mijarênu li gor texayyûlîn berhemênu edebî bi diyarneyê realîzmê sînor kirine. Lewra ye teorîsyenê Marksîst ên li pey wan rastîbînî kirine krîtera sereke ji bo nîrxênu edebî. Vê teoriyê di serî da huner wek amrazake ragihandina îdeolojiyê dîtiye ji bo xelkê. Ev yek jî gelek caran encamên wisa dane ku hunermend tu fikarênu estetîk nekirine mebest ji xwe ra û rastiyêni mîsoger bûne armancênu sereke ji bo realîstîn sosyalîst. Ev tevger jî wisa rî li ber nivîskaran vekiriye ku berhemênu xwe bi vî şîklî bînin.

Edebiyata Sovyetê û teoriya wê ya Realîzma Sosyalîst bi vî awayî peyda dibe û armancê û naveroka wê rasterast ji aliyê kesayetên siyasi ve tê diyarkirin. Nivîskar berhemênu xwe wekî berpirsiyariyekê dinivîsin. Ev helwest jî encamekê bi xwe ra tîne ku naveroka wan dişibin hev. Rêzebûyerên berheman her çiqas ji hev cuda bin jî hîmîn tematîk, dem û mekanênu bûyeran û lehengênu wan rengê hev didin. Lehengênu wan bi giştî endamên çîna karker in, keda wan tê xwarin ; kemasiyênu civakê derdixin holê, aşkere dîkin ; temsiliyeta kesen li hember kedxwarî û emperyalîzmê dîkin. Divê di şerê li hember kedxwaran da bi ser bikevin û serfiraz bibin.

Edebiyata kurdî ya Sovyetê jî piştî gelek buyerên qewimî<sup>3</sup> wek perçeyeke biçük a edebiyata Sovyetê di çarçoveya nîrîna siyasi ya rayedarênu Sovyetê de tê afirandin û taybetmendiyênu realîzma sosyalîst di nav xwe de vedihewîne. Ji xwe piştî kongreya 1934an berhemanîneke din jî ne mimkûn bû, mefera nivîskaran nebû. Edebiyata kurdî ya Sovyetê jî ligel van geşedanan cara yekem derfeteke fireh dibîne û derdikeve qada cîhana edebiyatê. Nivîskarênu kurd bi şert û mercen demê girêdayî Partiyê (Partiya Komûnist) bi karîgeriya realîzma sosyalîst berhemênu xwe dinivîsin<sup>4</sup> û bingeha romana kurdî diavêjin.

Di vê gotarê da ji bo diyarkirina xeta giştî ya karîgeriya realîzma sosyalîst li ser romana kurdî ya Sovyetê ji heft nivîskarênu cuda heft roman hatine hilbijartîn. Ev roman berhemênu qonaxa dawî ya vê edebiyatê ne. Romana Erebê Şemo Jiyana Bextewar 1959an da, romana Hewarîyê ya Hecîyê Cindî di 1967an da, romana Eliyê Evdilrehman Gundê Mêrxasan di 1968an da, romana Kurdê Rêwî ya Sehîdê Îbo di 1979an da, romana Dê û Dêmarî ya Egîdê Xudo di 1986an da, romana Bawerîyê ya Ahmedê Hepo 1990anda, romana Fîncana Ferfûriyê ya Ezîzê Gerdenzerî 1990an da hatiye weşandin. Bêguman ji xeynî van berheman jî gelek berhemênu edebî hene ku mirov dikare di çarçoveya Realîzma Sosyalîst da binirxîne. Heta li gorî teza Çoban (Çoban, 2017:155) berhemênu di dewra Sovyetê da hatine nivîsîn bi giştî realîst-sosyalîst in. Ev roman ji bo destnîşankirina îdeolojî û partîzaniya edebiyata Kurdî ya Sovyetê hatine hilbijartîn û nivîskarênu navborî jî di vî warî de kesayetên naskirî yênu vê edebiyatê ne. Li ser bingeha Realîzma Sosyalîst ev berhem dê bêna analîzkirin. Gava ku behsa karîgeriya Realîzma Sosyalîst tê kirin ev nayê wê wateyê ku bi her layenê ve dê bê lêkolînkirin. Lewra teoriya Realîzma

<sup>3</sup> Hatina kurdan a Sovyetê bi girêdayî siyaseta Osmanîyan ve girêdayî ye û şerê di navbera Osmanî û Rûsan da dibe sedema koça kurdan ber bi Sovyetê ve. Ji bo agahîyen berfireh hun dikarin lê binêrin (Çoban, 2017).

<sup>4</sup> Wekî ku berê jî hatibû destnîşankirin, piştî kongreya 1934an Realîzma Sosyalîst dibe nîrîna fermî ya dewletê û nivîskarênu kurd ên Sovyetê jî divê li gor vê biryarê tevbigerin, berhemênu xwe li gorî wê biryarê biafirînîn.

Sosyalîst bi gelek rêgezan deng vedide.<sup>5</sup> Lê ev gotar balê dikêşe li ser rêgeza îdeolojî û partîzaniyê û dîsa dahûrînên xwe yên derheqê van berheman da raberî xwendevanan dike.

### **1. Îdeolojî û Partîzanî**

Di Realîzma Sosyalîst da armanca sereke nîşandayîna rastiyê ye. Divê teorisyenên vê nêrînê rasîtyen partîyê bi awayekî xurt raberî xelkê bikin. Nivîskar jî bi vî şiklî rastiyênu ku berhemên xwe da tesbit dikan bi awayekî sosyolojîk şîrove dikan û bi îdeolojiya hunera xwe diafirînin. Gelek ji wan berriya hunerê da fikara pêkanîna dozekê dikan û ji xeynî nivîsandina romanekê baş armancê din datînin ber xwe. Pirsgirêkên welatê xwe û derdêne gundiyan bi awayekî terefdar carinan bi hezkirinê carinan bi zezebê tînin zimanî ; carinan tenê bi nêrinekê û carinan jî bi awayekî berfireh li ser disekinin.

Realîstên sosyalîst bûyeran wek encama armancêni siyasî şîrove dikan û romanê wek amrazekê dibînin ji bo îdeolojiya xwe û ji bo pêşvebirina civakê. Li gor kesinan hemû mesele xirabî, dizitî, ne-heqî û bêrâtî ye û divê meriv balê bikişîne ser. Hin kes di pergala civakê da ji aliyê Marksîzmê ve hin guhertinên mayînde, heta şoreşê dixwazin. Ji romannivîsekî zêdetir wek rojnamevanekî alîgir û wek siyasetvanan tevdigerin.

Realîzma Sosyalîst sîstema mulkiyeta şexsî û paşxana wê ya siyasî û hişmendî rexne dike û li aliyekî jî çi li hember civaka sosyalîst be ji binî ve red dike. Ev teorî sîstema kapîtalîzmê û jiyana ku bi vê hişmendiyê ava bûye rexne dike ku bi vê erkê dibe partîzan (Akçay, 1998 :19-20).

**234**

Berhemên ku bi vî rengî hatine nivîsin, herçiqas ji aliyê cûre û esasên xwe ve heta radeyekê ji hev cuda bin, dîsa jî di bin banê îdeolojiyeke hevpar da dicivin. Ev yan pesna komûnîzmê didin yan jî diavêjin canê dijberên komûnîzmê yanê wan rexne dikan. Lewra berhemên edebiyata Sovyetê pincara eyñî çiyayî ne (Siniavski, 1967 : 29- 30).

Realîzma Sosyalîst ne tenê xwedî qaîdeyêni diyarkirî lê belê xwedî nêrîn û bergehêni diyarkirî ne. Ev teorî pêşniyaz dike ku li dinyayê û li hemû mirovan bi îdeolojiya Sovyetê bê temaşekirin. Armanca wê ew e ku hunerê bike amraza partîyê.

### **2. Raçavkirineke Kurt li Ser Tradîsyona Romana Kurdî ya Sovyetê (1935- 1991)**

Edebiyata kurdî û bi taybetî jî romana kurdî, berhemanîna xwe ya mezin û bibandor li diyasporayê<sup>6</sup> derdixe holê. Êdî diyaspora ji bo romana kurdî dibe welatê eslî (Ahmedzade, 2004: 195). Kurden ku ji welatê xwe sirgün bûne û çûne diyasporayê, nostaljiyêni xwe û wezîfeyêni xwe yên neteweyî bi nivîsandinê xwestine telafi bikin. Bi vî awayî xwestine ku çanda xwe biparêzin û ji bo dahatûya gelê

5 Li gorî Çoban rêgezen teoriya Realîzma Sosyalîst bi giştî ev in:

- “1. Îdeolojî u Partîzanî
- 2. Ked û Kedxwarin [istismar]
- 3. Lehengên Erênen
- 4. Romantizma Şoreşger
- 5. Folklor
- 6. Dîn
- 7. Dirokîfî
- 8. Gelparezi
- 9. Mijaren Aboriye, Sistema Kolxozi Sovxoza” (Betül Çoban, 2017: 10 - 22).
- 6 Derheqê diyasporayê da ji bo agahiyêni berfireh hun dikarin li pirtûka “Diyaspora Mekanları” ya Minoo Alinia binêrin. Peyva diyaspojê bêtir Ewropa tîne bîra me lê em qebûl bikin nekin diyasporaya herî mezin ya kurdan li Kavkazyayê ye. (Alinia, 2007)

xwe bixebitin. Ev yek kurdên Sovyetê da bi rehetî tê kifşkirin. Diyasporaya Sovyetê (ku êdî bûye wekî welatekî) ji bo kurdan bi taybetî jî ji bo kurdên Kurmanc dibe qada ronesanekê.<sup>7</sup> Bi awayekî şenber qedera kurdên Sovyetê diguhere. Piştî Şoreşa Cotmehê serkeftinên çandî û edebî xwe nîşan dide.

Jiyana edebî û çandî ya kurdên Sovyetê, nêzîkî heftê salî ye. Ev çand û edebiyat dikare bi sê êwran bê vekolîn.<sup>8</sup> Her çiqas ji bo edebiyata kurdî ya giştî parvekirinek mimkûn nebe û wêneyeke hevgirtî nikaribe bê çekirin jî, ji bo edebiyata Sovyetê ev yek mimkûn e. Ev parvekirina li êwran hem ji bo lêkolînan rêgezan dide ber destê lêkoleran û hem jî nîşaneyâ pêşveçûyîna çand û edebiyatekê dide ber çavan.<sup>9</sup>

Êwra yekem (1920- 1937) di salên 1920î da bi xebatên perwerde û alfabeyan dest pê dike û nivîsar û rewşenbîrên wê dewrê hewl didin ku bingehêkê çêkin ji bo zimanê edebiyateke nivîskî. Di salên 1930î da bi rêya edebiyata rûs û ermeniyan gelek wergerên bi kurdî tên amadekirin. Bi ceribandinê her cure berheman, edebiyata kurdî ya li Sovyetê bi “destpêk”ekê xwe nîşan dide. Di 1935an da yekem romana kurdî ya Erebê Şemo ya bi navê Şivanê Kurmanca tê çapkiran.

Êwra duym (1937-1955), bi desthilatdariya Stalîn û qedexeyên vê demê tê pênasekirin. Êwra duym jî dikare weke êwra “rawestin”ê bê binavkirin. Lewra di vê serdemê da pêşveçûna ziman û çanda kurdî tê sekinandin. Di dibistanan da perwerdeya bi kurdî tê qedexekirin û hemû dibistanên kurdan û akademiya perwerdehiyê tê girtin. Gelek rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên kurd ji kar tê avêtin, tê girtin û sirgûnkirin. Erebê Şemo sirgûnî Sibiryayê dikan; Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncô, Ahmedê Mîrazî, Cangîr Axa û Şamil Têmûr desteser dikan û dixin girtîgehê. Ji ber vê ye ku di navbera van salan da li ser edebiyat û romanê zêde berhem nayêñ dîtin digel ku du berhevokên giştî ya nivîskarên kurd û berhevoka çîrokên Heciyê Cindî a bi navê Siva Teze (1947) hatibin weşandin jî.

Ligel van qedexekirinan şaxeke din piçek ronayî dide vê serdemê. Di 1937an de li gundê Elegezê Şanoya Dewletê ya Elegezê tê vekirin. Lîstikvanêñ ewil ji nav keç û xorôtê wê herêmê tê bijartin. Kar û barêñ şanoyê ji aliyê dewletê ve tê finansekirin û şanogerên ermenî ciwanêñ kurd perwerde dikan. Nivîskar û şanonivîsên ermenî li ser hîmîn zargotin û jiyana kurdan gelek şanoyan dinivîsin. Mem û Zîn a S.Taronsî; Ker û Kulik, Siyabend û Xecê, Keça Mîrikê û Gur Heso yêñ S. Gensoyanî hin ji van in. Wekî din berhemên Rûs, Ermenî Gurcî û Azeriyan derdixin li ser dîkê. Herwiha berhema Celatê Koto Lur de Lur, berhema Heciyê Cindî Miraz û berhema Cerdoyê Gêncô Cuşka Doxdiryê û Bira jî li van şanoyan têñ lîstin. Ev şano di 1947an de tê girtin lê dîsa jî di demeke kin de nêzikî 30 pîyesan ve çandeke mezin ava dike û kadroyêñ baş perwerde dike ji bo dahatûyê.

Di êwra sêyem (1955-1991) da, edebiyata kurdî ya li Sovyetê, bi hewldanêñ mezin û piştrast careke din radibe li ser piyan û li hember rawestina hijdeh salan bi awayekî tecrûbedar/xweytecruibe disechine. Lewra hêjayî gotinê ye ku wekî êwra “hostetî”yê bê binavkirin. Di vê serdemê de êdî politîkayêñ ser-

7 Her çiqas peyva dîasporayê di bingeha xwe da fîkrêñ neyîn bîne bîra me jî, hin lêkoler û nivîskar hemberî vî qasî ne. Dîasporayê wekî qadekê dibînin: qada hişmendiyê. Yek ji wan jî Khaled Khayatî ye. Li gorî Werbner jî dîaspora qada hişmendiyê ye, piraniya wargehan jî bi vê re eleqeder e. Homî K. Bhabha dibêje ku “dîaspora, ji bo estetiqa post-kolonyalê çavkaniyek e.” Ji bo agahiyêñ berfîreh hûn dikarin binêrin: (Khaled Khayatî, 2009)

8 Di mijara parvekirina li êwran ji Eskerê Boyik, Tosinê Reşid û Têmûrê Xelîl sûd hatiye wergirtin. Bnr. (Boyik, 2012: r. 25-26; Reşid, 2012:202-212, dnd. (brh.) Erbay, 2012, r. 202-212) û (Xelîl, 2014: r. 12-23.)

9 Parvekirina edebiyata kurdî ji bo hin lêkoleran hêja jî ne mimkûn e. Ferhat Shakely bi xwe jî, ku bi iddiayekê derdikeve dibêje ku wî hemû herêmê kurdan ber çav giştîye û ji bo edebiyata kurdî berhevkirineke giştî kirîye, vê yekê tam nekariye pêk bîne. Lewra edebiyata Sovyetan derveyî xebata xwe hiştîye û iddia kirîye ku romana kurdî di salên 1960î da derketiye holê. Lê ji bîr kirîye ku romana yekem di salên 1930î da li Sovyetê hatiye nivîsin û çap bûye. (Shakely, 1998).

dama Stalin û tundiya li ser kurdî radibe, rewşenbîr û nivîskarênu sirgûniyê da ne vedigerin welatê xwe. Di vê serdema sêyem da, di warê pexşanê da pêşketînen mezin çêdibin. Di destpêkê da ji xeynî Şivanê Kurmanca(1935) ya Erebê Şemo nimûneyên romanê peyda nabe û herwiha yê çirokê jî. Lê ev rewş di vê serdemê da diguhere. Li gel Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal û Ahmedê Mîrazî; navêne wek Eliyê Evdilrehman, Sehîdê Îbo, Egîdê Xudo, Ahmedê Hepo, Nadoyê Xudo Maxmûdov, Emerikê Serdar, Sîma Semend, Wezîrê Eşo, Prîskê Mihoyî, Xelîl Mûradov (Xelîlê Çaçan), Miroyê Esed, Tosinê Reşîd, Çerkezê Reş, Casimê Celîl, Ahmedê Gogê, Elîxanê Memê, Hamoyê Rizgo, Babayê Keleş û Vanîkê Elîxan bejn û bala xwe di warê pexşanê da nîşan didin.

### **3. Rengvedanên Rêgeza Îdeolojî û Partizaniyê**

#### **3.1. Jiyana Bextewar (Rewan, 1959)**

Erebê Şemo wekî nivîskarekî kurd “bi şoret tê naskirin û nav û dengê wî çawa li welatê Sovyetê wisan jî li nava rewşenbîren kurd ên wê demê da belav dibe” û wekî “bavê romana kurdî” tê pejirandin (Boyîk, 2007). Ligel neheqiyêne hatine serê wî dîsa jî bi awayekî partîzanî romana xwe dinivîse û wekî tê dîtin dev ji îdeolojiya xwe bernade. Her du romanên Erebê Şemo Şivanê Kurmanca (1935) û Berbang(1935) wekî otografiya wî hatine nivîsin. Heta tê dîtin ku Berbang bi awayekî zelal versiyoneke berfirehkirî ya Şivanê Kurmanca ye. Christine Allison jî ji bo Berbangê dibêje ku “...ne pirtûkeke cuda, lê venivîseke Şivanê Kurmanca ye” (Allison, 2014:145). Lehengê pirtûkê (yanê Ereb) ji bo Partyî<sup>10</sup> bi dil û can dixebite.

Romana Jiyana Bextewar (Şemo, 2015) piştî sirgûniya Erebê Şemo çap dibe. Rasterast nayê gotin ka ev roman jî wekî her du romanên berê otobiyografiya Erebê Şemo ye lê dîsa jî li hin deran bi awayekî teknîkî dikeve hin nakokiyânu xwe dide dest ku Misto -yek ji lehengêne romanê- Erebê Şemo bi xwe ye: “Xortekî ji kurdan, navê wî Misto bû. Wî pak bi zimanê Úris û Ermeniyan zanîbû û bûbû uzvê Partiya Bolşevîkan û çi qirarîen partîyê hebû bi destê wî Mistoyî teşkîlata Bolşevîkan bi dizîka ve derbas dikir li nava Kurdan, Ermenîyan û paleyêd mayîn...” (r. 102). Misto lehengê sereke yê her du romanên wî yê berê (Şivanê Kurmanca û Berbang) ye û her wiha yê Jiyana Bextewar jî. Bi gelek nimûneyan tê dîtin ku serboriyêne Ereb û Misto li hev tê: “Lê Misto kaxêz giş kuta kiribûn, ew êdî ber bi jor de hildikişîya ber bi çadirê xwe ve diçû. Bi vî teherî Partiya Bolşevîkan idêya Marks û Lenîn li nav esker û xebatçîyan belav dikir” (r. 112). Misto jî wekî Ereb di nav leşkerên Qazax da navbeynkariyê dike, ji ber ku çend zimanân dizane. Bi Bolşevîkan ra kar dike û ‘kaxez’êne partiyê di nava gundiyan, rênçberan û karkeran da belav dike. Di mîtinga yekê Gulanê da li ser xebatêne partiyê diaxive û pesna Bolşevîkan dide û ji ber wê jî tê girtin.

<sup>10</sup> Divê bê gotin ku hin termînolojiya kurdêne Sovyetê di vê xebatê da hatiye bikaranîn. Wekî mînak di tevahiya romanen da navê Partiya Komûnist ya Yekitiya Sovyetan bi navê xwe yê resen nehatiye bikaranîn, di dewsa wê da “Partî” tê gotin ku di gotarê da bi heman kontekstê da ev peyv gelek caran hatiye bikaranîn. Wekî din Hikûmeta Sovyetê jî gelek caran bi navê “Dîwan” an jî “Dîwana Sovyetê” hatiye bikaranîn ku heman aqubet ji bo vê peyvê jî derbasdar e.

Nivîskar di beşa “Şerê Împeryalîstîyê, Sala 1914an” da behsa şerî dike û heta sala 1917an tê. Şerê Cîhanê yê Yekem bi vî rengî dibe paşxaneyekê ji bo vê romanê. Li vir dîsa lehengê romanê Misto bi Partiya Bolşevîkan ra dixebite û tevî wan propagandaya komûnîzmê dike, xebatan dibe nava karkeran û leşkeran. Li hember burjuvaziyê xebatên wisa bi dil û can dike ku hevalên wî yên partiyê timî pesnê Misto didin. Propagandaya Lenîn û bolşevîkan di vê romanê da dibe mijara sereke ji bo nivîskarê sosyalîst. Romanê ji bo îdeolojiya xwe dike amrazekê û ji bo vê yekê jî lehengên xwe bi kar tîne û bi rêya wan fîkr û ramanên xwe empoze dike. Mîxaylovê komûnîst gelek caran bi hevalên xwe yên partiyê ra diaxive û dibêje ku:

Gerekê em wisa bikin, wekî eskerên me berê tivingên xwe biguhêzin ber bi dîwana padşê ve, ber bi bûrjûvazîyê ve bikin, çimku ev şer wan dest pê kir ji bo kara xwe. Pale û gundî xwîna xwe dirêjin, lê burjûvazî, milkedar cêba xwe tijî dikin (r.104).

Yekê Gulanê ji bo karker û gundiyan rojeke girîng e û di vê berhemê da jî behsa wê hatiye kirin. Teşkilata Partiya Paleyên Sosyaldemoqratiyê a Ûrisêtê (a Bolşevîkan) xebateke gumreh ji bo vê rojê dike. Lozung dînîsin, parçeyên sor amade dikin. Wê çaxê cara ewil e ku ewqas miletên Kavkazê di bin destê Partiya Bolşevîkan da dixebeitin, wekî birayan karê Eyda Yekê Gulanê dikin û kes li yekê din re bi çavekî nijadperest nanêre (r.110). Misto jî di vê mîtinga mezin da radibe ser dîkê diaxive, li gorî lozungan ci tê bîra wî behs dike û pesna şoreşê dide. Ji ber vê axaftinê jî ji aliyê diwanê ve tê girtin. Bi rêya bîranînen Misto yên li girtîgehê tê zanîn ku wî pirtûka Lenîn a “Pêşdeçûyîna Kapîtalîzmê li Ûrisêtê” xwendîye û bûye bolşevîk. Baweriya kurdan bi Lenînî heye û wisa bawer dikin ku ew rizgarkerê wan e. “Erê weleh xwedîyê me kesîban Lenîn e, Partîya Bolşevîkan e, em gerekê iro gişk li Dîgorê bibêjin, dixwazin dîwana pale û gundîya” (r.126). Misto (êdî tê zanîn ku ew Ereb Şemo bi xwe ye) hevalên xwe hînî gotinên Lenîn û Partiya Bolşevîkan kiriye. Li vir tiştekî balkêş ew e ku nivîskarê romanê gelek caran tîne zimanî ku Misto bolşevîk e, şoreşgerê partiyê ye û her ji bo Dîwana Sovyetê û ji bo kurdan dixebite. Ev fikar hertim di nava romanê da derdikeye pêş. Ji ber ku Erebê Şemo piştî sirgûniya xwe her dixwaze ku bîne zimanî ku ew komûnîst e û sosyalîst e (Şemo, 2007: 7).

Li gundêñ kurdan bi serkariya Partiya Bolşevîkan û dewleta Sovyetê êdî jiyanekî nû ava dibe. Xebatêñ di nava kurdan da ‘rind, bi dil û can û komunîstî’ derbas dibe lê kesêñ ku dixebeitin nexwendîne, nikarin gotinên Lenîn û Partiya Bolşevîkan bi zanebûna Marksîzmê- Lenînîzmê bibin nava kurdan. Pêwîstiya kurdan bi kadroyen xwenda hene lê hîn jî ew kadro amade nînin. Di 1927an da Misto diçe Moskovayê li cem ‘hevalê Stalîn’ û behsa rewşa gundêñ kurdan dike (r.221). Komîteya Merkezi ya Partiya Bolşevîkan vî karî dispêre Mixayîl İvanoviç Kalînîn û li Yêrêvanê ji bo kurdan teknîkûma pedagojiyê û li Lenîngradê Fakulteta Karkeran (paşê ev fakulte dibe Înstîtûta Miletêd Biçûk a Sovyetîyê) tên vekirin. Misto jî li wir dibe dersdar û ciwanêñ kurdan dişîne wan enstîtûyan ku perwerde bibînin, vegerin karê miletê xwe bikin û ji bo Partiyê bixebeitin. Sehîd jî di vê enstîtûyê da dest bi xwendinê dike. Ew wisa baş dixwîne û hîn dibe ku “ji bo Katibê Cabdarî ê Teşkilata Komsomolan li Înstîtûte tê bijartin û dibe úzvê buroya komîteya partiyê” (r. 222). Di havîna sala 1932an da Sehîd bi awayekî serkeftî xwendina xwe diqedîne û rojê da bilêta xwe distîne û vedigere gundê xwe. Di rê da yekî xerîb ji wî dipirse ka ew ji kîjan miletî ye. Gava ku Sehîd bersiva wî dide û dibêje ku ew kurd e, ew mîrik ji wî bawer nake. Ew ecêb dimîne ku berê yekî kurd bi cil û bergêñ rind, bi axaftineke xweşik û xwenda

nedîtiye. Nivîskar bi vî awayî nîşanî xwendevanan dide ku êdî kurd jî bi xwendina xwe, bi xebatêñ xwe û bi tevgerên xwe di nava civata Sovyetê da cih digirin. Bi lehengê xwe yê Sehîd jî vê yekê tîne zimanî: “Erê gelekan bawer nedikirin, wekî Kurd jî bêne Lenîngradê, lê bi saya Partiya Komûnist û dewleta Sovyetê niha kurd jî têne vî bajarê mezin” (r. 225) û dixwînin.

### **3.2. Kurdê Rêwî (Rewan, 1979)**

Kurdê Rêwî (Îbo, 2009) di 1959an da tê nivîsin û di 1979an de li Yêrêvanê tê çapkirin. Nivîskar Sehidê Îbo armanca xwe ya nivîsinê di beşa “Sivte”yê de diyar dike:

Merivekî wexta tasa ava sar ji kanîkê vexwar gotî wê tucar bîr neke. Ew kanî bona me Oktyabra azadar e. Ewê li ber me dergê emrekî teze vekirin. Ewê da destê min qelema hana, ji wê jî ev nêtana dirijine ser kaxezê ( r.16).

Ev yek bi tena serê xwe dikare mîsyona nivîskarî aşkere bike lê minetdariya wî li vir xilas nabe. Ew bi awayekî kronolojîk behsa çûyina êla xwe ya Ûrisêtê dike û dide zanîn ku ev ciyê şanaziyê ye:

Şûrê Romêyî neheq gundiyê me’rûm li serê riya xistin. Sala 1920, wexta Ûrisêtê da beyreqa dimilmilî, tevî ermeniyê gundê cînar Ortila jî ji qetla Romê azabûn pê danîne ser şemîka emrekî teze. Roja îro jî, şikir ji erdê heta ezmîn, têr û tijî derbaz dikan (r.15).

Rizgarkeriya Şoreşa Bolşevîk di rûdanêñ piştî Şoreşê da bêtir di çarçoveya hîzrî û çandî da derdi-keve pêş ku mirovan ji têgîhîstin û çandeke paşketî rizgar dike(Ergün, 2018a). Ev berhem jî rizgarkeriya şoreşê bi pesna Lenînmî û partiyê bi awayekî aşkere vedibêje. Tekane rêya xilasbûnê di îdeolojî û fikra sosyalîzmê da dibîne. Lenîn ji bo van lehengan û ji bo kesîb û hejaran ‘rizgarker’ e; dîwana ku ew dê bîne ji bo çîna bindest hêviyeke mezin e. Baweriya wan a bi Lenînî gelek caran bi dubareyan tê nîşandan: “Ez ji giliyê Lênîn zef bawer dikim, teva Rêvolyûsiya Sosyalîstiyê jî wê wira şemal bide. Ew şemalê te’riya qurna betreng bike” (r. 92). Bi vê baweriyyê bi dil û can xebatêñ xwe dikan û xwedî li doza xwe derdikevin. Xaleke din ya balkêş jî ew e ku partîzanî û îdeolojiya karakteran dikeve pêşıya jiyana wan a şexsî û taybet. Gava ku karekî partiyê hebe yan jî xebatek ji bo şoreşê hebe dev ji hemû jiyana xwe berdidin û hewl didin ku wî karî temam bikin: “Niha dewraneke teze destpê dibe, em nikarin û ïzna me jî tune, ku mîna berê derbaz bikin” (r. 37).

Nivîskar gelek caran wêneyêñ xirab ên sîstema zordariyê bi peyv û şibandinêñ nebaş radixin ber çavan û paşê jî wekî xilaskerekê behsa pêvajoya Şoreşa Bolşevîk dikan. Ev her du dîmen wekî reş û spî dijî hev in. Di realîzma sosyalîst da her bûyer û leheng bi vî şeklî reş û spî têñ şayesandin. Lehengên girêdayî çîna serdest ji kîjan miletê bibin jî bi gotinêñ nexwêş têñ nasandin. Li hember vê jî kesenî ji çîna bindest her çiqas gundî bin yan jî belengaz, kesîb bin dîsa jî bi awayekî xweşik û erêni têñ şayesandin. Derûniya wan tune û ew ji bo armancêñ nivîskarî di nav kontekstekê de têñ bikaranîn. Lewra her bûyer û lehengek ji bo ravekirina îdeolojî û fikran hene. Di vê romanê de jî gundiyêñ hêjar bi nasîna partî û felsefeya wê dibin xwedîbawerî, wêrek dibin û li hemberî çîna serdest serî radikin. Zabitê karmendê dewletê di bin bandora fîkr û pratîkên komînîstan da dimîne û ji bo reva girtîgehê alîkariya lehengekî din dike. Ev jî aliyekî din ê partîzaniyê ye. Di vê romanê da lehengekî cuda heyê ku şayesandina wî balê dikêse. Zurbe hem dewlemend hem jî kesekî qenc e û baş hatiye şayesandin.

Ev başbûna wî jî ji rabirdûya wî ya rênçberbûnê tê:

Zurbe bi eslê xwe va merivekî rênçber bû... Lê bextê Zurbe hinekî bi teherekî dinê lêxistibû. Ewî kîrîn-firotana beg kiribû, xwe ra êpêce mal qazanc kiribû. Derê mala wî ber her kesîbekî vekirî bû. Sifra wî timê raxistî bû, ewî tasê ava sarjî bêy cînara venedixar (r. 31).

Nivîskar meyla xwe bi vî rênçberiyê ve girê dide. Lewra dê bê dîtin ku Zurbe dê tevî şoresgeran bibe û bixebite. Heta Hemîd Beg û giregirêne dewlemend ji vê yekê zehf aciz dibin û difikirin ka bi çi awayî Zurbê ji gundiyan biqetînin. Ji bo vê jî Meyana keça Zurbe ji kurê Keleşê rûspî ra dixwazin. Bi vî awayî dixwazin ku têkiliya wî ya kesîban qut bikin. Lê Zurbe vê yekê qebûl nake û ji ber fêl û hîleyên Hemîd Beg, Keleş û Pîr Mîrzoyî terka gund dike û diçe gundekî ermeniyan. Li vir dostê kal û bavan Sûrênen ermenî aliyê wî dike û li wan xwedî derdikeve. Bi vî awayî Zurbe jî dikeve nava karêñ Partiyê û doza dîwaneyeke nû dike ku ew dîwan, dîwana kesîb û belengazan e.

### **3.3. Dê û Dêmarî (Rewan, 1986)**

Romana Egîdê Xudo ya Dê û Dêmarî (Xudo, 2016) ji aliyê serlehenga xwe va ji yên din cuda dibe. Di vê romanê da serleheng jineke kurd e û destgirtiyê wê ji bo şerekî li hember burjuvazî û faşîzmê çûye û venegeriyaye. Bi destê nivîskarekî zilam jiyan û derûniya jineke kurd<sup>11</sup> hatiye nivîsin ku heta wê çaxê zêde mînakên wê nîn in ji xeynî Xatê Xanîma Eliyê Evdilrehman. Di vê romanê da ne tenê pesindayîna sîstema Sovyetê lê belê hewldana fêmkirina derûniya jinekê jî cih digire.

Di vê pirtûkê da jî îdeolojiya Lenîn û partîzanî bi awayekî aşkere xwe dide der. Hertim danberhevek heye di navbera rabirdû û dahatûyê da. Derfetên ku hatine bidestxistin bi awayekî minetdar ji devê lehengan tên bihîstin: “Salê dirêj derbas dibin. Gundê Mêrgesorê hatiye guhastinê. Hukumatê û daîren curbicure mal û xaniyên nû çêkirine. Hemû tişt bi tevayî hatine guhastinê, cahilên gund pir bûne, dixwînin, bi jiyaneka nû dijîn û dixebeitin.” (r. 41)

Şerê li hember burjûva û faşîzmê bi reşkirina Hîtlerî di romanê da gelek caran derbas dibe: “Belkî kilîta reş bi devê Hîtler bikeve, di rûyê vî şerî da ev xelqa hemû çawa dizêre!” (r.21) Bi vî awayî di romanê da gelek caran li ser zimanê karakterên romanê dijayetiya Hîtler tê kirin û piştiriya helwesta Sovyetê tê vegotin.

Wekî Ergün (Ergün, 2018b) jî destnîşan dike heman alîgirî di dijayetiya adetên kevin da jî tê kirin ku li pêsiya “jiyana teze” ya sîstema Sovyetê asteng in. Dema di bin karîgeriya Şêx Sefo da bavê Sîsê naxwaze keça xwe bide Saşa, Reşîd û Evêlinâ Rubênovnaya wek nûnerên îdeolojiya Sovyetê bi axaftinên xwe vê meseleyê çareser dikin û pêşî li fitneya Şêx Sefo digirin. Ev jî dide zanîn ku Dê û Dêmarîyê da jî serdema piştî Şoreşa Bolşevîk û bernameya damezirandinê ya Sovyetê wek fonksiyoneke erêni cihê xwe girtiye.

### **3.4. Gundê Mêrxasan (Rewan, 1968)**

Romana Eliyê Evdilrehman a bi navê Gundê Mêrxasan (Evdilrehman, 2012) cara ewil di 1968an de li Yêrêvanê, ji aliyê weşanxaneya Hayastan ve tê weşandin. Eliyê Evdilrehman bi xwe jî destnîşan

<sup>11</sup> Ji bo şiroveyeke berfirehtir derheqê derûniya jina kurd Karê da, hûn dikarin binêrin: (Aydogan, 2014: r. 223).

dike ku ev romana wî ya pêşîn e û di 1959an da dest bi nivîsinê kiriye û di 1965an de temam kiriye (Evdilrehman, 2012:10). Dîsa şêweya xwe ya nivîsinê jî aşkere dike ku wî “îsbatên tarîxî yên qewmî” berhev kiriye û li ser wan hîman ev roman nivîsiye.

Di romana Gundê Mêrxasan da gelek lehengên şoreşger cih digirin. Wekî mînak Qasim kurê şoresherekî navdar e û bavê wî Reşoyê Şamilê Kurdoxlî “ji bo mehkemkirina qaydeyê Sovyetiyê, xwesjiyina cimaetê” (r.141) emrê xwe dide. Reşo endamê Firqeya<sup>12</sup> Bolşevîkan e û bi mêrxasî li hember “dijminê sinifê” şer dike û tê kuştin. Qasim jî wekî bavê xwe di refêن Bolşevîkan da li hember çînên serdest şer dike. Qasim û Çolo bi hev re xebatên kolxozê bi rê ve dibin. Qasim gava ku xwendina xwe xilas dike wekî ciwanêن din naçe xwendina bilind, dixwaze ku ji bo miletê xwe û Partiyê bixebite. Demekê xwe ji Xezala hezkiriya xwe dûr dixe ji ber ku Xezal keça Heso Beg e. Lê bi dû ra ku bi partîzaniya Xezalê dihese û hezkirina xwe eyan dike. Dîsa tê dîtin ku partîzanî û îdeolojiya karekteran ketiya pêşîya jiyana wan a şexsî û taybet. Nivîskar qiseya lehengên xwe ya evîniyê jî bi şertekê vedi-bêje. Qasim bi şoreşgeriya Xezalê qeneh dibe û dildariya xwe aşkere dike.

Ji xeynî van Gogêya keça kurd jî di vê romanê da derdikeye pêş ku hezkiriya Evdilmecît e û Evdilmecît jî wekî gelekan firqeçiyekî baş û Bolşevikekî xurt e. Gogê wêrekiya xwe di şerê ewil da nîşan dide, Riza Efendî bi kêrekî birîndar dike û tîne li ber êla xwe. Çolo û giregirêñ êlê hemû wê pîroz dîkin û gotina bi nav û deng ji bo Gogê jî dinehwirînin: “Şêr şêr e, çi jin e çi mîr e.” (r. 45). Keçen kurd jî wekî xortêن kurdan di refêن şoreşê da cih digirin, ew jî alîgirê Partiyê ne, di jiyana rojane da dîdar û berçav in.

**240**

Wekî piraniya romanên kurdî yên Sovyetê Gundê Mêrxasan jî ji bo danberhevê berhemeye nimûne ye. Di vê romanê da jî tê dîtin ku axa û beg bi zilm û tehdeyiyyê xwe cih digirin. Hertim gundiyan dizêrînin, ked û xebata wan dişelînin. Ev têrê nake dewletêن serdest jî bi bac û xeracan gundiyan dubare dizêrînin. Nivîskar panoramaya zordariya feodalîzmê disêwirîne û adetên xirab ên feodalîzmê, nezaniya vê serdemê û paşdemayîna feodalîzmê radixe li ber çavan. Elbet li hember vî kawdan û barûdoxî rizgarkeriya Şoreşa Bolşevîk, azadîxwaziya sosyalîzmê, ronakgeriya Sovyetê û pêşketina aboriya Sosyalîst jî bi şayesandineke xweşbîn nîşan dide.<sup>13</sup> Ev jî dide zanîn ku nivîskar meyla xwe ya îdeolojîk û partîzanî bi şêweyeke mêldar di nava edebiyata xwe da bi cih dike.

### **3.5. Hewarî (Rewan, 1967)**

Yek ji romanên kurdî ya Sovyetê yê ku qonaxeke dîrokî dike mijara xwe ya sereke jî Hewariya (Cindi, 2008) Heciyê Cindî ye. Ev roman jî wekî yên din pesna sosyalîzmê dide û minetdariya xwe ya ji bo Lenîn û Sovyetê jî ji bîr nake. Heciyê Cindî di 1967an da vê romana xwe ya dîrokî-folklorîk diweşîne. *Hewarî* ji du paran pêk tê û li ser jiyana kurdêñ êzidî radiweste û ji vegotina wê jî diyar dibe ku aliyeke wê ya didaktîk jî heye. Roman di van du beşan da bi awayekî kronolojîk behsa du sed salan dike.

Di Hewariyê da leheng ji bo çîroksaziyê bi awayekî reş û spî hatine şayesandin. Ev jî nîşan dide ku derûniya karakteran ne, lê armanca wan derdikeye pêş. Lehengên neyînî yanê temsîkarêñ çîna serdest hertim bi nêrîneke neyînî têş şayesandin; ew tim xerab in, bêrehm in, xerc û xeracan berhev dîkin, kesîb

12 Peyveke Serhedî ye û ji bo Partiyê tê gotin.

13 Ji bo danberheveke giştî ya li ser ducemseriya romana kurdî ya Sovyetê hun dikarin lê binêrin: (Ergün, 2017 rr. 644-661)

û belengazan dizêrînin. Lehengên erêni<sup>14</sup> jî li hember vê rewşê; qenc in, baş in, dilsoz û dilpak in; bi hes-teke partîzanî xwedî li doza xwe derdikevin; ji bo armancê bilind dikarin bi rehetî canê xwe feda bikin.

Fêrikê lehengê vê romanê di tabloya panoramaya reş û spî da qisma spî sedî sed temsîl dike. Neviyê Emerik Axa ye lê şoreşgerekî Partiyê ye. Di nava ciwanan da propagandaya Partiyê û Lenînî dike. Di refen Bolşevîkan da cih digire û li aliyekî ve jî helbest û nivîsan dînivîse, di kovar û rojnameyan da diweşîne. Yanê lehengekî tam anegorî nivîskarênen sosyalîst-realîst e. Ew hertim gundiyan hişyar dike ku “li Ûrisêtê niha Lenîn bi pêş de hatiye, dibêje dînyayeke wisa bê çêkirin, wekî axa lê tunebin” (r. 360). Gundî jî ji Fêrikî zehf hez dikin, wî wekî temsîlkarê Partiyê dibînin û “pirs didanê, pê şâ dibûn, pesnê wî didan, pesnê wî didan wekî di ber me de xebitiye, ku dewlet bibe ya paleyan û gundiyan” (r. 53).

Wekî romanê din yên ku li Sovyetê hatine nivîsin, Hewarî jî gelek caran bi gotin û pesinan Lenînî bi bîr dixe ka ew çawa li kurdan xwedî derketiye, çawa welatê Sovyetê ji bo van kesîb û belengazan bûye sitargeheke aram û wekheviyê. Apê Moskov qala sêwîxaneyan dike û dide bawerkirin ku heke ew sêwîxane nebûna zarokên ji ber xelayî xilasbuyî jî wê ji destê wan biçûna. Li vir navê gelek zaro-kan jî bi lêv dike ku iro ew kes wekî damezrînerên ekola Sovyetê tên naskirin: Wezîrê Nadirî, Xalitê Celalzade, Emînê Evdal û gelek kesên din. Cerdoyê Genco jî yek ji wan e ku demekê redaktoriya Riya Teze dike. Kamil jî derheqê vê yekê de dibêje ku “Dîwana me per û bask da wan û hezaran, hezaren mîna wan bi fire xist” (r. 44).

Hewarî wekî berê jî hatibû destnîşankirin pesna Lenînîzm û partîzanî da ji romanê din kêm namîne. Heciyê Cindî bi xwe jî şahidiya serboriya miletekî kiriye ku ew milet ji ber zilm û tehdeyiyan direve û li welatekî din dihêwire. Lewra çiqas ji destê wî hatiye wî ev serborî nivîsiye. Ji ber wê ye ku gelek caran ev pesindayîn diçe heta minetdariyeke bêhempa û xwe aşkere dike.

### 3.6. Bawerî (Rewan, 1990)

Bawerîya (Hepo, 2013) Ahmedê Hepo cara ewil di sala 1990an da li Azerbaycanê tê çapkiran. Di nivîsîna vê romanê da nivîskar hewl daye ku li ser pirsgirêkên eşîrtî û qebiletiyê raweste. Ji dîroka kurdan mînakan hildigire, fen û fêlîn neyarênen wan di tevna romanê da radixe li ber çavan û herwiha baweriya dahatûyê jî ji bîr nake. Nivîskarê romanê di pêşgotina xwe da jî diyar dike ku ev berhem bi ruhekî welatparêziyê hatiye nivîsin lê dîsa jî bêhna Yekîtiya Sovyeta berê jê tê (r.5). Ev jî nîşan dide ku bi lehengên xwe yên şoreşger û bi ruhekî partîzan ev roman hatiye honandin.

که‌سایه‌تیپیدان جوړی خوازه‌یه که به ریزه‌یه کی زور له ئه‌م بیاتدا به‌کاره‌تیراوه و یه کن له جوانترین و جوانی‌خولقاندنی‌ترین رازه ره‌وانی‌بیزیه کانه و هه‌ر له کونه‌وه جبی سه‌رنجی ئه‌م بیاتناسان ببووه؛ بو وینه ئه‌رستوو له نامیلکه‌ی و ته‌بیزیدا ئاماژه‌ی پیکردووه و به جوړیک هیزی بزاف و ژیان به‌شتاندانه‌ی ناساندووه (میرصادقی، ۱۳۷۶: ۷۰). له سه‌ر دوو کوکله‌که‌ش داده‌مه‌زري؛ له لایه‌که‌وه که سه‌ر بونه‌وه ریکی گیاندار و له لایه‌کی تره‌وه شتیکی بیگیان (ابن الرسول و حسینی، ۱۳۹۳: ۹). له پوانگه‌کی ره‌خنه‌گرانی ئه‌روروویه‌وه که‌سایه‌تیپیدان بریتیه له چه‌سپاندنی تاییه‌تمه‌ندی مرؤف به غه‌یری مرؤفه‌وه، یان به‌کاره‌تیراوه کیانی سیفاتی ئینسان به‌تابیه‌ت هه‌ستونه‌ستی ئینسانی بو شتانی ئینتزاوعی، زاراوه‌گه‌لی گشتی و بابه‌تگه‌لی غه‌یری ئینسانی و گیانداره کانی تر (شفیعی کدکنی، ۱۳۷۵: ۱۵۰-۱). شه‌فیعی که‌دکنه‌ی وک ره‌خنه‌گریکی ئیرانی دوای گه‌ران و پشکنینکی به‌ربلاو به سه‌رجاوه کون و نویکاندا له سه‌ر ئه‌وه باوه‌ده‌یه که مه‌بdest له خواستنی درکاو، هه‌ر ئه‌وه که‌سایه‌تیپیدانه‌یه، ته‌نیا ئه‌ونده‌هه‌یه که له مه‌یدانی که‌سایه‌تیپیداندا بابه‌تکه له مرؤفی تیپه‌پاندووه و حه‌یوانه‌کانی تریش ده‌گریتیه‌وه (شفیعی کدکنی، ۱۳۷۵: ۱۵۳). ئه‌م هونه‌ری وینه‌سازیه به جوړیک هه‌م شاعیر و هه‌م وه‌رگر/خوینه‌هان ده‌دا به‌رهه و ئه‌وهه که قه‌بوقول بکنه که هه‌موو ره‌گزیک له سروشتدا خاوهن گیان و هه‌ستونه‌ست و سه‌رجهم تاییه‌تمه‌ندیه کانی مرؤف (ابن الرسول و حسینی، ۱۳۹۳: ۱۲۳). له خواستنی درکاودا پیشوبه‌تیراوه‌که له زورترین حاله‌تدا مرؤفه و وک که‌زاری (۱۳۹۳: ۱۲۷) جه‌ختی له سه‌ر کردووه بیناچه خواستن له سه‌ر ئینسانواره‌ی و گیاندارخوازیه. به واته‌ییکی تر به‌ربلاوی مرؤف، جیهانه، و پوخته‌ی جیهان مرؤفه (هه‌مان: ۱۲۸). ئه‌م ته‌کیکه زورتر له ناو ره‌ماناتیکه کاندا برهوی هه‌ببوو؛ چونکه ئه‌وان دیاردده سروشتیه کانیان وک مرؤفیک فه‌رز ده‌کرد و ده‌گه‌لیاندا هاوده‌ر دیان ده‌نواند و هه‌ستونه‌ستیان ده‌گوړایه‌وه. به ناپه‌حه‌تیی ئه‌وان ناپه‌حه‌ت

دبوون و به خوّشحالیان دگه شانهوه (احمدی و همکاران، ۱۳۹۸: ۴۴). له قورئانیشدا و ادبینین که هه مهو شت ته نانه ت جامداتیش قسه ده کن و وه ک بوبونه وه ریکی زیر و هزرمهند ده جوویلنه و بزاف و دانوستانی تاییه ت به خویان هه یه (المطعنی، ۱۳۸۸: ۳۴۳). کاتن شاعیر سیفه ته کانی مرؤف ده گواستیته وه بو سروشت و نازل لان، بهم کارهی هه است و سوزی دل و ده رونی خوی ده دهربری (سلیووه عیسی، ۱۴۰۰: ۸۹).

لیکوئینه وهی شیعری شیرکو بیکه س بومان ده ده خات که ئه م شاعیره نه ک هه ر جامدات و ماکی فیزیکی و هه ستی هیناوهه ریزی مرؤف، به لکوو گه لن جاران واتا و بابه تی ئینتزا عیشی به سه ر کردۆته و گیان و هه ستونه ستی ئینسانانه ی پیبه خشیون. که سایه تیپیدان له شیعری شیرکودا لهم ئاسته تیپه راندووه و که وشه نی گیانه خشیون به چهندین قوتا خ به زاندوو و سۆز و هه ستونه ستی ئینسانانه ی پیبه خشیون. که سایه تیپیدان له ناخی بونه وه رانی بیگیان و جامداتی ترمه و هه ستی هاوسوزی و ده ده دلی و بیرون اگرینه وهیانی جوولاندووه. ده توانین بلیتین ئه م هونه ره «رەگه زی زال» سی شیعری شیرکو بیکه سه. رەگه زی زال کلیلی بوبوتیقای فورمالیستیه. یاکبسان ئاوا باسی ده کات: «ئەو بەشە لە بەرھەمی هونه ری که سه رج راده کیشتن، ئەم بەشە به سه ر بەشە کانی تردا زاله و وک بەریو بەریانه؛ دیاریان بەسەردا ده هینی و له ئەنجامیشدا هەر رەگه زی زاله که یه کپارچەیی و یه کیتی بیکه تەی بەرهەم دابین ده کات» (Jakobson، ۱۹۸۸: ۲۵). له شیعری شیرکودا به پیتی و پیناسه یهی یاکوبسن، که سایه تیپیدان رەگه زی زاله. لهم بەشە دواییدا دەپەر زینه سر رەھەند کانی کسایه تیپیدان له شیعری شیرکودا و نموونه کانی که نوینه ری شیوازی شیعری ئەون، شیده کەپنە و.

### که سایه تیدان به دیاردە ماددی و هه ستی

کرۆچه ده لىت: سروشت له هه مبەر هونه ره و گیلۆکەیه و ئەگەر مرؤف نه یەننیتە قسە، لاله (۱۳۶۶: ۱۰۸). به واتایه کی تر ئەو و مرؤف کە به وینای خیالی و نواندنی شاعیرانه جووله و بزافیک ده خاتە ئیتو سروشت و ئینجا له گەلی هه ستونه ست ده گۆرتە و، چونکە له راستیشدا بیکه سانی شاعیر له سروشتدا تەنیا دیدمه تیکی بیکه سانی و بهس، به لکوو عەینی کەسگە لیکی بزۆز و خاون جووله و هەلس و کوت ده بیکن (الراغب، ۱۹۹۶: ۲۰۰). گەلی جار شیرکو بیکه س به هیزی خەیالی ئەفرینه ری خوی دهستی بردوتە ناو دیارده گەلی سروشتی و ماددی و دیدمه تیکی بیکه سانی پیبه خشیون. کاتن بهم چاوه وله شیعره کانی ده گۆلەنەوە تیدەگین که هه مهو رەگه زیکی ماددی و بیگیانی سروشت له بەر چاومانه وه لیپریزی جووله و بزاف و حەیان و هەست ده کەین هه مهو سروشت گینگلەدەدا و ژانی ژیان گرتوویه ت و خەریکە زینی دەبن. له شیعری شیرکو بیکه سدا هه مهو تەن و جیسم و ئەندامیتکی سروشت خاون شعوور و هه ستونه ست، چیا دەشلەزی، درەخت و تاڭگە و پووبار سەرسام ئەبن (بیکه س، ۲۰۰۳: ۲۰۰). شاخ و باخ دەبەنە مرؤف و دەکەونە گەران و سوخارخ کردن: «ئەو وەتەی شەپولی ئەم ئاوا باشینە فریو بە باخە کان بە دوایدا ئەگەن ئەو وەتەی ئەم هه ورە رۆیشتووە/شاخە کان بە دوایدا ئەگەن» (بیکه س، ۲۰۰۶: ۲۷۵/۳). له دیوانی ئیو بە خوّشە ویستیم ۵۵ سپېرندا دیدمه تیک ده بینری کە به کسایه تیپیداتیکی بیوینه رازا وەتەوە: «چوارچیو ویه کی بیوینه بەرامبەرمە و چەندین وئەش/لە سەر میزەن چاوه روان!» يەک چوارچیو و پیزى وینە و هەر ھەمو ویشیان خوشە ویستن! /وینەی گزگى مندالیم/ وینەی خۇرۇشىنى دايىم/ وینەی ھاوارىيکى باوکم/ وینەی شیعری هەرزە کاریم/ وینەی يەکم ماقچى مانگى/ اھەنگوينى خۆم و ژنە کەم/ وینەی مەستیم/ لە بەردم بورجى ئىقلادا/ وینەی... وینەی.../ يەک ھەللانە و پولن وینە/ دردۇنگىيە کە ناو دلدا و تىا مام كاميان ھەلبىزىم/ چاولىكەم خستە لاو.../ ئەم جارەيان چوارچىو خۆی/ لە سەر دیوار دەتە خوارى و بىندوو دەستى دايە وینەيە كيان/ اھەللىگەت و خستىتە ناو رۆحى خۆيەوە/ وینەی خۇرۇشىنى دايىم!» (بیکه س، ۲۰۰۶: ۲۰۰). لىرە دەبینىن شاعير مەسيحاتسا گيان ده کاتە بەر ئەم چوارچىو/قاپاچە و ئەپویش جموجوولى مرۇفانە پەيدا دەکا: يەکەم: ئەوەتى کە له سەر دیوار دەتە خوارى، واتە پىن و هیزى هاتن: دووهەم: ئېرا دە و يەقىنى ھەيە (بىندوو دەن): سېھم دەستى ھەيە و شتە لە لە گرئى: چوارم زى رۆحە. هەر وەها دەبینىن كيو ده کاتە مرؤف و چەند ھەيمىتايەتى بى دادەنی و له سەر بەرەندى كاره ساتە کانى شەپى بەعسىدا کاتن بە هه مهو میزى چەك و كەرەسەي شەپەوە هېرىش دەکەنە سەر كوردستان، دەن: «كىوان دەستيان بە كلاوى لووتکەوە گرتبوو/ھەتا بەعس نەيفەرنى». لەم دیدمه نەدا كيو مرؤفە و هەستونەست و ترس و سەر و دەست و كلاوى بە راشكاوا بۇ دازراوه. جاريکى تر دەبینىن کە شاخ و داخ قسە دەکەن و باس شىتكى ۵۵ گۆلەنەوە. ئاو و زەريايىش ھەر بە هەمان شیووه (بیکه س، ۱۳۹۴: ۵: ۱۷۸-۹). ئەشكەوتىش بە سيفەتى مەرۋانە ئەگەنە تىپیداروا (بیکه س، ۱۳۹۴: ۲۱). باخ و دار و گۈز و گيا تىيچگار زۆر كراونە تە خاونەنە کە سایه تى: «نازانم چون چاوم لېيىو/ باخىك ماقچىكى ئارى بۇ ئاو!» (بیکه س، ۱۳۹۴: ۶۰). يە بىنەن باخ لە قالبى مرؤفىكى عاشقدا دەپ دەگېرى: «كچىكى جوان ژمارەتە لە فۇنە كە دا باخىن...» (بیکه س، ۱۳۹۴: ۵: ۱۶۹). با قسە دەکەن (بیکه س، ۱۳۹۴: ۱۶۹ و ۱۸۱). رووبار گومان دە کات (بیکه س، ۱۳۹۴: ۱۰۰).

ھەر وەها كەرەسەي پىويستى ناومالە و پوشاك و خوردو خۆراك رەھەندىتکى ترى کە سایه تیپیدان له شیعری شیرکودا پىكىدە هەتىن. بە و واتایه کە گیان دە به خشىتە ئامراز و كەرەسە گەلەتکى پىويست کە له ژيانى رۆژانەدا دەور دەگىپن و كەلکيان لىيەر دەگىدرىت. بۇ وینە تەنافى جله لخستن کە جووتى گۆرە ویي لە سەر ھەلخراوه، کاتن با تايەك لە گۆرە ویي کە دەپ پىتىن، دەگەلی دىتە قسە: «ئەمە كۆتايى

ئیووه بورو/له ئیستهوه، نه ئە و هیچ کەس ئەیهوى/نه تو کە هيشتاكە ماوى/ئیووه بە جووت نەبن ناژین» (بىكەس، ۲۰۰۶: ۲۶۰/۶). يە وەک لىيکدراوى «پانتولىيکى غەمگىن»، لە دەقى: «چەند ھەزارىكى چىچ و لۆچ/له گىرفانى پانتولىيکى غەمگىنياھ» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۱). لە ناو خواردەمەنىدا وەک دەزانىن دىاره كە لە فەرەنگى كوردەواريدا تا ھەنۇكەش نان و ئاۋ گۈنگۈرين پېخۇرى مەرقۇي كوردن. لە شىعرى شىركەدا دەورييکى ئىچگار مەزن بەم دوانه دراوه. جار-جار تايىەتمەندىي قىسىمەن دەن/ترسا و داچلەكى/بلە ھاتەوە و/كولىيھە گرياوهە كە چاوى سرى و بۆي پىنگەنلىقى واي زۆر ئەيکەنەوە/ئە و كاتەي ويستيان پېوهى دەن/ترسا و داچلەكى/بلە ھاتەوە و/كولىيھە گرياوهە كە چاوى سرى و بۆي پىنگەنلىقى واي تو ئەم خۆيت و خەوهە كە شەم نايەته دى!» (بىكەس، ۲۰۰۶: ۵۱۱/۳). كولىيھە وەك خواردەمەنىيەك كىيان و ھەستونەست و شۇعۇرۇيکى واي پىدەبەخشىرى كە جىاوازى دادەتتى لە نىوان شەتكان و ئىنسانەكاندا. ئە و دەيىتە خاوهەنی ھزىز و بىرۇرۇ، و ھەلۋىست دەگرى بەرامبەر بە دىياردەكان، وەك بەرامبەر بە زۇلم و زۆر؛ چۈنكە دەبىنلىن لەو كاتەيدا كە دەبىتەوە بە ھەمير تا بىكتەوە بە نان بۇ مىر، وەزەزى و تۈرۈھىي و نازەزايەتى دايدەگرى و لە ترسى ئە و چارەنوسەيدا دادەچلەكى. ئىنجا دەبىتە گىاندار/مەرقۇي ئەوهە كە بلە ھەمال بىخواه؟ دەرىپىنى خۆشحالى خۆي كاتى لەو خەونە ئاخۇشە رېڭارى دەبىتە خۆراكى بەلە دەسييکى تر بەتايىت نە زالىمىك. بۇيە ئە و ھەز و نارەززۇوهە خۆي ئاوا بە وشەقى قورس و زۇر پېرواتاي «ئۆخەي!» دەردەبېرى، بارى سۆز و لە ناخى دلەوە ھەلقولانى كە لەم وشەدا ھەيە، قۇولالىي كەسايەتپىيدانە كە دەگەنەتتىت.

لە شىپوھى كولىيھە گرياوهە كە شىركۆ بىكەس تەعېرىي «ئاۋى گىينۆك» يى (بىكەس، ۲۰۰۶: ۲۶۱/۶) خولقاندۇووه كە دىاره سىفەتى گرىنۆك تايىەتمەندىيى مرۆقە و بەس، دىاره كەسايەتپىيدانە كە لە قۇناغىكىدا شەتكە دەتىنەتى و تۇمارى دەكە، ئەم ئاوا لە حاڵەتە كانى گىيانىدا تۇمار كراوه. ھەرودەها ئەم تايىەتمەندىيى بۇ جۆگەش دابراوه (بىكەس، ۲۰۰۶: ۲۶۱/۶). سيفەتى دواي گىيان و گىينۆك ئېرىپۇونەوهە كە شاعير ئەوهەشى بۇ داناوه: «جۆگەيە كى گىينۆك، گۈز، گىينۆك/من بىز و ئە و گىينۆك/ئەز نازانم ئەم بە كى ئىر ئەيىتەوه؟!» (بىكەس، ۲۰۰۶: ۲۶۱/۶). كەرسە ئەنەن دەقەلەم و دەفتەر و مىزى لەسەر نۇوسىن بەمرۆقە كراون (بىكەس، ۲۶: ۱۳۹۴). نان تاسە و مەراقى شتىكى لە دەلدايە و بىر ئەكتەوە و ئاۋىش ھەر شتى ماددى ھاتووه: «پىشىكىك مەد/دەرمان گىيا» (بىكەس، ۲۸: ۱۳۹۴). لەم بەندەدا بىزازى كە بۇ كەسايەتىدان بە بەو شىپوھى (بىكەس، ۱۰۰: ۱۳۹۴).

ھەندى جارىش ئاۋرى لە مآل و كۆلان و شەقامىش داوهەتەوە و كەسايەتىي پىن بەخشىون: «ھەر لەم كۆلانە ئىيمەدا/دەرگا لە چوارچىوهى خۆي و شۇوشە لە پەنجهەرە خۆي و سىلەي كۆلان لە كۆلان و/كۆلان لە دىوار بىزازە!» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۲). لەم بەندەدا بىزازى كە تايىەتمەندىيەكى مەرقۇي دەراوهەتە پال ئە و بەشانە مآل و شار.

شىركۆ ھەر بە سەرزەويەو بەند نەبۈوه، بەلکۇ خەيالى بەرىن و سىنورىھەزىنى، تەنە ئاسمانىيەكانيشى لە خۆ گىرتۇوھ و لە فېنىدا تا ئاسمانەكان و كەشكەلەنى تەيىكىدووه. يەكىن لە جوانلىرىن داھىتىن بەھارىكەنلىكى لەم بوارەدا شىعرى مانگ و زەريايە (بىكەس، ۵۷۱-۵۷۱/۲: ۲۰۰۶) كە پىوهندىيە كى ئەويندارانە و پېسۋىزى لە نىوانىاندا خولقاندۇووه و دەبىنە جووتە عاشق و ماشقى و ھەموو كەينوبەيىنەكىان لى پەيدا دەبىتە. لەو شىعرەدا نىشانەكانى مەرقۇاندىن بىرىتىلەنەن، فازىكەن، چاۋشارەكىكەن لە رۇوو نازەوهە، سەفەرگەدنى دېلەر (ھېجران)، خلىسکان، شىتىبۇونى ئەويندارانە و لە كۆتايدا سەرەھەلدانى هەلچۈن-داجۇونى زەرييا لەو پىوهندىيە ئەويندارانە. يە لە دېمەتىكى زۆر پېخەيال و شاعيرانەدا، دەبىنلىن كە مانگ وەك ئافەرەتىكى سكپەر دەزى و منالى دەبىتە: «لە دارشمانە ئەستىتەيەك لە دايىك بۇو/له قەلچوالان بۇو بە مانگ/مانگ ھاتە خوارى بۇ دەشتايى/نىوان گۆيىھە و گلەزەرەدە بەھارىكەدا خۇر ھەزىلىكتەد و ھانى/لە دواي نۆ وەرز/لە مەلکەندى مانگ ژانى گەرت و/كۈرىكى بۇو/برايىم پاشاش ناوى لىتىا سلىمانى» (بىكەس، ۲۳۱-۲: ۱۳۹۴). لە شوينىكى تردا ئەستىتەرە كان ھەللىدەپەرىتىنە: «لە سايەقەي سەردەماندا/ئاسمان وەك چاوى ساوايان/پاڭ و رۇون بۇو/ئەستىتەرە كان ھەتىنە نزم بۇون ئەتتەت ھاتۇون بىنە خوارى و/لە و گۈچەمە تا بەرىيەبان/لە گەل شەپۇلان ھەلپەرن!» (بىكەس، ۱۳: ۱۳۹۴). خۆرىش لە دېمەنیكىدا بە مەرقۇي كە وتوو دانراوه (بىكەس، ۱۵: ۱۳۹۴).

### که سایه تیدان به ئەندامى لهشى مرۆڤ

بابەتن کە شاعير داهىئەرانە دەستى بۇ بىردووه و شەقلى تايىھتىي خۆى پىوه ناوه، بەكارهينانى ئەندامانى جەستەي خۆيە كە هىنناونى و كەسایه تىپىداون. لەوانە دەبىنин دەستى لە خۆى جىا كىرىدەتەوە (التجرید) و بە هەستونەست و شعوور و هېرى مروڤانە رازاندوویەتەوە: «ئەم بەيانىيە دەستى خۆم/لە كۆتى شانى خۆم ئازاد كرد و/پىم تو: بچۇ/ "بَا" لە سەر ئاو بنووسەرەوە/گەردىلول بخويىرەرەوە/ساكارىي بىكە بە تەممۇز» (بىكەس، ٢٠٠٦: ٤/٥٥). لەم كۆپلەيدا دەست كە پىشتر وەك ئەندامىكى ئاسايىي جەستەي شاعير دەورى گىپراوه، سەربە خۇ دەبىتەوە و دەبىتە مروڤىكى كەسایه تیدار و خاونە بىرەز و را، بۇيەيە كەلبىزىرى و لە هەموو گۈنگۈريش سەۋاددارە و رازاوەيە بە ھونەرى خويىندن و نووسىن كە تايىھت بە مروڤن.

### که سایه تیدان به گيandارانى جگە لە مروڤ

كۆتى، كە، جۆرەكانى چۆلەكە (بولبول، بازۆرى، پاسارى، كلاوکوورە)، سەمەندەر، گا، ئەسپ و زۆر گيandارى تر لەو گيانلەبەرانەن كە شىركۆ بىكەس كەسایه تىيى مروڤىي پىيەخشىون و هىنناونى نيو شانزى شىعرىيەوە و دەورى پىداون. زۆرتىن سيفەتى مروڤانەش كە داۋىتە پال ئەم گيandارانە، قسە كردن/گوتە كە شىوازى لە تەمىسىل (نواندىنى) پىيدەلىن. «بەيانىت باش! من ناوم بولبولە/خەللىك ئەم باخچەيەم/دەمكە باخەوانىتكى توورەمان لېپەيدا بوبوھ...» (بىكەس، ١٣٩٤: ١٧). لەم شىعرەدا بولبول دېتە گۆ و قسە دەكتات و دواي ناساندى خۆى، بارودوخ و ھەندى لە دەنگ و باسى خۆى و چۈنۈتى ڈيانى دەلىتەوە و ئاماژە بە مەلبەند و زىدى خۆى دەكە و ئىنجا لە دەستى باخەوانەكە گله و گازنە دەكتات. ھەروھا چەند سيفەتى ئىنسانىي ترى داوهەتە پال بولبول و بە وەرزى و بىزاري و بىتاقەتى و ھەروھا ويستان رازاندوویەتەوە (بىكەس، ١٣٩٤: ١٩).

### که سایه تیدان به دياردەي واتايى و ئىنتزاعى

شىركۆ بىكەس لە كەنار گيانبەخشى بە دياردەگەلى ماددى - سروشىدا، دەستى بۇ دياردەگەلى واتايى و ئىنتزاعىش درىز كىردووه و لەم مەيدانەشدا گەلن وىنەي خەيالىي بىهاوتا و داهىئەرانە خولقاندۇوو. وەك ئەوهى كە گيان بکاتە بەر گۇرانى و ئاواز و بىكاتە پەلەوەرەتك و بىيانىتە ئاسمانى بەرين: «لەپىرا گەر بە چەكە ئاوازى ھەلەپى/لېرە ھەم ئەبن بە ئاسمان» (بىكەس، ٢٠٠٦: ٣/٥٠٠). گۇرانى ھەروھاش دەبىتە خاونە كەسایه تىيى مروڤانە و دەكەوتە كەپان و سۈرەخ كەن: «گۇرانىيەكى غەمگىنى شىنبىا/بە شوئىن شاعيراندا ھەگەرى» (بىكەس، ١٣٩٤: ٢١٥). غەرەبىش دەبىتە زېرەخ و تايىھتەندىي ئەوان وەرەگىرى: «ئاواي چاوهەكى ئاواي شەربەكەي حىجازى، ۋەكىكە/ھەموو رۇز غەرەبىي ئەينوشى» (بىكەس، ٢٠٠٦: ٣/٥٠٠). ئەم تايىھتەندىي نۆشىنە كە كارى گياندارىتكە زارى ھەبى، لېرە دراوهەتە پال چەمكى غەرەبىي. چەمكىكى تر كوردايەتىيە كەسایه تىيىدەدرى و قسە دەكە: «كوردايەتى بانگم دەكەپىگە ئەگرم» (بىكەس، ٢٠٠٦: ١٦٥/١). شاعير بىرۇكە و يادەھەر و بىرەوەرەيشى هىننەتەپىزى مروڤ، بۇ نۇموونە تووويە: «من پۇلېك بىرۇكەي سەۋۆز و سۈرۈم لابۇون... من ئەمۈست دەستەمۇيان بىكەم/... بەلام ئەوان راپى ئەبۇون/ئەيانوت: ئىمە ئەمانھۆى ھەر لە ناو پىرسىاردا بىزىن/من ھەموو شەھۆي زۆرم لى ئەكەن/ئەنایىي بە جى بىلەن بەلام ئەوان ملىان ئەدە/بە تەننەيەوە نووسابۇون» (بىكەس، ١٣٩٤: ج: ٨٠). لېرە «بىرۇكە» وەك چەمكىكى واتايى و ئىنتزاعى دەبىتە مروڤىكى خاونە ئىرادە و بىرۇرا و سەرەتچىكار. بە پەرچە كەنارى «نامانھۆى» دەزايەتى خۆى لە ھەمبەر دۆخىتكىدا دەرىپىو. جگە لە خودى باھەتى كەسایه تىيىدانەكە واتە بىرۇكە كە شىتكى واتايى و ئىنتزاعىيە، زۆرتى باھەتە كان لەم دىمەنەدا واتايى و ئىنتزاعىن: راپى ئەبۇون، خەنون، وتن، ويستان/نەويستان، زۆرلىكىدن، تەننەيى، جىتەشتن، ملدان/نەدان. وەك دەبىنин بە پىزەيەكى زۆرى ئىنتزاعى بۇنەوە چەمك و دياردەيەكى واتايى و ئىنتزاعى بۇنە خاونى كەسایه تىيى مروڤانە و چەند تايىھتەندىي بۇ دابىن كراوه. ئەم تايىھتەندىي بىرىتىن لە: راپى ئەبۇون، وتن، ويستان/نەويستان، ملنەدان، خۇ نووساندە شىتكەوە. زۆر جار دەبىنن خەنۋىش كەسایه تىيى وەرگەتۆوه و بە تايىھتەندىي پەشۆكان دەورى خۆى لەم بوارەدا گىپراوه (بىكەس، ١٣٩٤: ١٦). لە شوئىتىكى تردا خەم و خەنون وەك دوو تايىھتەندىي مروڤانە دەراونەتە پال ئاسك (بىكەس، ١٣٩٤: د/١٦٢).

275

### که سایه تیدان بە «مەرگ»

يەكتى لەو دياردانەي كە لە شىعرى شىركۆ بىكەسدا جىڭگە و پىگەيەكى كەورەي ھەيە و لە پانتايىيەكى بەریندا لە پارچە پارچە و كەرت بە كەرت و ئاقار بە ئاقارى شىعرە كانىدا خۆى دەنۈنن، «مەرگە». ئىنچا مەرگ وەك و چەمكىكى واتايى و ئىنتزاعى كەسایه تىيىدەدرى و دەدوى و كاروپەھاتى مروڤانە لىنەبىتەوە. يەك لەو كارانە قىسەكىردىن. لە كۆمەلە شىعرى ئافاتدا دەخويىنەوە كە: «ئاۋىزىام بە. مەرگ ئەلمى: درەنگە»



بازره بونه!» (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۵۴/۳) و هک وتمان هر ئوهی که بانگی له ئاسپ کردووه، بهو واتاییه که مرۆڤاندورویه؛ هەلبەت لهم دیپەدا وەک پیشوبهینراویک بو تەنیایی بەکاریھیناوه.

### بانگکردنی بىگىان:

بانگھېشتنى گىاندار له شىعرى شىركىدا دەكى لە دوو بەشى جياوازدا لېكىيدەينەوە:

بانگکردنی بىگىانى ماددى-ھەستى: بانگکردنی بونه ورانى بىدەنگ يەكتى لە شىوازه رەوانبىزىانەكانى كەسايەتىپەدانە (ماحوزى و همكاران، ۲۰۱۸: ۶۱). كەز و كىتو له شىعرى شىركىدا رەنگدانەوەيەكى بەرچاوابان هەيە. شاعير خۇي زۆر لەگەيان تىكەل دەكەت و هەست بە دۆستى و نزىكىيەكى زۆر دەكى لەگەيان؛ بۆيە كەلىن جار دەگەيان دواوه و بانگىانى كردووه: «ئەي ساخام! ئەي پەندى بەردىنى پېشىنلەن!» ئەي ملى پلنگى بە خويىم خەت خەت و بە عىشقم داگىرساوا!» (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۰۹-۱۰/۳). ئىتر شاخ وەك مرۆققىك دەبىنин كە ئەندامەكانى و كارەكانى هەر لە ئەندام و كارى مرۆف دەكى: سيفەتى هەلگەرنى پىداوه و شان و دەست و ئەندامانى ترى بۇ رەسم كردووه. دووكەلىش لە بانگکراوه كانە و ديارە كەسايەتى پېتەخشارا: «ئەي دووكەلى بەزى دايكم لە وختى زاكرىدا! ئەي دووكەلى بەزى مىۋۇوم/لە وختى هەتاو چاندندى!» (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۲۴/۳). ديسانەكە بە شىوهى «ئەي دووكەلى خەونەكانم» و «ئەي دووكەلى رەنجەكانم» بانگکراوه (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۲۵/۳). بانگکردنى وەك «ئەي سىيى بىتەھفافا!» (بیکهس، ۵۱)، «ئەي وشەي بىتەھفافا!» (بیکهس، ۴۴: ج: ۱۳۹۴)، لەوانەيە كە شىتكى بىگىانى تىدا بۇتە بەرەنگ و نىدايان بۇ كراوه. ئەمەش بەو واتاییه كە پىتشتەر گىان و هەستيان پېتەخشارا و هاتۇونەتە رىزى مرۆف.

بانگکردنى بىگىانى واتايى/ئىنتزاۇيى: بانگکردنى دەل (پرسىيار كردن لە دەل؛ دەستورر پىدان/وابكە و وامەكە) و بانگکردنى گيان لەم چەشىنەن. وشەكان لەم جۆرە بانگکردنەدا نەرم و نىانتر و ناسكىرن و خۆشەويىسى و ئەوينىكى زورتىيان تىدایە. جەگە لەوانە، بىنەن كە رۆزگارىش گىانى گرتۇوه و بانگدەكىرى: «ئەي پۇزگارە لىخنەكان!» (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۰۵/۳). بانگکردنى تەنبايىش هەر لە ھەمان باھەتە: «ئەي تەنبايى! ئەي ئەسپى بەشى بىزابوو لە جەلھەوي ئەم زەمانى بازره بونە! ئەي زايەلەي كەوه سوورەكە ناو سىنگە!» (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۶۸/۳). تەنبايى دەكىيەتە بالىدەش بە ھەموو ئەندامانىيەوە: «ئەي تەنبايىم! /تۆ لېرە ئىستە كەنارىي/ناو ژايىكى شۇوشەبەندى رەنگاۋەنگى/ بەم دەنۈوك و بەو بالانە/چۈن ئەتواتى تو سۇورى شۇوشە بېرى؟/بۇ كۆي ئەپرە ئەي تەنبايى؟!» (بیکهس، ۲۰۰۶: ۵۶۸/۳). شەفق وەك دىاردەيەكى واتايى و ئىنتزاۇيى و لە عەينى حالىدا سروشتىش لە بانگکراوه كانى نىتىو شىعەرە كانى ئەم شاعيرىيە: «ئاوابوون بۇو/ئەي شەفەقى لە خاچىراوى جەستەم و مانگى كۈزۈراو!» يەكەن كەنارە شىعەر بانگدەكە و دەلىن: «ئەرى قەسىدە جوانەكە! بۇ ھەلناسى؟» (بیکهس، ۴۴: د: ۱۳۹۴؛ ۲۲۲: ۵۶۸/۳). بەم بانگکردنە كەسايەتىپەدانە ديارە لە خەۋىشدايە دەيىھەوئى خەبەرى بىكەتەوە.

### كەسايەتىپەدان لە قالبى چىنەكانى كۆمەلگادا

بەو واتايىه كە ناو ئەو شاتانەيدا كە شىركىدا كەسايەتىيان پىددەدا، چەندىن چىن و تۆيىتى كۆمەلگا دەبىنин؛ چونكە ھەندى جار شتە كە دەباتە نىو چىنى ناسايى كۆمەلگا، جارىك كەسايەتى چىنى فەلا و جووتىيارى پىددەدا، جارىكى تر دەبىتەر بىزى شاعيران و نۇوسەرانەوە، لە بار و دۆخىيىكى تردا سىيمى چىنى زالىم و داگىرەكەر لە كەسايەتىپەدانە كانىدا بەدى دەكەين. بە واتايىه كى تر شتە كان نەك هەر ئەبن بە گىاندار، بەلکو ئەبن بە خاوهن ھزر و فەرەنگ و خويىدىنى باڭ؛ ئەبن بە تاقمى خويىدەوار، بە خويىنەر و نۇوسەر، ئەبن بە خاوهن ھەلۋىست و بىبرۇرای تايىت و جىاواز؛ ئەبن بە دەسەلەندايى سىاسى و حوكومى، بە نىزامى و عەسکەر و پاسەوانى سۇورى و پاسەوانى ناو شار.

ھەندى جار شاعير لە چەند ئاستى جياوازدا يەك شت دەكتە خاوهنى كەسايەتى؛ بۇ نۇموونە باران جارىك دەبىتە مرۆققىك بەس باسەواد (واتە لېرە زۆرتر سەۋادى خويىدىن و نۇوسىن مەبەستە) و دەلىتى: «دەلپ دەلپ باران گول ئەننۇوسىتەوە» بىكەس، ۲۰۰۶: ۴۸۷/۳)؛ يە ئە واتايىه دەلىتى: «گەنە گەنە با پىدەشت ئەخويىتىيەوە»، ئەم نۇوسىن و خويىدىنەوە ئاستى زۆرتر سەۋاددار بۇون دەنۈنىق. لە ئاستىكى تردا دەبىنин نۇوسىنەك نۇوسىنەك ساكار و ئاسايى نىيە، بەلکو شاعير بۇون و شىعەر ھۆزىنەوە مەبەستە، ئەوپىش كاتىكە كە دەلىتى: «ئەو دەمەمە كە باران شىعەرەكى سەۋاتر ئەننۇوسى». ديارە شىعەر نۇوسىن كارى شاعيرە كە تاقم و چىنەكى دىار و بەرچاوى كۆمەلگا، چىنە كە سەر بە ھونەر و ئەم دەبىاتن؛ كەوابى باران و با لە پروو ئام و بە ھزەرە ئەم و كارە دەكەن و خۆيان ئاكادارى دەھورى خۆيان و كارەكانى.

چىنى ھونەرمەن دە: ھۆنەر و نۇوسەر (وەك باران و با لە سەرەتە)؛ خويىدىن و نۇوسىن داب و تايىتەنەن دەنەنەن مەرۆققىن و بەس. شاعير زۆر جار ئەم حالەتە بەخشىيە بە ماك /تەن/گىاندارىكى تر. وەك ئەوهى وتوویە: «ھەر بالدارىكى/وختى بەسەر ئە و (ھەلەجە) دا فېرى/نەرىتىكە/لە

ئاسوّدا به باں ئەنوسىتى: شانزەرى سىن/ئىنجا ئەرپا» (بىكەس، ۱۳۹۴ج: ۹۲). ئەم نۇوسىنە دەتوانى تەنبا و تەنبا سەدادارى بگەيىن و بەس. واتە ئەم بالىندە خويىندەن و نۇوسىنى زانىوھە؛ بەلام بە هەر حال نىشانەنى فەرھەنگ و ھونەرىيکى تايىھەت بە مەرقە.

چىنى خاودەن بىرۇرا و ھەلۆيىستى سىياسى: بۇ نۇوسىنە ئەمەدى كە شتەكان ئەبن بە مەرقۇيىكى خاودەن بىرۇرا و خاودەن ھەلۆيىستى سىياسى-كۆمەلایەتى، دەتوانىن ئامازە بکەين بە شىعىرى كولىرە كە پېشتر باسمان كرد (بىرۋانە ئىپ سەردىپى كەسايىتىدان بە دىياردەمى ماددى و ھەستى). ھەرەھە لە كىتىبى ملوانكەدا دەيىننەن كە كەرەسە كانى ئارايشتى ژنان و ئامىرە كانى تر ھەممۇ پىتكەوە خويان رېتكەخەن بۇ راپەپىن و خۆپىشاندىتىكى گشتى لە ئىيو شەقامەكان و بازپاردا. بۇ وېئەنە لە دىيمەتىكىدا ملوانكە كە ئاوا دەگىپەتتەوە: «بۇ پۇزى دوايى سەعات دەدى سەرلەبەيانى، وەختى چۈۋىنەدەرەوە، نەمەنەمە باران ئەبارى، چەتەرە كەمان بۆلەبۆلىكى كرد و ئىنجا خۇى كرددەوە... بە لاي راستدا وەرگەپاين و پۇومانكىرەدە بەرزايدە كانى سەرەرەوە. ئىمە ئەم بۇ ئەمەرپەھەممۇ ئەمە ملوانكە كە گوارە بازانانە بىيىننەن... كە لە جەستەتى ئەم شارە ناپازىن. ئەم بۇ گرد بىنهەو و شتىكى قازە بلىتىن و شتىكى قازە بکەين» (بىكەس، ۱۳۹۴ط: ۱۱۰-۱۱۶). لەم كۆپلەيەدا دىارە ھەممۇ شتەكان ھاتونونەتە قالبى مەرقەوە و بە وەرگەتنى كەسايىتى ئاستىيان بەز بۇتەوە و ئىستا بېرىار دەدىن و كۆدەبىنەوە و بەرامىھەر بە واقىع و ھەلکەوتى ژيان و ۋۇزگار بارودۇخە كە ھەلۆيىست دەگەن و پەرچەكدار لە خۇ پېشان دەدىن. لەم چەند دېرەدا و دەرەدەكەوى كە بەلېيان داوه و لە سەر وادەي دىاريکراودا دەچە دەرى. پەگەزىكى گىرىنى مەرقۇقانە كە لەم بەندەدا دەبىنرى، ناپەزايەتىيە ھەمبەر بە بارودۇخ. ئىنجا كۆبۈونەوە و دەربېرىنى بىرۇپاي نۇئى و ئەنجام دان و پىتكەتىنى كارىكى نۇئى كە ئامانجيانە، ھەممۇ تايىھەتمەندى و خەسلەتىكى مەرقۇقانەيە.

چىنى ياخىبۇو/رەپەرى: بۇ ئەمەدى كە شتى بىنگىان و ئىنتىزاعى دەپىتە خاودەن گىان و ھەستونەست و بەرزر لەھە، دەپىتە بېرىارەدە، شىعىرى «كۆبۈونەوە» لە دىوانى كازىيەدا نۇوسىنە يەكى باشە: «لە ئەمېرىكا خوارووودا/شەو بە دزىي مەخەرەوە/چەند سۇورى كۆبۈونەوە/بېرىارىان دا كە يەكتىرى بىزىنەوە! پەساپۇرتى بەرپاچەلى شار و گۇندى/ئەم دىنایە وەرگەنەوە وەختى ھەستان... لە ناكاودا/پاتەختە كان ھاتن دايائى/بەسەرياندا/بەريان نەدان/تا ھەر يەكىكىان كرد/بە دوان/بە سيان/كە بەريان دان/پەساپۇرتىان دا بە خوشىيان!» (بىكەس، ۱۳۹۴ج: ۴۴۷/۱: ۲۰۰۶) يە وەك شىعىرى «شىش» كە بۇ نازم حىكىمەت داناوه: «لە كارگە ئاستىگە رېكىدا/چەند شىشىكى مەچە كەستور/ھەستانە پيان/ھەپەشيان كرد لە گىرە و/مۇرپۇونەوە لە ئاڭداز/وەختى بىستىيان: ئەيانەوى لە پەنچەرەمى/كەتىخانەنى كەشىتىسىوە/بىانگۇرن/بىانگۇن/بەدەركەي زىندانى داخراو/لە سەر مانگى شىعىرى گىراو» (بىكەس، ۱۳۹۴ج: ۴۸۷/۱: ۲۰۰۶). لە شىعىرى «باو و ناباوا» دوو كەسايەتىپەدان ھەيە كە ياخى بۇونيان تىدايە؛ يە كەن درەختە و ئەمۇشىيان شىعىرىكە كە ياخى دەن دىزى «باو»: «درەختە كانى باخچە كە ئاسايى بۇون/ھەممۇ ھەر يەك قاچيان ھەبۇو/ھەمۇشىيان قىچ پاوهەستابۇن/تاقە درەختىكىان نەبىت/لەسەر دوو قاچ راوهە ستا بۇو/بەرەو خوارىش بۇ جۇگە كە دانەپۇيۇو/تا بە مشت ئاو بەخواتەوە!/وازم لە ھەممۇشىيان ھېتىا و پووم كرده ئەمە!» (بىكەس، ۱۳۹۴ج: ۱۴۶). كەسايەتىپەدان لەم دىمەنەدا چەند بىناتى بۇ دابىن كراوهە؛ درەختىك خاودەنى كەسايەتىيە كەيە؛ ئەم درەختە لە بارى ئاسايى و داب و نەرىتى باوي رەگەزى درەخت لاي داوه و سەرىپېچىي كەردووە؛ لە جىاتى يەك قاچ دوو قاچى ھەيە؛ بە جىنى ئەمەدى سەر بەرەو ئاسمان بگىرە، بەرەو خوار دانەپۇيۇو؛ بەرەو مشتى ھەيە و بەو مشتى ئاو دەخواتەوە. دىمەنەتى كە شاعير بۇ ئەم درەختە خولقاندۇوە، بەم جۆرەيە كە درەختى كەردىتە ئىنسانىك بە دوو پىن و دوو قاچ و دەست و گۈنگەتىش بە ئىرادەيە كەوە كە دىزى باو راوهەستاوه و لە حاالتى ئاسايى درەختى، ياخى بۇوە. شىعىرىكە ترىش ئاوايە: «ئەمەرپەپۇلى شىعەمەرپەپۇلى باو و چۇنى و تەنها ھەر يەكىكىان نەبىت/خۇيىندايەن/تەنها ھەر يەكىكىان نەبىت/خۇيى لە پۆلەكە دابىرى/جۇرى خۇيىنى باو نەيەوە!/بۇويە وەختى ھاتنەوە لام/پەر و بالى گشتىيان كرد/ھەممۇيان لە مالەكەم كەرە دەرى و بە تەنها ھەر ئەم كەيامن ھېتىشەوە/ناباوى كرد/بە خويىندەن و بە ھەلەپەرىن!» (بىكەس، ۱۳۹۴ج: ۱۴۸). ئەم شتەتى لېرى بۇوهە خاودەنى كەسايەتى، «شىعر» ھە؛ گىان و ھېزى فېرىنى پىن بەخشراوه. بەلام شاعير لەو تېپەرىيە كە دىمەنەنىكى ئاسايى بخولقىنى و بەس؛ بەلگۇو دەيىننەن چەقى ھونەرە كە لە وەيدىاھە كە «شىعر» ھە كە وەك سۇۋەزى كەسايەتىپەدرەو، بۇتە خاودەنى بىرۇرا و بەرپەرچەداھەوە؛ دىزى باو دەفرى، سەرىپېچىي دەك كە باو، لە ئىپ چوارچەو و ياسا و پىتساكانى باو دەرەچىت. خالىكى تر لەم شىعە دە ئەمەدى كە شاعير بۇ كە گىرپەھە كە لايەنگىرە كە لايەنگىرە كە جۆرە درەخت و شىعەر ياخىبۇانە دەك. تەنائەت كەتىپ و پەراوېش ياخى دەبن: «لە ئەرشىقىي نامەخانەدى دوا قەيسەرە/ھەرجى كىتىبە ھەزار و بىرسىيە كان بۇون، كەوتىنە جوولە/لە رېزى خويان ياخى بۇون/ھەممۇ چۈونە يەك پىزىمەدە/گەد بۇونەوە و پەرەيە سەريان نا بە سەرە/يەكتەرە بۇومەلەرەزىي خۆپىشاندان/سەر و ژىرى نامەخانەدى گەورە لەرزاڭ/كىتىي كورتەبەي سەر پۇوتاوهى پېشەوايان/ھەلېپەرە سەر قەللى دوشكان/ھاوارى كەدە/داوا ئەكەين بەخىرىنە پېش چاوى كىلگە و پۇوبارەكان...» (بىكەس، ۱۳۹۴ج: ۲۰۰۶). بەم شىوپەيە لە ئەرشىقەخانە كەدا ھەممۇ كىتىبە كان دواي يەك گەتن و دىارى كەدنى پېشەوا و رېپەر بۇ خويان ياخى دەبن و شۇرۇشىك پىتكەنن و بە خۆپىشاندان داواكارىي خويان دەرەبىن.

چینی دژه زوّلم و ستهم: شته که لیره ده بیتیه مرۆڤیکی عاقل و به توانا که ناچیته ژبر باری زوّلم و زورداری و سه رهاده دا له ده ستوری سولتان و حاکم و خوی دهرباز ده کات: «قەلەمی سه ری خوی هەنگرت/ھیچ ده فتھر و هیچ کاغه زی/نەیانزانی/پرووی له کوق کرد/چونکه ویستیان داییدن و/خوی به خوی بکوژینه و/چونکه ویستیان وا بنووستی/ھەر بە تەنیا سولتانە کان/بیخوینه و» (بیکەس، ۲۰۰۶: ۱/ ۴۵۶).

ھەست بە دژایه تى کردنی زوّلم و زور و ستهم و نازهه اویی لە پیننوو سیکدا ئەوندە توند و تیزانە و بەھیز بوروو کە دژی سولتان بوجەستەتە و سه ره فەرمان با بدات و خوی ئاواره بکات و ئاوارهیی و دهربەدھرى بە لایه و خوشتەر و ئەو بەرتر بەن له هیمنی و ژیردەستەتیی و چەپۆکە سه ره.

چینی عاشق و ماشق: شتی بیگیان (فیزیکی/واتایی) لە شیعری شیرکودا، بەشی خوی لە گیان و هەستونەست و هەر دەگری، ئەویش نه بە بار و دۆخیکی ئاساییدا، بە لکوو تاییە تەنەندییە کی زور دیار بە خوی بە دەبینی، ده بیتیه عاشق و ھەر بە هەمان ده ستوری یەکیکی تر ده بیتیه ماشق؛ وەک میزۇوو/عاشق و بەرد/ماشق کە یەکەمیان واتایی و دووھەمیان ماددیه: «بە تیری عەشقی بەرد/زامداره و گرفتار ئەم میزۇووو عاشقەم» (بیکەس، ۲۰۰۶: ۳/ ۵۰۲). ئەم عەشقە لە دهوری چاو دەگەری و لە وجودوی بەر دادا ئەو شتەتی کە زۆر تر گری ئەوینی خستوتە گیانی میزۇووو، چاویه تى: «بۆ خاتری چاوا بەرد/ھەموو جار خۆرنشین ئەپوشن» (بیکەس، ۲۰۰۶: ۳/ ۵۰۲). لە شیعری شیرکودا ئەوین و دلداری لە ناخى ھەموو شتیکدا بە دی دەگری، لە دیار دەگل سروشیدا؛ وەک ئاوا، دار، بەرد، پوبار، چۆم، کانى، كەز و كە، ھەور، تەنانەت لە چەمک و دیار دەگل واتاییدا وەک میزۇوو. لە شیعری شیرکودا عەشق خوی زور جار دیتە مەیدان و دهور دەگىری: «دەرچۈونم بۆ نە بۇو/عەشقى تو دەورى دام/من ئىستا لە نە خشەتى تازەتا دوورگە تۆم» (بیکەس، ۴۸۹/ ۳: ۲۰۰۶). عەشق جەستە ھەيە و شتیک لە بەردە، وەک ئەوەي کە شاعیر گازنەدە دەکا: «ئەم رۆحى ویل!/تەنگە بە پەر عەشقى تو ئەم نە خشانە!» (بیکەس، ۰۰۷/ ۳: ۲۰۰۶). عەشق سەردار و سالارە، رېبەر و فەرماندەرە، تەنانەت زەممەنىش لە ژىپەتىپەنی چۈشەتى زىيىنە/و/کات لە ژىپەتىپەنی چۈشەتى زىيىنە/و/کات (بیکەس، ۶: ۵۷۹/ ۳: ۲۰۰۶).

چینی ھەزار و بىئەنوا: لىرەدا دیار دەيدەیە کى ئىچگار ھونەرمەندانە دەبىنین، بە وەيدا کە شیرکو گەلىك جار ھاتوو و جەستە ھە خشىوە بە چەمکىکى واتایی و گیانى كردوتە بەرى. بە وىنەی برسىتى: «بە دار خورماي بەر ژورورە كەم/و/ت: کە سەرنجىم بە سەرتا/ھەنگەریت/ ئەبرۇوشىت و زامدار ئەبىنی! پەلىكى ھاتە ژورورە/- لە پىشدا يەكەم دار خورماش/وھە چىنار/بەزىن و بالىسى ساف و لۇوس بۇو/بەلەم پۇزىنى/برىسىتىسى كى كۆچەرىيى/گەنچ گەنچ/كە ھېشۈرى گەبىيى بىنى/باۋەشى زېرى بىندا كەندا ھاتە خوار/ھەممو بەزىنى دار خورماكەيش/بۇو بە پلهى گری گری» (بیکەس، ۵۶۰/ ۱: ۲۰۰۶). يە وەك چۆن بیکەسی ئەكانە گیاندارىكى و مەردن و ڈيان و ھەزارىيە كەپىشان دەدا: «بیکەسیم پووت نىيە/تا ئەمرى پوشاكى پەشتانى بەش ئەكاك» (بیکەس، ۳/ ۵۴۴: ۲۰۰۶). ھەر بەو شىوهش تىنۇيىتى و تەننەيىش گیاندارن و ڈيان و مەرگ تە جىروبە دەكەن.

چینی دۆست و برا دەر: لە شیعری شیرکودا دەبىنین تەنی بیگیان و ماك و دیار دەھىنی سروشى دەبن بە گیاندار و ماناي دۆستىيەتى و پۇزىندى سۇزدارانە و عاتىقى پىكى دەھىنن؛ وەك چۆن دەبىنین ھەور و شەپۇل و دار بەرروو و گابەرد بە عەينى وەك دۆستى گیانى دىن و سەرى لىدەدەن: «ھەموو جار بى ئەوەي لە دەرگاى و شەم بات/ھەورى دى/خوی ئەكا بە ژورورما و گۇرانىي قىتەرم بۆ دىنن. بى ژوان بە بىن پرس/ھەموو پۇزى/شەپۇلنى، دووان و سیان، بە ھەگبەي پىشنىڭ و گۆلەوە/ئەگەنە سېيەرى بەرگىلەم/ناپۇن تا من نەكەن بە مېرىگى ھۆنزاوە و/ بە گۆمى ئەستىرىدەش، ژورورە كەم/دار بەرروو دى بۆ لام/پەگى خوی ئەبەستن بە پەگى قاچمەوە/اگابەرد دى و ھېزى خوی/بە دىاري بۆ پاشتم ئەھىنەن. لووتکە دى و بالاى خوی/ئەخاتە سەر بالام/ئاشنامن فرمىسەكە پايىزەي غەربىان/ئەوانىش بە سوارى كىزبای/تىواران دىن بۆ لام» (بیکەس، ۳/ ۵۰۷-۸/ ۲۰۰۶).

جارى واش ھەيە شاعير لە شیعرىكىدا كۆمەلگا يەك دەخولقىتىن كە ھەموو ئەندامانى شت و مەك و كەرسە و جەمادن و كەچى ھەموو خاوهنى كەسايەتىن. نۇموونە راستەقىنە و زور بەھېزى ئەم جۆرە كەسايەتىيەنە كىتىپ ملوانىكەيە. لەم دیوانەدا كە سەرتاپاى لە كەش و ھەوايە كى خوازەيدا و لە خەيالىكى بە رىندا سەير دەك، كەزەسە كانى ئارا ياشتى زىلان زۆزتىن كەسايەتىيە كائين. ھەموو بە ناوى تايىتە خۆيانە و دەور دەگىرەن و ھەر يەك خاوهنى كەسايەتى خۆيە. ھەر يەك كارىك و قىسىيەك و كەرددە كە مەرەنە كە مەرەنە دەنۇتىن. گەرچى كىتىپ ملوانكە خوی شياوه بە شىوهى تايىتە لىكۆلىنە و توپۇزىنە و ھەيە كى شىكارانە بۆ تەرخان بىكى، بەلەم لەم توپۇزىنە و ھەيەدا چەند خالىكى پۇزۇندىدار و كەرىنگ دەخەينە رۇو. لە دىمەن ئەتكىدا ملوانكە كە ئاوا دەگىرەتەنە كە ھەشەنە كەپكۆلە كە وتنى:

بە راستى ئىمە لە بەر ئەوەي لەم ژورورە گەرم و گۇر و خۇشەدا ئەزىن، ئاگامان لە شت و مەك مەيىنە ھەزار و برسىيە كەن دەرەوەي خۇمان و ئەم شارە نىيە. چۆن ئەزىن! ئىمە ئەگر بە پىتى خۆمان نە گەرپىن و بە چاوى خۆمان نەيانييىن ناتوانىن لەو دەنیا بىگەين! منىش پرسىم: راستە... بەلەم ئىمە ئەتowanىن چىيىكەين؟ قەلەمە كە دوو جار لە سەر يەك پۇزمى و لە دوايىدا وتنى: ئىنجا چى لە وە ئاسانتە، ئەتowanىن ھەموو شەھوئى دواي ئەوەي خانم نۇوست، ھەر جارە و يەكىمان بە درزى پەنجه رەكەدا بىت يان بە بن درگا كەدا بىچىنە دەرەوە» (بیکەس، ۱۳۹۴ ط: ۵۰-۵۵).

گیپردهوه ملوانکهيه. ئەو خۆي وەك مرۆقىك چەندەنەدا ھەلسوكەوت و بەرنامه کان دەگىرىتەوه. ئەلبەت ئەم دەدورە لە سەرتاسەرى كىتىبەكەدا دەيگىپى. هەموو ئەندامانى ئەم دەقە گىپرانەوهىيە لە ئىمكارنى قسە كىدن و وتن بەھەرەورەن. بەلام جىگە لەوە لەم پارچەيەدا بۇ وېئە تاۋىنەكە كاتى قىسان دەكە چەندەنەدا گىرىنگ ھەستى دەستە و تاقم و جەماوەر بۇون و يەكانگىزى: زيان بىردىنە سەر لە شويىتىكى خوشدا! خاونە ئاكايى و ھەستونەست و شوعۇر بۇون؛ گەپان بە پىش خۆ و بىنین بە چاواي خۆ و تىيگەيىشتن. لە دۆخى قەلەمەكە شدا كارى پېمىن كە گەرجى تايىبەتىي مەرۆق نىيە، بەلام كە لە ناو قسە كەردىنەكەدا ھاتۇوە چەند بارى واتادار دەگەيەن.

### شىوازى ترى كەسايەتىيەن

لە شىعرى شىركۆ بىيىكە سدا جار جار دەبىنин راستە خۆ چەمك، واتا، دياردەيەكى ماددى بە كەسەدە كا و بە هيئانى تاريف و تايىبەتمەندىيەكى، لە ئاست و قالبىكى تردا دەيخلوقىتىتەوه: «سياسەت: گايىكى بەلەسى چاوا سۈورى تۈورە بۇو/ھەمومان، مىزۈومان بە كەللە و قۇچىھە و بەستبوو» (بىيىكەس، ۲۰۰۶: ۵۱۲/۳). يە وەك ئەوەي دەلىن: «ئەم خۆشە ويستە بىزەم، ئاتاقانەيە و نە جووتى ھەيە و نە جىڭر/بە تاقى تەندا خۆيەتى./دایكەم و تى: من لە جىاتى، وتم: نابى، من دلىيام ماوه، ئەوەندەي بۇ گەراوم/شويىن لىيم و ھەرس بۇوە. ئەوەندەي پرسىارم كردووه، وەلام/ خۆيىم لى ئەشارىتەوه» (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۱۴۸). لەم بەندەدا سىاسەتلىي تازەدا خۇلقاندۇتەوه. شويىن بۇتە مەرۆقىك بە تايىبەتمەندىي و بىرسىيەوه. وەللاپىش ھاتۇنە پىزى مەرۆق بە تايىبەتمەندىي خۇشاردەنەوه. ھەروھا جارى واش ھەيە ئەم شىوازە لە كەسايەتىيەن بە ناو دانان و بەسەردا بېرىن پېكىدىت؛ وەك ئەوەي دەلىن: «وللت ژىتىكى دامامى شېرەزى قىز خۇلاؤبى/ھەميشە ھەلترۇوشىكاوى بەردەم چادرى ئۆرددووغا بۇو» (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۲۱۷).

يا وەك ئەوەي كە چەمكىك لە بارى ئاسايى خۆي بىرازى و سيفاتى شىتكى ترى ماددى با واتايى پېيدىرى، ئەميش جۆرىيەكى ترى ئاشنايەتى- سپىيە: وەك ئەوەي كە وتوویە: «خۆم بىنیم بەم ھەردوو چاوانە/لە دەفەي شانيان قولە قولل ئازادى ھەلەقولى» (بىيىكەس، ۲۰۰۶: ۵۱۶/۳). ئازادى كە چەمكىكى واتايىه كراوه بە ئاو، جموجوول و بىزافى پېدرابە، ھەلقلانى و بىپالخراوه كە تايىتەت بە ئاو يَا تراوه.

### كەسايەتىدان بە شويىن-كات

280

زۆرىك لە شويىنەكان، وەك ناوى شار و دى و كەز و كېي و شاخوداخ و ropyوبار و كانى و ھەرورەها زۆرىك لە كاتەكان، وەك شەو، رۆز، مانگ، سال، چىك، دەقىقە و ... لە شىعرى شىركۆدا كەسايەتىيان پېدرابە و لە دەدورى ئىيىساتىنەكدا ھاتۇنەتە مەيدان و خۇيان نواندۇوە. بۇ نمۇونە: «بالله كايىتى شۆخىكى/ھېننە جوان بۇو، ھېننە جوان بۇو/كاتى شىعەر لە بەردىميا رائىھەستا/وھ كەنگەشەھە ناو گۆم/چۈن لال ئەبن و چۈن ئەوق ئەبن/ئەويش ھەردا» (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۱۴۸). لەم بەندەدا «بالله كايىتى» كراوه بە كىزىكى شۆخ و شەنگ و لەبار و زۆر جوان (بە دوو جار ھانى عىبارەتى ھېننە جوان بۇو ئەم تەكىدە نىشان دراوه؟) ھەرورەها لەلواشە و پېشىۋېتىراوېش كە مانگەشەھە، شاعير ئەويشى مەرۆقاندۇوە و لال و ئەمۇق بۇونى بۇ ھېننەو كە ديارە ھەر مەرۆق لال دەبى. ھەرورەها بالله كايىتى دەدورى كەنگىكى خوازېنلىكىراو دەگىپى و حەتتا بە كچى يەزدان دەناسىرى (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۱۴). يەكى لەو شويىنەتى كە شاعير كەلېك دىمەنلىي جوانىناسانەي بۇ تەرخان كردووه و زۆر جاران مەرۆقاندۇوە، ھەلەبجەيە. لە دەربەندى بېپولەدا ھەلەبجە كەسايەتىيە كى پېرەنگ و تامۇنۇنە دەدورى كەنگىكى خوازېنلىكىراو دەگىپى و حەتتا بە كچى (بىيىكەس، ۲۰۰۶: ۵۳۷/۳: ۲۰۰۶). ھەلەبجە ھەلەنچى دەپەنچى و تامۇنۇنە دەدورى كەنگىكى خوازېنلىكىراو دەگىپى و ھەلەبجە سەر شانى خۆي» (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۶۰). لە شويىنەكى تردا سيفەتى بۇورانەوهى دانابە بۇ گۆرەپان (بىيىكەس، ۹۳: ۱۳۹۴). ھەنگورد بە يەكجار ھەم دەبىنە كچىك و داواكارى بۇ ھەميش دەبىتە باوکى بۇوك و دەستى ماج دەكىرى (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۱۴). ستوکھۆلمىش لەو شويىنەتى كە لە شىعرى شىركۆدا كەسايەتىي وەرگەتەنە دەپەنچى و تامۇنۇنە دەدورى كەنگىكى خوازېنلىكىراو دەگىپى و ھەلەبجە سەر شانى خۆي» (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۶۰). لە شويىنەكى تردا سيفەتى بۇورانەوهى دانابە بۇ گۆرەپان (بىيىكەس، ۹۳: ۱۳۹۴). ھەنگورد بە يەكجار ھەم دەبىنە كچىك و داواكارى بۇ ھەميش دەبىتە باوکى بۇوك و دەستى ماج دەكىرى (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۱۴). ستوکھۆلمىش لەو شويىنەتى كە باي بەفرا كۈور بۇوە و ئەمەويش وەك من ھەلەلەر زۆرى (بىيىكەس، ۱۳۹۴: ۱۶۰/۵: ۲۰۰۶). لەم دىمەنەدا شاعير بە ھېزى خەيالى خۆي شارى ستوکھۆلمى سەرەتا شوبەندۇوە بە خۆيەوه و ھەردوو لە سەرمادا دەلەرزن و بۇ ئەو شارە كە ئىيىستا ئىتەر ھاتۆتە ئاستى مەرۆقىكى وھ كۈوش شىركۆ بىيىكەسەوه، دەست و پەنجە و پىن و گىرفان دانابە و شەختەي باكۈرۈ كارىتىكى بۇ كەنگەشەھە ئەمەويش وەك دەستى ئاخىنەتە گىرفانىيەوه و پەنجەجەي پىنى لەبەر سەرما سېر و سىست بۇون و بە گشتى ھەيكل خۆي كۆم كەردىۋە تا بەلکو توپىزىك لە تىزى و بېشى سەرما كەمتر ھەست پىن بىكت و بەو حالەشەوه دەبىنەن كە ئەمەويش لە گەل شاعيردا ھەر دەلەر زۆرى.

شىركۆ بىيىكەس ديارە شىعرى نىشتمانىي ئىيىستامانىي ئىيجىكار زۆرە. ئاۋىر دانەوهى لە نىشتمان چەند قاتى شاعىغان و ئەدىيانى تەرە و وەك شاعير ئىكى نىشتمانىي و نىشتمانپەرور دەناسىرى. گەلېك بە بالا ئىشتماندا شىعرى ھۆنۈدۈتەوه و تەھوسيفى كردووه و لە پىاھەلدا و لاۋاندەوه و وتنەوهى مىزۈووی نىشتمان و باسکىردىن لە كۆست و كارەسات و خۆشى و ناخۆشىيەكانى، ئەوندە ھۆنراوه و بەستە و ھەلەبستى دانابە، رەنگە

کەم شاعیر و بىرمەند و نووسەر ھىتىدەي شىركۆ بەرھەمى لە باھەتەيان ھەبن. لە كۆمەلە شىعرى ئىستا كچىك نىشتمانىدا دىمەنلىكى لە نىشتمان خولقاندووھە كە بەكتى لە رەھەندە كانى ئەم دىمەنە كەسايەتىدان بە نىشتمانە: «لەسەر جادەسى سەھۆلە كە راوهەستام/لە پېرىكىدا نىشتمان بە خۆى و كلاوى ئالاڭىھە يەدە بە خۆى و بىكلامى پىش و سەمپىل و ئارىپى يەدە بە خۆى و مەدالىاي پەر ھەزەشەي/سەر سەنگىھە يەدە، بە خۆى و شەمشىرە كەي ئەي رەقىيەدە بە پەرى كىف و مەغۇرۇرى تاوسىيەدە، كۆمەلنى/چەكدارى چاوزەق، لە پېشىيەدە سەنگەرپەريو، دىتە لام و بە دەوو پەنجهە تەۋەقىيە كەم لە كەل ئەكەت و دەست ئەكا بە/ئازارىفي فەخەر لىنيشتۇوو باخەلىا و سيدى/سروودىتكى تازەي ئەم رۆزگارەدە ئەدانى/ئىنجا زەردە خەنەي مىسىن/دەستكەر ئەيگىرى وەك پېتم بىن: من نىشتمانى تاقانەي ھەممو دەنیام/ئەوسا ئەرپوا و بە جىم دىلىنى!» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۴۰-۴۱). لەم دەقەدا دەبىينىن نىشتمان لە قواوارە و ھەيكل و ھەيەتى مەرۆقى/پياوەتكىدا دەرەدە كەوەي، بەم سيمایەدە: ئالاڭىھە كە جىتى كلاۋو؛ بە پىش و سەمپىلەدە؛ شەمشىرە بە دەستەدە وەيە؛ بادىگارىدا ياخود پاسەوان و پارىزەرى ھەيە؛ پىن و دەستى ھەيە؛ تەۋەقە دەكى؛ شانازى دەكى؛ دەمارەرەزە؛ گىرفانى ھەيە؛ دەست دەكى بە گىرفانىدا؛ سيدى پېتە كە ھە گىرفانى دەرىدىتى و ئەيدا بە كەسيكى تر؛ ئىنجا زەردە خەنەدەكى؛ و لە كوتايسىدا قاسەيەك دەكەت و دەرپوا. ئەم ھەممو تايىھەتمەندىيە مەرۆقانە/پياوانەيە لەم دىمەنەدا كە شاعير خولقاندووھە تى، دراوهەتپاڭ نىشتمان. شىركۆ بە ھەممو بارىتكىدا نىشتمانى وەرسوورپارەندووھە و بە چەندان شىپوھ نۇاندووھە تى، بۇ نەمۇنە جارىك بە كارىكەر و گەسكىنەدەر دانادە: «نىشتمانىش... ھەممو رۆزى لە بەرەدەمى مىژۇوھە كى/ بىدەرەستىدا، گىڭم ئەدا» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۶).

بۇ نەمۇنەي كەسايەتىدان بە كاتىش دەتوانىن ئامازە بەمانە بکەين: «شە باۋىشكى دا و بە دوايدا/منىش ھەرپوا» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۱۸). سيفەتى باۋىشكى دان بەس لە مەرۆفەدا بەدى دەكىرى. جارىكى تر پاپىز وەك دايىكى مەرۆتىك دەناسرى (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۲۲). ئاوهەنلەنلىكى وەرس و بىزار بۇون لەوانەيە كە تايىھەت بە مەرۆقەن و دەبىينىن لە ھەۋاتانەيە كى شاعيرانە و خەيالاۋىدا دراونەتە پال كات: «لەم رۆزئىمەرىھە ئىستەدە/ سەعات لە پۇزى/ھەفتە لە مانگ/مانگىش لە سال وەرس بۇوه!» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۱-۱۲).

### كەسايەتىدان بە رووهەك

«دارستان دارى خۆى/بە پەنگ كەد/گۈل ئەكوشت» (بىكەس، ۲۰۰۶: ۵۰۱). نەمۇنەيە كى تر دارخورماي بەر ژۇورە كەيە كە شۇيىنى تايىھەتى خۆى داوهەتەوە (پروانەنە ژىر سەردىرىپى «بىناتى و تووپىز لە كەسايەتىپەدانى شىركۆ بىكەس» دا). سوورەچتار و شۆپەبى لە شىعرىكىدا بە شىپوھە بىرسىار و وەلەم - ئەلبەت لە كەل كەودا - كۆ كراونەتەوە: «سوورەچنارىك ئەپېرسى:/ئەم شۆپەبىيە لە بەر چى سەرەي خستۇنە ناو كۆشى/ئەو چەمەمە و ھەلېنپەرى؟/كەۋىك و تى: /ھېيشتا قىت بۇو/ھەممو جارى بازۇپەيەك/ئەھات و ئەچووھ سەر سەرەي/بە چەپە ھەوالى دنیا ئەوبەر چەمە/پېتەگەيان/ئىۋارەيەك بازۇپەيەك/مەزدەھى پېتۇو/كە نىشتهەدە وَاشەيە كە خۆى چەپەكىشا/كەوتە خوارى/ شۆپەبى بۇي نۇوشتايەدە/دەرىپەتنى/دەستى نەگەيشتىن... نۇقۇم بۇو/ئىتىر لەو ساوه ئەم سەرەي/وا لە نىتۇ كۆشى چەمدەيە/و بۇي ئەگەرى!» (بىكەس، ۲۰۰۶: ۵۷۰-۵۷۹). وەك دەبىينىن لەم دىمەنە ناوازەيەدا ھەممو ئەندامەكان كەسايەتى و شوناسى ئىنسانانەيان وەرگەتۈوھە. لە ھەستونەست و لە شۆرپۇونە و دانەوين بە مەبەستى كارىك و لە مەزدەدان و مەزدەھەرگەتن و لە گەپان بە دواي كەسى/شتىكىدا و چاوهەرپۇان بۇون، ھەممو خەسلەتى مەرۆقانەيە و پىيان دراوهە.

281

### كەسايەتىدان بە دەنگ و رەنگ

بىزارى سيفەتىكى تايىھەتى مەرۆقە، دراوهەتە پال دەنگ و رەنگ: «من لە خۆمدا، لە ناو خۆمدا/رەنگم لە دەنگم بىزارە و دەنگم لە بۇنم بىزارە» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۳). «شىن خۆى ئەكەد بە ناو سەۋزا و/زەرد خۆى ئەكەد بە ناو ئالىدا و سوور ئەچووھ ناو سېپىھە و/كال و تۆخىش نىزى و مەن بۇون بە ناو يە كەدا ئەشكانەدە» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۴-۱۵). هەلبەت لېرە ئەم رەنگانە لە قۆناغىكى خوارتى كەسايەتىپەداندا نىشان دراون و دەوريان گىزراوھە. بەس بۇونەتە كىاندار، بەلەم رەنگى پەش لە پەلەيە كى سەرتىدا نۇپەنداوە: «بۇ ئەھوھى رەش/دلى لە خۆى دانەمەتى/ بەفر دەلخۇشى دايەوە» (بىكەس، ۱۳۹۴: ۱۲۱). چونكى خەسلەتى «دلى لە خۆ دامان» چىتەر سيفەتىكى ئىنسانانەيە و بەس مەرۆق دەتوانى و بۇي ھەيە و دەكىرى دلى لە خۆتى دابىتىن.

### دەورى كەسايەتىپەدان لە ناوى بەرھەم و شىعرە كانى شىركۆ بىكەسدا

ئەم دىارەدە ھەر ئەو نىيە كە لە شىعرە كانى شىركۆدا دىيار بىن و رەنگى دايىتەوە: بەلكوو دەبىينى ناوى ھەندى لە دىيوانەكان و كۆمەلە شىعرە كانى كەسايەتىيان تىدايە. شىركۆ بىكەس خۆى گوتۇويھە جارى وا ھەيە ناوى بەرھەم ياشىعر لە دېپىتكى قەسىدەيە كەوە دىت، جارى

واش ههیه که ناویشان هیچ پیوهندیه کی به ناوهروکی برهه م یا شیعره که و نیه (ههینی، ۲۰۰۸: ۲۷۹). لەم بەشەدا چەند نموونه یه ک لهوانه دەخهینه ژیر تیشكى لیتکوئینه وە. دەفتەری گورانییە غەمگینه کان؛ يادداشتى ماکەویکى رەشپوش؛ بیوه بە خۆشە ویستیم ئەسپیرن؛ ئەم سى دانه ناوی کۆمەلە شیعرن. ناوی شیعره کان نموونه یان زۆرتە، وەک: لە کۆمەلە شیعری تریفەی ھەلبەست؛ سى ھەلبەست تینوو. لە کۆمەلە شیعری من تینویتیم بە گەئەشکىدا: برووسکەی سروودیکى زامدار. لە کۆمەلە شیعری کازیووەد؛ بۆ شانۇگەرییە کى شۆخ، برسیتیم بە کۆچەر. لە کۆمەلە شیعری دەفتەری گورانییە غەمگینه کاندا: پۆلە ئاوازیکى کۆچکردوو، فورات و چەند گورانییە کى غەمگین. لە کۆمەلە شیعری ئاویتە بچکۆلە کاندا: لە بىرەوەرییە کان دارمیتکەوە. لە کۆمەلە شیعری میزگى زام میزگى قوشەم. لە کۆمەلە شیعری خۆم ئە وەختەی بالندهم: مردن بە جلکى سەربازییە وە. لە کۆمەلە شیعری تیوو بە خۆشە ویستیم ئەسپیرن: ھەلەبجە ئەچى بۆ بغدا، بولبولىکى نەقاش، لىگەرپەن... ئاچىزىن... نموونە ئە و ناوەنەن (ناوی بەرھەم با ناوی شیعره کان) کە رەگەزى کەسايەتپېدانىان تىدا بە دیدە كرت.

### بنیاتى وتۈۋىز لە كەسايەتپېدانى شىركە بىكەسدا

كاتى شاعير بە وزە بىر و خەيال، كەسايەتپەدا بە شتن/بىتگىان/گىاندارى زۆر جار دەبىنин ئەيانكى بە دوان يان چەند دانه و توپۇزىكىان لە تىواندا رېكىدە خات. لە ئاقارى زمان و وېزەدا تەندا ئەوهى كە شىاوى بازىگىردن بى، بازىگەرلىكى؛ واتە گىاندارى خاوهن ھزر، كە مروققە. بەشى لەم باڭگىشتانە دەگەل رى و شۇپىنگەلى شاعيرانەدا كە خواستى دركاوى پېنەلین، يەك دەگەنەوە، چونكا بىناتى ھەردوو لە سەر ئىنسانشىپەيى و گىاندار خوازىيە (كرازى، ۱۳۹۳: ۲۳۰). وتۇۋىزە كان جار جار بە يارمەتى وشەي وتم/وتى يَا يەكتى لە ھاۋەرگەزەكانى (ئەلنى و...)، جار - جارىش بە شۆھى پاستە و خۆ و شانۇرى رېك دە خىرى. وەك وتۇۋىزى نیوان حاجى لە قەلقى و پەپووسلىيەمانە: «لە دوورپانى ھەوايە كە حاجى لە قەلقىكى و پەپووسلىيەمانەكە يەك بە يەكتى گەيشتن. ئەويان/بەرەو باشۇر و ئەميان بەرەو باكىور ئەرپەيىشتن/پەپووسلىيەمانەكە كە لە حاجى لە قەلقەقى پەپووسلىيەمانەكە كە پىنى وت: حاجى! حەجي/يىمە ئىستا لە كانىعاشقانە و لە گەدى گولانە و لە شارەكەي ھەلەبجە يە!» (بىتكەس، ۱۳۹۴: ۹۶). يَا وەك شىعىرى پىرس لە کۆمەلە شیعرى کازیووەد؛ «بە داسىم وت: لە بەر چى وا كۆم بۇويتە وە؟ وتى: لە درپەنەدا وام لىيەت. كە بە ھەلەكۆكىشم وت: تۆ بۆچى و تەمەن نىكىرى؟ وتى: بۆچى لە دواي بە فەر ڙيان تامى تىا ئەمەن ؟ كە بە تاقتاقكەرەيىش وت: تۆ بۆ ئانۇي؟ وتى: نەوەك دلدارە كان/وابزانن تىشكىيان ناگرم! بە دوا ھۆنراوهى خۆيىش وت: ئەي تو بۆچى ئاوا كېت تىبەرپۇوه؟ وتى: نەبادا قەفتە سىش/وابزانن ھەزارە كان بىتھاودەمن!» (بىتكەس، ۲۰۰۶: ۵۶۱/۱).

282

بۇ نموونە یە راستە و خۆ و شانۇرى، وتۇۋىزى شاعير و دارخورماي بەر ژۇورەكەي زۆر ھېزىاھى كە پېشتر لېكمان دايەوە (بىرانە سەردېپىرى كەسايەتپېدان لە قالبى چىنە ئاكىن كۆمەلگەدا: چىن ھەزار و بىئەنوا). لەم وتۇۋىزەدا چىدى ژەپۇتووه دارخورما وای وت يَا وەلامى دايەوە، بەلکوو دواي ھەتىانى راستە شۇرقەيى (پەلىكى ھانە ژۇورەوە)، بە ھەتىكى پېشانى داوه كە ئەمە قىسى و بۆچۈون يان وەرامى دارخورماكە يە.

جارى واش هەيە كە ئىمە وەلەمەك بۆ وتنەكە ئابىنин و ئابىسىن، بەلکوو بە تەنبا وتنەكە دەركە و تۈوه و ئە و لايەنە كە ئىچى تىبىنى و دواندىن و بىئەدە كە نەدراندووە. بۆيە دەتوانىن ئەم تاقىمە ھەر لە ژىر سەردېپىر و تىندا دىيارى بکەين و بىگونجىتىن. لەم بوارەدا تاۋىش لەوانەيە كە دەگەل ھەندى دىارىدە تىرى سروشىدا كە توپووەت وتن و قىسە كەردن و لە چوارچىتە كەسايەتپېدانىتىكى ھونەرمەندانەدا چەندىن فاكىتىرى مروققانە يان بە سەردا باراوه: «ئاو وتى: مەگەر من كەم شەرم لە سەر تۆ كەدۇوە ئەي سېئۇ بىۋەفا! / او ئىستە خەريكى بە قىسى بىنگانە/ھەر ھەموو پابوردووم لە بىر كەي! / مەل وتى: مەگەر من لە بەر تۆ/ئاسمانم تەي نە كەد؟ كەم فېيم بە شۇپىتا/ئەي جووتى بىۋەفا! / او ئىستە خەريكى بە قىسى باخىكى دوزىمان/ھەر ھەموو تەنبا تەنگىرام؟ / او ئىستە خەريكى بە قىسى ياد كەي/ئەي وشە بىۋەفا!» (بىتكەس، ۱۳۹۴: ۵۲-۵۱). لەم دىمەنەدا يەك ماجى سەرەپۆى بەھارى/ھەر ھەموو تەنبا تەنگىرام؟ / او ئىستە خەريكى بە قىسى ياد كەي/ئەي وشە بىۋەفا! (بىتكەس، ۱۳۹۴: ۵۲-۵۱). لەم دىمەنەدا ھەموو ياخىزى ھەر ھەپۆرەتىرى شەتكان سروشى-ماددىن و ھەنزاونەتە رېزى مروقق: ئاو، سېيو، با، مەل/جووته كەي، باخ. بىچگە لە مانە، خەم، بزە، نەشەنە، ماج و شە دىيارەد و چەمكى واتايىن. ئىنجا بۆ ھەر يەك لە مانە كە ھاتۇونەتە پېزى مروقق و كەسايەتپىان پېتە خىراوە، تايىەتمەندىيەك دازداوە كە نىشاندەر و نوئىنەرى كەسايەتپىيە كە يانە: بۆ ئاو، وتن، شەپەرگەن و لايەنگىرگەن؛ بۆ سېيو بىۋەفایى كە تايىەتمەندىيەك سۆزدارانە و عاتىيفى و پېتىنە؛ بۆ با بىتكانەيى؛ بۆ مەل وتن؛ بۆ جووته كەي بىۋەفایى و لە يادگەردن؛ بۆ باخ دووزمانى كە سېفەتىكى نەرىنى و تايىەت بە مروقق. لە واتايىە كائىش ھەر يەك خەسلەتىكىان بۆ ھاتۇوه: بۆ خەم وتن و گريان؛ بۆ بزە درۆزنى؛ بۆ نەشە تەمەن نىكىرىتى بەلام تايىەت بە مروقق نىيە و لىرە بە نىشانە بۆ مروقق تەرخان كراوهە؛ بۆ ماج سەرەپۆى كە زۆرتر خەسلەتىكى ئىنسانە؛ بۆ وشە بىۋەفایى و لە يادگەردن.

دیمه‌تیکی تر هه ر لهوینه ئامه‌ی پیشوه به نموونه لیکده‌هینه‌وه: «چاوه تومنیشانی شیعری دا/وتی: ئاخ ئهبوایه ئه و له ناو مندا بن/ دهه می تومنیشانی باخی دا/وتی: ئاخ ئهبوایه ئه و له ناو به رزایی چلدا بن/په نجه کامن نیشانی تاری دا/وتی: ئاخ ئهبوایه ئه و له سه رژیکانی/دلم بئ/گه ردنتم نیشانی زیه کدا/وتی: ئاخ ئهبوایه قه‌لبه‌زهی ده نگم بن/ئه و دهه مهی بالات و هه رهه مو جوانیتم/به رووتی/نیشانی دواهه دا/وتی: ئاخ خودایه! با مردن بمیرت و ئه و نه مرئی» (بیکه‌س، ۱۳۹۶ج: ۳۵). به کورتی ده کری بیکن دوو کومه‌له شیعری تیستا چیک نیشنمانمه و کتیبی ملوانکه سه‌رتاپا سیخناخن له دیمه‌نی قسه کردن و وتنی تامیر و شته بیگیانه‌کان. به رینترين سیفه‌تی ئینسانی لهم دوو دیوانه‌دا قسه‌کردن و وتنه. له که‌نار ئه‌وه‌دا سیفه‌ت و تاییه‌تمه‌ندی مروقانه‌ی تر زور به‌دیده کری که باری که‌سایه‌تیپیدانه خه‌یال‌اویه‌کان چپر و خه‌ستتر ده کاته‌وه.

### ئه‌نجام

له ناو ئه‌ندام و ره‌گه‌زه‌کانی ئاشنایه‌تیسپی و اتاییدا ره‌گه‌زی خواستن به چه‌قبه‌ستنی که‌سایه‌تیپیدان له پانتاییه کی زورتردا جیی سه‌رنجی شیرکو بیکه‌س بووه. پیوه‌ندی سوزدارانه‌ی ده‌گه‌لیان ساز داوه.

شاعیر بۆ نواندن و ده‌رپیینی تاسه و مه‌راقی خۆی بۆ نیشمان و ولات و خه‌لک و ... له‌گه‌ل شتانی بیگیاندا هه‌مزاق‌پن‌داری کردووه و بهم ئامرازه هونه‌ریبیه گه‌رچی واتا له نیو تویزه‌کاندا شاردراوه‌ته‌وه و هه ره بۆن‌هه درک کردنی تۆزی دره‌نگ ده‌بئ، به‌لام له ئاکاما‌دا له‌به‌ر دۆزینه‌وه‌ی پیوه‌ندی تازه له ته‌وری هاونشیبی و توهه دیمه‌نی خواستنیه‌تی تازه‌تر و زورتری ئافراندووه و خوینه‌ری سه‌رسام کردووه.

شیرکو بیکه‌س به ده‌ستیپوره‌دان له ئاقاری واتایی وشه و وته و ده‌رپه‌راندنی وشه‌کان له شوین و واتا و باری ئاسایی خوینان، ده‌ستیداوه‌ته کاری ئافراندنه‌وه و خولقادنده‌وه‌ی چه‌مک و واتاکان.

ده‌توانین که‌سایه‌تیپیدانه کانی شیرکو بیکه‌س ئاوا ده‌سته‌به‌ندی بکه‌ین: که‌سایه‌تیدان به دیارده‌هی ماددی-هه‌ستی؛ که‌سایه‌تیدان به دیارده‌هی واتایی-ئینتراعی؛ که‌سایه‌تیپیدان له بیکه‌ی بانگه‌بیشته‌وه؛ که‌سایه‌تیپیدان له قالبی چینه‌کانی کوکه‌لگادا؛ که‌سایه‌تیپیدان له ناوی به‌رهه‌م و ناوی شیعره‌کاندا. هه‌روه‌ها و توویزه‌وه که‌بینایتیکی سه‌ره کی له که‌سایه‌تیپیدانی شیرکو دا دیته ئه‌ژمار. هه‌ندی بابه‌تی تر به شیوه‌یه کی به‌رچاوتر و زه‌قت و زورتر له که‌سایه‌تیپیداندا به کاری هینتاوه؛ وه که‌سایه‌تیدان به شوین/کات و گئ و گیا و دار و ده‌وهن.


283

دیارترین خه‌سله‌تی که‌سایه‌تیپیدانه کان ئه‌وه‌یه که له سنوری ئاسایی بون تیپه‌ریوه و ئاسوئی هزر و خه‌یالی باوی به‌زاندووه و به ناخ شه‌کاندا رۆچووه و مرواری و گوهه‌ری ناوازه‌ی راوه کردووه.

زۆرینه‌ی که‌سایه‌تیپیدانه کان ماددی-سروشتی بون و ره‌گه‌زی سروشتی زورترین پیژه‌ی که‌سایه‌تیپیدانی بدرکه‌وتوه و له زۆرینه‌ی نموونه‌کانی ئه‌م هونه‌ردها ئه‌وه‌دا ره‌گه‌زه زاله‌ی شیرکو بیکه‌سی تیدا به‌دی ده‌کری.

له زۆردهو پوخته‌ی بابه‌تکان به خشته رازاوه:

خشتەی ١: کەسايەتى دان به دياردهى ماددى-سروشنى و ئىنتزاعى-واتايى



284

خشتەی ٢: پىزىھى كەسايەتى پىدان به پىن بايھەت



## سەرچاوه کان

### کوردى

- ئەممەد حسین، جەبار. ۲۰۰۸. ئىستانىكاي شىعرى كوردستانى تىراق ۱۹۵۰-۱۹۷۰. چاپى يەكەم. سلىمانى: سەردەم.
- سلىۋە عيسا، ھاۋىزىن. ۲۰۰۹. بىناتى وىئەي ھونەرى لە شىعرى شىركۆ بىكەسدا. چاپى يەكەم. سلىمانى: سەردەم.
- بىكەس، شىركۆ. ۲۰۰۶. ديوان. ٦ بەرگ. كورستان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴. ئەسپىك لە پەرەي كوللە. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ ب. ئىستا كچىك نىشتمانە. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ ج. تو ئەتوانى بە قومى ماج بەمختەتەوە هەلقولىن. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ د. تەون. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ هـ. حەفتا پەنجهەرەي گەرۆك. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ و. خىرا كە مردن خەرىكە بگات. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ ز. پۇوبار. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ ح. زى و زنه. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- \_\_\_\_\_ ۱۳۹۴ ط كىتىپى ملوانكە. چاپى يەكەم. تهران: آريوحان.
- عەبدولەستەف، ئىدرىس. ۲۰۱۱. لايەنە ۋەنیزىيەكان لە شىعرى كلاسيكىي كوردىدا (بە نموونەي حەمدى و حاجى قادرى كۆيى).
- ھەولىر: ئاكاديمىيە كوردى.
- ھەينى، شىرزاز. ۸۰۰۲. ۵۰۵ دەقىقە لە گەل شىركۆ بىكەسدا، ھەپىېرىقىن. كورستان: نما.

285

### عەرەبى

- ابن الأثير، ضياء الدين. ۱۹۷۳. المثل السائر في أدب الكاتب والشاعر. ج. ۲. تقديم أحمد حوفى و بدوى طبانة. ط. ۲. القاهرة: دارنھضة مصر.
- أبوالعدوس، يوسف. ۱۹۹۷. الاستعارة في النقد الأدبى الحديث. الطبعة الأولى. أردن-عمان: الأهلية.
- ابن معصوم المدنى، سيد على صدر الدين. ۱۹۸۶. أنوار الربيع في أنواع البديع. ۷ مجلدات. تحقيق شاكر هادى شكر. نجف الأشرف: مطبعة النعمان.
- الجرجاني، عبد القاهر. ۲۰۱۴. أسرار البلاغة في علم البيان. تحقيق د. محمد الإسكندراني و د. م. مسعود. بيروت: دار الكتاب العربي.
- الراغب، عبدالسلام أحمد. ۲۰۰۱. وظيفة الصورة الفنية في القرآن الكريم. الطبعة الأولى. حلب: فصلت.
- السد، نورالدين. ۱۹۹۷. الأسلوبية و تحليل الخطاب. ج. ۱. الجزائر: دار الهومه.
- السكاكى، ابو يعقوب يوسف بن أبي بكر بن محمد. ۱۹۸۲. مفتاح العلوم. تحقيق أكرم عثمان يوسف. بغداد: دار الرسالة.
- ضيف، شوقى. ۱۹۷۶. فى النقد الأدبى. ط. ۴. القاهرة: دار المعارف.

- ۱۹۸۷. الفن و مذاهبه في الشعر العربي. الطبعة الحادية عشرة. القاهرة: دار المعارف.
- عبدالعزيز قلقيلية، عبده. ۱۹۹۲. البلاغة الاصطلاحية. الطبعة الثالثة. القاهرة: دار الفكر العربي.
- ماحوزی، مهدی؛ امیرخانلو، محبوبه؛ ماحوزی، امیرحسین؛ طاووسی، محمود. ۲۰۱۸. «القلب و الروح في قصائد شمس الغزلية مع عناية خاصة بصنعه التشخيص دراسه موازنة». مجلة إضاءات نقدية. السنة الثامنة، العدد الثلاثون، صيف ۲۰۱۸. صص ۵۰-۸۴.
- مطلوب، أحمد. ۲۰۰۷. معجم المصطلحات البلاغية وتطورها. طبعة جديدة. بيروت: مكتبة لبنان ناشرون.

#### فارسی

- ابن الرسول، سید محمد رضا؛ حسینی، سید محمد هادی. ۱۳۹۳. «جلوه‌های تشخیص در تشبیه». مجله مطالعات زبانی بلاغی. سال پنجم. شماره دهم. صص ۷-۲۱.
- احمدی، عبدالحمید؛ عبداللهزاده، فؤاد؛ نارویی، سهیل. ۱۳۹۸. «آشنایی‌زدایی در شعر اسلامی معاصر (بررسی موردي: آرایه تشخیص در شعر هاشم هارون رشید)». مجله پژوهشنامه ادب اسلامی. دوره اول. شماره اول. بهار و تابستان ۱۳۹۸. صص ۳۹-۵۶.
- سجادی، بختیار. ۱۳۹۵. فرهنگ اصطلاحات تخصصی نقد و نظریه ادبی (انگلیسی-کردی-فارسی). طرح پژوهشی. سندج: دانشگاه کردستان.
- شفیعی کدکنی، محمد رضا. ۱۳۷۵. صور خیال در شعر فارسی. چاپ ششم. تهران: آگاه.
- شمیسا، سیروس. ۱۳۸۱. بیان و معانی. تهران: انتشارات فردوس.

286

- ۱۳۹۳. بیان و معانی. چاپ چهاردهم از ویراست دوم. تهران: میترا.
- شوکولوفسکی، ویکتور. ۱۳۹۲. هنر همچون فرایند. در نظریه ادبیات متنهای از فرمالیستهای روس. تزویان تودوروف. ترجمه عاطفه طاهایی. چاپ دوم. تهران: دات.
- کرازی، میر جلال الدین. ۱۳۹۳. الف. زیباشناسی سخن پارسی ۱ بیان. چاپ یازدهم. تهران: نشر مرکز.
- ۱۳۹۳ ب. زیباشناسی سخن پارسی ۲ معانی. چاپ دهم. تهران: نشر مرکز.
- کروچه، بندتو. ۱۳۴۴. کلیات زیباشناسی. ترجمه فؤاد روحانی. تهران: بنگاه ترجمه و نشر کتاب.
- محمدی، علی؛ زارعی، جمیله. ۱۳۸۸. «بررسی و تحلیل آرایه تشخیص در سرودهای قیصر امینپور». فصلنامه زبان و ادب پارسی، شماره ۴، پاییز ۸۸. صص ۱۰۵-۱۲۷.
- محمدی آسیابادی، علی. ۱۳۸۵. «فرافکنی و شخصیت‌بخشی در شعر حافظ». مجله دانشکده ادبیات و علوم انسانی دانشگاه تربیت معلم. شماره‌های ۵۲ و ۵۳. صص ۱۱۱-۱۳۴.
- المطعني، عبدالعظيم ابراهیم محمد. ۱۳۸۸. ویژگیهای بلاغی بیان قرآنی. ترجمه سیدحسین سیدی. چاپ ۱. تهران: سخن.
- میرصادقی، (ذالقدر) میمنت. ۱۳۷۶. واژه‌نامه هنر شعر و شاعری. چاپ چهارم. تهران: کتاب مهناز.
Gotina meşhur ya ku ji hêla sosyolîngüîstîkê Yîdîş Max Weinreich ve meşhûrbûyî "zimanek dî-yalekteke bi artêş û bi hêzên behrî ye", girîngîya hêza politîk di statûya guhertoyêñ axaftinî de nîşan dide. Lêkolînerêñ din nîşan dane ka çawa pirsa politîkaya ziman çiqas politîk e di çarçoveya dîyarkirina statûya zimanekî de an jî formeke din ya qebûlbûna ji hêla hukumat an jî partîyen politîk ve. Di encamê de, politîkayêñ zimanî gelek politîk in (Sonntag/Cardinal 2015; dîsa binêre May 2015), ew qas ku ziman dikare wekî avanîyêñ politîk bêne dîtin (Joseph 2004). Mijarêñ statûya zimanî politîk in.

Lewra ne tenê çima biryara wan ji hêla çavkanîyên hezî ve wekî dewlet, tê dayîn, lê di heman demê de ji ber ku guherîneke di statûya wan de, bi taybetî di rewşa zimanên kêmîneyan de girêdayê hebûn an jî nebûna mobîlîzasyona etnolînguîstîk e. Mobilîzasyona etnolînguîstîk xwedîyê wê potansiyelê ye ku îdeolojîya zimanî ya hegemonîk têk bibe û dikare têkiliya hêzan û loma jî kevneşopîya dewletan bêhizur û qet bike (Sonntag/Cardinal 2015: 15).

Her çiqas xwezeya politîk ya politikayêne zimanî li ser statûyê bi bandor bin jî, gelek faktorê din hene ku bi statûya zimanî ve eleqedar in. Mesela, Sonntag/Cardinal (2015) teorîya politîkî wekî çarçoveyeke teorîk bi kar tîne ji bo ku biryara wê bide ka çima û kengê statûya zimanekî dibe ku biguhere. Wan dîtiye ku wexta dewlet dikeve nava krîz û guherînên mezin ev guherîn pêk tê ku di van deman de kevenşopîya dewletê dikeve nava astengê. Lê di heman demê de behsa girîngîya tevgera etnolînguîstîk jî dikin. Bi gotineke din, ew guherîna statûya zimanî tenê wekî pêvajoyeke ji jor bandorê li jêr kirî nabînin. Vejîna Welshî mînakeke gelekî baş e ku tevgera ji binî hatî ji bo vejîna zimanî û xwesteka civatê ji bo vejîn, berdewamkinin û pêşxisina zimanî. Her çiqas pişâftina Îngilizî li ser Welshî hebe jî ev tevger guherînên ciddî û bêemsal kirine. Rewşa dijî vê li Îrlandayê pêk hatiye (Ferguson 2006). Ji ber vî yekî, ne tenê politîka, faktorê din jî bandorê li ser statûya zimanî dikin. Ev factor ev in; hejmara axêveran bi muqayeseya civatê zimanî yên din yên di nav heman miletî de; hêza sosyo-ekonomîk ya axêveran; yekûniya axî û faktorê din yên demografîk (yanê, civîn û jîyîna li gundevaran an jî li beranberê wê bajaran); hebûn û nebûna kevneşopîya bihêz ya edebî; asta plana korpusû standardîzasyonê; quweta tevgereke etnolînguîstîk (yanê, gelo civatek ji bo zimanê xwe statûyeyeke bilind telep dike an na û ka gelo ew civat ji bo van xwestekên xwe çiqas zorê didin); di dewleteke netewî de îdeolojîyen hegemonîk li hember pirzimanî û cihêregîya zimanî; û tevgerên hakim li hember mafêñ zimanî (Gilles/Bourhis/Taylor 1977; May 2008). Hema hema bêîmkan e ku ev faktor di nav listeyekê de li gor girîngîya xwe bêne rêzkirin da ku bê nîşandan kîjan ji van faktoran xwedîyê bandora herî mezin ya li ser statûya zimanî ne. Têkilîya di navbera van faktoran û statûya zimanekî de girêdayê kontekstê ye. Ev dê bi rewşa Kurdistana Iraqê ve, bi berawirdkirina du guhertoyêñ Kurdî, Behdînî û Hewramî, yên li vê hikumatê ve bê ravekirin.

### **3. Noteke li ser Metodolojîyê**

Berhevkirina statûya herdu guhertoyêñ axaftinê û hewlîn min yên ji bo bersivdana pirsa çima herdu guherto li HHKyê xwedîyê statûyê cuda ne bi Politîka û Plansazîya Zimanî ya Krîtik (PPZK) (Critical Language Policy and Planning (CLPP)) ve tê ravekirin. PPZK li ser newekhevîya statû û jîndarîya guhertoyêñ axaftinê disekine. Bi awayekî spesîfiktir, ev xebat ji nêrîna dîrokî-avanîyê sud werdigre ku;

...ferz dike ku xebatên politîkaya zimanî mîsoger politîk in (û îhtîyaciya wan) bi têgihîştina xwezaya politîk ya pêvajoya politîkaya zimanî (û) analîzên aşîkar yên têkilîyen di navbera politîkaya ziman û pêo vajoyen sosyodîrokî yên wekî koçberî, avabûna dewletan û têkçûnên politîk hene (Tollefson 2006: 49).

Daneyêñ vê xebatê di deh salêñ dawî de hatine berhevkirin ku di wê demê de ez bi awayekî çalak li Kurdistana Iraqê li ser politîka û plansazîya zimanî dixebeitîm (Sheyhislami 2015, 2012, 2011; Sheyhislamî/Hassanpour/Skutnabb-Kangas 2012). Di salêñ 2012 û 2013an de, Ez li HHKyê nêzîkê

neh mehan mam. Di vê demê de, ez li gelek hereman gerîyam û bi awayekî informal bi her cure însanan re axivîm, wekî, ajovalen texsiyan, zimannasên sepandî (applied linguists), sosyolinguist, zanyarêñ politikayê, mameste, xwendekar, hem welatîyêñ jirêzê û bi berpirsêñ bilind yên heremê yên di derbarê mijarêñ idareya zimanî de xwedîyê fîkr û raman bûn. Ez bi aktîvîstêñ zimanî yên Behdînî û Hewramî têkiliya xwe berdewam dikim. Di vê gotarê de, ez ê bêjeya Behdînî bi kar bînim. Lewra piranîya xelkêñ Kurdistana Iraqê ji bo vê guherto ya Kurmancî (Kurdîya Bakur) bêjeya Behdînî bi kar tînin ku ev guherto bi piranî ji hêla xelkê herema Behdînan tê bikaranîn (bi gelenperî li Duhokê). Wekî wê, ez bêjeya Hewramî bi kar tînim ku xelkê li wê alîyê vê bêjeyê tercîh dîkin û ji bo vê guherto yê hin binavkirinêñ din jî hene (wekî, Goranî, Kakayî, hwd.)

#### **4. Politikaya Zimanî ya HHKê ji 1992yan ber bi vir ve**

##### **4.1. Guhertoyêñ Zimanî yên HHKyê**

Kurdistana Iraqê cihê hin grubêñ guhertoyêñ zimanî ne: Kurdî, Erebî, Tirkî, Suryankî, û hwd. Ji bîlî Zazakî (Dimilkî, Kirmançî) hemû guhertoyêñ Kurdî li Kurdistana Iraqê têne axaftin. Ew dikarin di bin pênc grubêñ devokan de bêne senifandin: Gruba Başûr (wekî, Feylî, Kelhûrî, Xaneqînî, hwd.) li derveyî HHKyê tê axaftin wekî, li Xaneqîn û Mandilîyê. Hewramî ji hêla 25.000 kesî ve li mintiqaya Helepçeyê û gundewarîyê li ser sînorê Îranê tê axaftin. Kurmancî an jî li Iraqê zêdetir bi navê Behe dînî an jî Behdînanî tê zanîn, ji hêla 1.5-2 mîlyon kesî ve bi gelempêrî li Duhok û Şingalê tê axaftin. Kurdîya Navendî an jî Soranî bi 3-4 mîlyon axêverên xwe ve guherto ya herî fireh e û bi gelempêrî li Hewlêr, Sulêmanî, Helepçe û Kerkukê tê axaftin.

**308**

##### **4.2. Pêşenivîsa Makezagona sala 1992yan**

Di sala 1992yan de, parlementoya nûavabûyî ya Kurdistanê di pêşenivîsa makezagona xwe de di maddeya heftan de politika xwe ya zimanî diyar kiriye (Kurdistan 2004). Di wir de bi vî awayî derbas dibe:

- Kurdî dê bibe zimanê fermî yê Herema Kurdistanê,
- Nivîsêñ fermî yên bi otorîteyêñ federal û heremî re têne kirin dê bi Erebî û Kurdî bin.
- Hînkirina Erebî di Herema Kurdistanê de dê mecbûrî be.
- Zimanê Turkmenan li dev Kurdî dê zimanê perwerde û çandê be. Zimanê Suryankî li dev Kurdî dê bibe zimanê perwerde û çandî ji bo kesen bi wî zimanî diaxivin.

Di vê despêkê de, her çiqas mafêñ zimanî yên civatêñ Turkmen û Suryanîyan hatibe gotin jî, cuñ dahîya di nav Kurdî de hatiye danpêçkirin. Terma Kurdî di vê maddeye de wekî termeke sîwan ji bo Behdînî û Hewramî di nav de hemû guhertoyêñ Kurdî hatiye bikaranîn. Ev herdu guherto li HHKyê têne axaftin. Lê di rastîyê de Kurdî di vê derê de refereyê guherto ya standartkirî ya Kurdî, anku Soranî tenê dike. Mesela, ev guherto bûye navgîna hîndekarîyê ya hemû dibistanêñ gel, ji Helepçeyê heta Duhokê û Zaxoyê di sala 1992yan de. Ev ne rewseke nû bû ji bo Hewremîaxêvan ku wan di dema Saddam Husêñ de jî Soranî li dev Erebî wekî navgîna hîndekarîyê bi kar anîbûn. Lê Soranî di dibiH

stanêñ gel de ne bibû navgîna hîndekarîyê ne jî bibû derseke hînbûyînê li Duhokê; qet nebe ji 1974an ber bi vir ve nebîbû. Piranîya Mamosteyan Soranîya standart û edebîyata wê nedizanîn û ew bi piranî Erebî dizanîn. Kêmbûna çavkanîyan ji bo hînkirina Soranî bi awayekî effektif, bi dijberîya Soranîaxêv û Behdînîaxêvan ve wexta hate ber hev (muhtemelan ji dijberîya politik hatibû), berxedena li hember hebûna Soranî li mintiqê ji nû ve sor kir. Ez ê zêdetir hurgilîyan li jêr bidim.

#### **4.3. Mînaka Behdînî**

Berxwedana Behdînîaxêvan li hember hegomanyaya Soranî li Duhokê heta sala 1996an ji ber du sebeban xwe neda der. Sebebê ewil, zanayêñ Behdînî hewcedarê demê bûn ji bo amadekirina keresê teyên hîndekarîyê û wan ji bo Behdînî hin planêñ gewdeyî yên bingehîn çêkirin (wekî, amadehîya pirtûkan, pirtûkêñ dersê, pirtûkêñ gramerê û ferheng). Qet nebe divê wan amadehîyan têra hîndekarîya di dibistanan de bikira. Sebebê duyem, PDKyê elîtên Behdînî îqna kirin ku ji bo xatirê yekîtiya Kurdan şîkayetên xwe dayînine alîkî.<sup>2</sup> Sebebê duyem di salêñ 1994an de bandora xwe wunda kir ji ber herba navxweyî ya di navbera Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) û PDKyê de. Bi alîkarîya hukumeta merkezî ya Iraqê PDKyê karî Hewlêra paytext ji YNKyê bistîne û YNK ber bi Silêmanîyê ve bişiqitîne ku qeleya Soranîya Standart bû li Iraqê. Di encama vê de, HHK ji hêla du rêveberîyan ve hate dabeşel kirin (1997-2002): yek li Silêmanîyê ji hêla YNKyê ve û ya din ji hêla PDKyê ve li Erbîlê ku Duhok jî di nav de bû. Statûya Soranî wekî guhertoja Kurdîya standart li Hewlêra paytext lawaz ket wextê ew der ji hêla PDKê ve hate rêvebirin.

Wext ji bo Behdînîaxêv Duhokê gelek guncav bû ji bo rêveberîya PDKê ya li Hewlêrê îqna bikin ji bo perwerdeya bi Behdînî li wê heremê. Di sala 1997an de wezareta perwerdehîyê ya HHKyê qomîñ syonek ji bo vê iñtimalê peywirdar kir. Di sala 1998an de, Serokê Heremê yê wê demê Nûri Saways memorandumek îmza kir ku li gor wê Behdînî dikaribû bibûya navgîna perwerdeyê di dibistana seretayî de ji pola yekî heta ya çaran. Di sala 2002yan de, parêzgeha Duhokê xwest di hemû astêñ dibistana seretayî de bi Behdînî ders bê dayîn. Ev ew wext bû ku PDK û YNK li parlementoya Hewlêrê bi hev re dixebeitin. Wê gavê, Akademîya Zanistê ya Kurdistanê bê dilê xwe be jî destûra Behdînî ji pola pênc û şesan jî da, lê bi wê şertê ku li dev Behdînî, Soranî jî hîn bikin.

Gav bi gav, xwestekêñ ji bo Behdînî di perwerdeyê de li derveyê Duhokê jî derketin meydanê. Mesela, di sala 2005an de, pênc xwendekarêñ Zanineha Soranê ya li Hewlêrê, destûra nivîsîna teza doktorayê bi Behdînî xwestin. Dekanê Enstîtuya Zanistêñ Civakî ev xwestek red kir. Lê, çima Soran ciheke ji cihêñ herî bi hêz yên PDKyê bû, xwendekar karîn vê xwesteka xwe bi alîkarîya nûnerêñ PDKyê ve bi dest bixin. Di sala 2008an de, Yekîtiya Rêveberîya Duhokê û heyeta herêmî ya perwerb deyê ji Hewlêrê xwest destûr bidin ku di polêñ 7-9an de jî bi Behdînî perwerde bê dayîn. Wezereta Perwerdeyê ya HHKyê ji Akademîya Kurdistanê ya ku ji hêla endamên YNKyê ve dihate rêvebirin, xwest ku li ser vê xwestekê şîroveyêñ xwe bişînin. Her çiqas Akademîye li dijî vê xwestekê şîret dabe jî, Duhokê bi awayekî serkeftî karî ev xwestek bi dest bixe. Di sala xwendinê ya 2014-2015an de, Behdînî li parêzgeha Duhokê bû navgîna perwerdeyê di hemû astêñ dibistan, zaningen û kolejan de. Dîsa ew bû zimanê xebatê ya vî bajarî, zimanê sektora taybet û medyayê.

<sup>2</sup> Endamên malbata Barzanîyan ku PDKê birêvedibin axêverên zikmakî yên Behdînî ne û ji wê mintiqê tên. Dîsa piranîya wan hakimê axaftina bi Soranî ne.

#### **4.4. Mînaka Hewramî**

Nêzîkê 100.000 Hewramîaxêv sedî heftê û pêncê wan li Îranê û yê mayî jî li Iraqê dijîn. Yen Iraqê bi gelempêrî li parêzgeha Helepçeyê û nêzîkê sih gundêñ xwe ve li nêzîkê sînorê Îranê dijîn. Ji wê heremê re Hewremana Lahun tê gotin (Hewramana Lahun aleyhê Hewramana Text û hwd. ye). SerdestîL ya Soranî û qebûlkirina wê wekî zimanê standart qasê ku tê xwîyanê nebûye sebebê tu berxwedaneke di nav civata Hewramîaxêv de. Sebebê bingehîn yê vê ew rastîye ku li gor wan tu tişt neguherîye. Di wextê Saddam Hûsêñ de jî, wekî perçeyeke parêzgeha Silêmanîyê, Hewramîyan Soranî wekî navgîna perwerdeyê bi kar dianîn. Zanyarêñ Hewramî reqabeta di navbera Behdînî û Soranî de dizanîbûn û dîsa dizanîbûn ku di dawîya salêñ 1990î û destpêka salêñ 2000an de Behdînî cihê Soranî girtîye û ew bûye zimanê defakto li parêzgeha Duhokê. Aktivîst û artîstên Hewramî yên li dîyasporayê dijîn li Ewrupayê (bi taybetî li Skandînavyayê) dest bi pêşxistina hişmendîyeke tund ya etnolînguîstîk kiriy ne. Ev tevger dibe ku di encama bibîranîna wê rastîyê de pêk hatibe ku guhertoşa axaftinê ya wan ji guhertoyê din yên Kurdî cudatir e (Sheyholislami 2012).

Di sala 2006an de, wextê HHKyê makezagona xwe ûlan kir, nêzîkê sê sed kes ji zanyarêñ Hewramî an jî endamên rêkxistinêñ çandî yên Hewramî ku hin ji wan li Îran û dîyasporayê dijîyan (wekî, welatêñ Skandînavyayê) ji bo mafêñ zimanî kampanyaya îmzayê dan destpêkirin. Di wê de, wan ev dixwestin;

1. Divê civata Hewramîaxêv wekî kêmîneyeke zimanî û zimanê Hewramî jî wekî zimanê di bin xetereyê de bêne dîtin,
2. Divê piştgirî ji bo standardîzasyona Hewramî bê dayîn,
3. Divê piştgirî ji bo bikaranîna wê di medyayê de bê dayîn,
4. Divê ji bo Hewramîaxêvan di dibistanêñ herema wan de piştgirî ji bo perwerdeya di zimanê zikmakî de bê dayîn.

**310**

Ev kampanya wekî cudabûneke tûj hate dîtin ji hêla îdeolojîya zimanî ya sedest ya li heremê, bi taybetî Silêmanî ev we'ez dida, miletik, wekî Kurdêñ Iraqê nikare ji zimanekî zêdetir xwedîyê ziyy manan be ku ev ziman wan sembolîze bike. Li gor neteweperwerêñ Kurd, piranîya wan wê demê ji Silêmanîyê bûn, Hewramî Kurd bûn û wan nedikarî mafêñ zimanî an jî perwedeya bi zimanê zikamakî bixwestana lê dikaribûn Soranî bi kar bianîyana (Sheyholislami 2012). Hetta hin edîbêñ Hewramî ev kampanya rexne kirin: wan digot ev kampanya ne ji bo berjewendîyê netewa Kurd e lê hewlek e ku vê netewê ji hev dadixwe. Tişta taybet di vê derê de ev e ku kesêñ ku li hemberê vê kampanyayê bûn dîsa ew kes bûn ku bi dehan salan li hember hemû cure hêzan bûn ku mafêñ wan yên zimanî red dikirin.

Ji ber darazîna naveroka kampanyaya îmzayê, yên kampanyaker ji hêla piranîyê ve bertekeke neyn ïnî dîtin. Di encama vê de, yên kampanyaker gel temîn kirin ku ew jî Kurd in û welatparêz in lê di heman demê de ew mafêñ zimanî daxwaz dikan. Mesela, wan qebûl kir ku makezagona HHKyê encañ ma berxwedana gelê Kurd e û ew refereyê Kurdistana me ya pîroz e (Sheyholislami 2012: 119). Dîsa wan işaret kir ku Hewramî zimanek ji zimanê herî dewlemend yê Kurdî ye û ew çavkanîyeke gencîu neya edebî ye ji bo Kurdan û ew bi piranî li Kurdistanê tê axaftin. Bi gotineke din, pey ku wan xwe

bi awayekî eşkere wekî Kurd pênase kirin û guhertoya xwe wekî Kurdî û welatê xwe wekî Kurdistan vegotin, wan perwerdeya bi zimanê zikmakî telep kirin. Dîsa, xwesteka wan ya di çarçoveya Îmtîyaza Ewrupî ya ji bo Zimanê Heremî û Kêmareyan, tu wateyê ji bo HHKyê ifade nekir. Tişta ku ew nizam nibûn ew bû ku HHK ne endamê Yekîtiya Ewrupayê ye û ne jî namzedê endamîya wê ye.

Di sala 2015an de wexta Parlementoya Kurdistanî Iraqê plana xwe ya ji bo projeya Yasaya Zimanê Pêkhateyan (Yasay Zimanî Pêk-hatekan) ilan kir, grubeke bi navê Parazvanê Zimanê Hewê ramî kampanyayeke wekî ya berê çê kirin. Pey ku wan Kurdbûna xwe diyar kir, wan ji ber vê yekê gilî kir ku parlemenoya HHKyê, wekî dezgehê din yên heremê, ji bilî afirandina pirsgirêkan li pêşîya pêşketina Hewramî tu tiştekî din nekirine. Wan xwest ku divê HHK pêşîya perweda bi Hewramî û bikaranîna wê di medyayê de veke (KNN 2015). Lê HHK di çarçoveya xwestekên wan de tevnegerîya. Di şûna wê de, berpirsiyaranev bersiv dan, cîma HHK di serdemêk dîrokî de derbas dibe û bi gelek pirsirêkan re mucadele dike û dixwaze xwe wekî dewleteke serbixwe ilan bike, loma xwestekên bi vî rengî divê bêñ paşxistin. Lê balkeş e ku Behdînîaxêvan di wextê xwe de heman bersiv standibûn, lê wan guh nedan van pêşniyazan û xwesteka xwe bi dest xistin. Di beşa bê de, ez ê li ser sebebêñ newekhevîya encama xwestekên herdu gruban bisekinim.

## **5. Berawirdkirina Mînakêñ Behdînî û Hewramî**

### **5.1. Zimannasî**

Bi perspektîfeke zimannasî, Hewramî wekî zimanekî cuda ji Kurdiya tam (Soranî, Kurmancî/Behdînî, guhertoyê başûr) tê hesibandin. Berfirehiya vê cudahiyê dibe sebeb Hewramî wekî ne-Kurdî bê hesibandin (Mackenzie 1962, 2002). Digel vê, Behdînî wekî guhertoyeke ne-Kurdî nayê hesiban din. Lê ew wekî devokeke cuda ji Soranî û guhertoyen başûrî tê hesibandin (Haig û Öpengin 2014). Kreyenbroek (1992) Behdînî û Soranî qasê Îngilîzî û Almanî ji hev cuda dibîne, lê ew têra xwe delîlên zimannasî ji bo vê îddîaya xwe pêşkeş nake. Di vê rewşê de divê Hewramî wekî kêmîneên din yên hen remê (wekî Tirkmen û Suryanîyan) ji mafêñ zimanî sôd wergire. Lê, Behdînîaxêv ji vê mafê sôd werf digirin ne Hewramîaxêv. Herwiha, divê li faktorên ekstra lîngüîstîk bê nihêrîn ji bo bê dîtin ka cîma Behdînî di pratîkê de wekî zimanekî defakto yê resmî li parêzgeha Duhokê tê bikaranîn lê Hewramî kêm zêde wekî zimanekî mintiqayeke taybet maye.

**311**

### **5.2. Têgehîştin û Tevgera Axêverên Zikmanî**

Hin caran têgehîştin û tevgerên endamên civatekê li hember guhertoya wan dibe ku cudahiyê di statûya wê guhertoyê ya resmî û gel de derxe meydanê. Behdînîaxêv guhertoya xwe ji Kurdiya cuda nabînin; pirî wan guhertoya xwe wekî Kurdiya Kurmancî an jî Kurdiya Bakur dibînin. Berevajî, pirî Hewramîaxêv guhertoya xwe ji Kurdiya tam (Soranî, Behdînî û devokên başûr) cuda dibînin. Wekî mînak, di kampanyayê 2006 û 2015an de wan mafêñ zimanî telep kirin. Di xebateke qadê yê zimanînasîyê de li mintiqâ Hewramanê li Îranê, pirî axêver guhertoya xwe ya axaftinê wekî Hewramî û ne Kurdiya an jî ne Kurdiya Hewremanî vedigotin (Anonby, Sheyholislami û Mohammadirad 2016). Bi gotineke din, Behdînîaxêv guhertoya xwe wekî devokeke an jî guhertoyeke Kurdi dibînin lê Hewramîaxêv, qet nebe yên ku kampanyaya îmzayan (ku li jorê behsa wan hate kirin) çê kiribûn, guhertoya

xwe ji Soranî û Behdînî cudatir dibînin. Lê dîtina guherto ya xwe wekî zimanekî mafê zimanî an jî mafêñ kêmîneyan nedaye Hewramîyan.

### **5.3. Kevneşopîya Edebî**

Faktoreke din ya dibe ku bibandor be di statûya guherto ya axaftinê de derece û dîroka kevneşopîya edebî ya wê guhertoyê ye. Li gor Hassanpour (1992) yê ku kevneşopîyen edebî yên Soranî, Kurmancî û Hewramî dabûne ber hev, dîwana helbestan ya herî kevnare ji hêla Mela Perîşan ve di dawîya sedsala çardehan de bi Hewramî hatiye nivîsîn. Dîwana helbestan ya herî ewil ya bi Kurmancî hatî nivîsîn ji hêla Elî Herîrî ve çend sedsal pey ya Hewramî hatiye nivîsîn. Di sedsalê 18 û 19an de hejmara berê hemêñ edebî yên bi Hewramî hema bêje qasî hejmara yên bi Soranî û Kurmancî bi hev re bûn. Muhe temelen sebep ew e ku Hewramî di dadgehêñ mîrekfîya Erdelanê de li Senendecê dihate bikaranîn. Di vê xalê de, nivîsa bi Kurmancî kêm û zêde sekinî û em qet rastî xebatêñ bi Kurmancî nayêñ ji sedsala 18an heta dehsalêñ ewil yên sedsala 20an. Lê prestij û bikaranîna Hewramî bi têkçûna mîrekfîya Erden lanê ve lawaz ket û vê lawazîyê heta dehsalêñ dawî yên sedsala 20an dewam kir. Dîwana helbestan ya ewil ya bi Soranî ku ji hêla Mistefa Kurdî ve hatî nivîsîn pey xebata ewil ya Hewremanî çar sed salan hatiye nivîsîn. Lê ji sedsala 18an û ber bi vê gavê ve, xebatêñ bi Soranî dest bi serdestîyê kirine û di destpêka sedsala 20an de li Kurdistana Iraqê ev guherto bûye zimanê tevgera neteweyî ya Kurdfî. Ev yek dibe ku sebebê standardîzebûna Soranî berîya Hewramî û Behdînî terîf bike. Behdînî di medyayê de cara ewil di salêñ 1960î de di radyoya Bexdayê û radyoya PDK ya nehêñ de hatiye bikaranîn. Di vê navberê de, guherto ya nêzîkê Behdînî, Kurmancî jixwe di riya standardîzasyona li ser devoka Botana başûrê rojhilate Tirkîyê de rewşike baş de bû. Di vê demê de, bikaranîn û fonksîyona Hewramî bi cihêñ taybet yên li gundêñ izolebûyî û dûr yên çiyayêñ herema Hewremanan ve sînordar bû.

### **5.4. Demografi**

Her çiqas kêmbûna kevneşopîya edebî di demêñ modern de, di diyarkirina statûya kêm ya Hewramî û guhertoyen din yên Kurdî de xwedîyê roleke bingehîn be jî, faktorêñ din yên wekî demografi jî dibe ku xwedîyê rolekê be. Mesela, wexta bi Soranî, Behdînî an jî Zazakî re tê berawirdkirin, Hewramî ji hêla nifûseke geleke kêm ve tê axaftin. Di eslê xwe de, dikare bê texmînkirin ku li gundêñ Helebçeya li ser sînorê û Iran û Iraqê axêverên Hewramî ji 25.000an zêdetir nîne. Nifûsa Hewramîaxêvan li alîyê û Iranê ji wekî 75.000an tê texmînkirin. Ji hev cudabûna civatê ji hêla du dewletan ve hêza demografik ya vê civata zimanî kêm kirîye. Em dizanin ku yekûniya axî xwedîyê girîngîyeke mezîn e ji bo bihêzkirina yekîtiya çandî ya wê civatê û ji bo berdewamîya zimanî û hewlêñ mobilîzasyonê ji bo modernîzekirina axaftina wî zimanî (White 1991). Ji alîyê din ve, hem civata Soranî hem jî ya Behdînî di sedsala 18an de dest bi tecrubeya bajarîbûnê kirin û loma jî bikaranîna zimanî berbelav kirin. Bikaranîna Hewramî bi gelempêri bi gundewarêñ Hewremanê re û bi nifûseke kêm ve li bajarê Helebçeya Iraqê û Senendec û Kirmanşaha û Iranê ve sînordar ma. Lê yên bajaran ji bo li hember asîmîlasyona Kurdiya dominant ya Soranî li Iraqê û li hember Farisî an jî Soranî li Kurdistana û Iranê li ber xwe bidin, bi gelek zehmetîyêñ mezintir ve rûbirû man. Yekûna van faktoran pêşîya kodîfiyebûn û standardîzasyona Hewramî girtin.

### **5.5. Polîtîka**

Nebûna forma standart, nebûna zimanê tevgera neteweyî ya Kurdî, nebûna zimanê qadêñ modern û nebûna xwedîyê nifûseke bibandor ya ji hêla bajaribûn û sosyo-kronîkî ve, bû sebep ku Hewramîaxêv di polîtîkaya Kurdistana Iraqê de bibin xwedîyê bandoreke gelek kêm. Ev rewş teqez ne rewşa Behdînî ye. Bandora polîtîk ya Hewramî her çiqas bisînor be ji di navbera du partîyen polîtîk yên bingehîn de hatiye dabeşkirin: PDK û YNK. Hin kesêñ Hewramîaxêv hene ku di pozîsyonê bilind yên partîyen PDK û YNKyê de cih digirin. Lê, herema Hewramîaxêv perçeyeke mintiqa YNKyê ye ku giranîya neteweperwerîya Kurdistanê û ya zimanê Soranî li wir heye. Rewş ji bo Behdînî gelek cuda ye. Ew li hemû parêzgeha Duhokê guhertoya bingehîn e ku ev der qeleyeke PDKyê ye. Di eslê xwe de, Behdînî zimanê zîkmakî yê serokê PDKyê Barzanî ye. Behdînî ne tenê çîma zimanê serokê PDKyê Barzanî ye, lê di heman demê de ew guhertoya bingehîn ya Kurmancî ye ku li mintiqaya Partîya Karkerêñ Kurdistanê tê axaftin ku PDK reqîbê wê partîyê ya artêşî û polîtîk e. Wisa tê xwîyanê ku piştgirîya PDKyê ji bo Behdînî ji bo bibe zimanê defakto yê parêzgeha Duhokê, ji hêla polîtîk ve hatiye motîvekirin. Bi vê PDK ne tenê hêza xwe ya polîtîk li vê parêzgehê bi hêz kiriye lê di heman demê de bandora PKKyê li mintiqaya Behdînîaxêv wekî Zaxo, Amedî û cihêñ dîn bêtaqet xistîye.

### **5.6. Mobîlîzasyona Etnolînguîstîk**


Polîtîkayêñ zimanî polîtîk in ne tenê ji ber ku ew ji hêla dewlet, dezgeh û partîyen polîtîk yên ku ji hêla polîtîk ve bihêz ve têne çêkirin, lê ji ber ku ew bi zext û tevgera polîtîk ya wan civatan ve env cam didin. Ev faktoreke din e ku Behdînî û Hewramî ji hev cuda dike. Civata Behdînîaxêv (bi taybetî yên li Duhok û Zaxoyê) zêdetir aktîf in ne tenê di xwestina mafêñ zimanî de lê di plana statûyê de ji aktîf in, wekî amadekirina ferhengan, pirtukêñ dersan û wergeran. Hetta ew butçeya xwe ji HHKyê nasitînin ji bo van çalakîyêñ xwe (Kulturname 2011). Gelek faktoran mobîlîzasyona etnolînguîstîk ya Behdînî hişyar kiriye, wekî teknolojîyêñ nû yên ragihandinê û koç ku bûye sebeb hişyarîya nijadî ya derbarê gel û zimanêñ din bi taybetî yên Ewrûpayê pêk bê. Ev di kampanyayêñ Hewramîyan de ji heye ku yên kampanyaçêker di çarçoveya parastina zimanêñ kêmareyan de HHKyê di asta standartê Yekîtiya Ewrûpayê de nirxandin. Ev kampanya refereyê ïmtîyazên Ewrûpî ji bo Zimanêñ Heremî an Kêmîneyan yên 1992yan dikir. Aşîkar e ku hem civata Hewramî hem ji ya Behdînî di bin bandora van faktorêñ derveyî de mane. Dibe ku faktorêñ din ji hebin di cudahîya statûya wan de. Cudahîyeke bingehîn ya di herdu civatêñ zimanî de ev e (ji destpêka 1990an ber bi vir ve) ku li Turkîyeyê di nav axêverêñ Kurmanc (û Zaza) de tevgereke bihêz ji bo perwerdeya bi zimanê zîkmakî heye ku bandoa reke gelek mezin li ser zanyarêñ Behdînî kiriye ku ew ji hêla zimanî ve ji Soranî zêdetir xwe nêzîkê Kurmancî bibînin. Mobîlîzasyona etnolînguîstîk ya li Turkîyeyê û van demêñ dawî li Surîyê bawerî daye edîbêñ Behdînî ku ew dikarin bi Soranî re reqabetê bikin. Her çiqas Behdînîya standart bi dehan sal pey Soranî dest pê bike ji, standardîzasyona Kurmancî bi Soranî re pêşî li Stenbolê paşê li Surîyê û di dawîyê de li Ewrûpayê (û ji destpêka 1990an ber bi vir ve li Turkîyê û Surîyê) dest pê kiriye. Ev ne wekî rewşa Hewramî ya li Îranê ye ku hejmara pir ya Hewramîyan li wir dijîn. Esas, pirtûkêñ xwendin û nivîsînê yên bingehîn ev çend sal in hatine çapkirin (Mousazadeh û Faeq 2016).

### **Encam**

Armanca vê gotarê vokolina sebebêñ statûyêñ cuda yên du guhertoyen Kurdî ye ku li Kurdistana Iraqê têne axaftin. Hewramî bi gelenperî li derûdora taybet tê bikaranîn lê Behdîn her çiqas muxalifê Kurdîya Soranî be jî, kariye bibe zimanê fermî yê defakto li parêzgeha Duhokê ku parêzgehek ji çar parêzgehê HHKyê ye. Analîzêñ ku bi gelenperî bi polîtika û plansazîya zimanî ya krîtik ve û bi tayebetî nêrîna dîrokî-avanî ve hatî kirin nîşan da ku hin faktor dibe ku bûbin sebebêñ vê encamê: hebûnêñ cuda yên zimannasî, giringîya dîrokî û pêşketin û kevneşopîya edebî ya guhertoyan, têgehîştin û teva gera axêverêñ guhertoyan li hember guhertoja xwe, tevgerên bingehîn yên civatan ji bo berfirehkirina cihê zimên, demografi û rewşa sosyoekonomîk ya civatê, û wekî dawî polîtika û hêza polîtik ya civatê. Hin ji van faktoran, wekî mînak, cudahîya zimanî ji Soranî û xwedîbûyîna kevneşopîya edebî, Hewî ramîyê zêdetir dike namzedê mafêñ zimanî. Lê ev devok ji gelek alîyan ve di nav dezavantajê de ye: ji alîyê kodifikasiyon û standardîzasyonê ve nêzîkê sedsalekê paşıya Kurmancî (Behdîniya Standart) ye; ji hêla civateke biçûktir ve tê axaftin ku bi piranî derûdorêñ Helepçeyê niştecih in ku rewşa wan ya sosyoekonomîk û hêza wan ya polîtik û bandora wan li ser HHKyê li gor Behdînî gelek kêm in. Faktora herî girîng ew dixwîyê ku Behdînî xwedîyê hêza polîtik e ku bi têkiliya nêzîk ya bi PDKyê tê û bi taybetî ji têkiliya bi malbata Barzanî re tê ku ew avakarêñ PDKyê ne.

Tê mereqkirin ka gelo Hewreman dê bikaribin hin bandara polîtik bi dest bixin û bi vê hin mafêñ zimanî bi dest bixin, bi taybetî jî mafê perwerdehîya bi zimanê zikmakî. Statûya herdu guhertoyan newekhev e. Lê dibe ku ji ber hin pêşketinê di salêñ dawî de, ev newekhevî bi lehê Hewramî biguhere bêyî ku tu mafêñ Behdînîxâvan ji destê wan bê standin. Wekî mînak, Hewramîxâvî ji bo mafêñ xwe yên perwerdeya bi zimanê zikmakî û piştgirîya HHKyê bo berdewamî û pêşketina Hewramî zêdetir dengê xwe derdixin. Ji bo cara ewil, di sala 2015an de, Wezareta Perwerdehîyê ya HHKyê pirtûkên nivîs û xwendinê bi Hewramî ji bo polekê derxistin. Dîsa, çalakvanêñ zimanî û çandî li alîyê din yê sînor (yanê Ïran) zêdetir bûne û ev dibe ku bandorê li ser jîndarîya vê guhertoyê bike. Di sala 1916an de, pirtûkek bi navê Hewramî Pola Yekem ji hêla du Hewramêñ ji Ïranê hatine derxsitin (Mousazadeh û Faeq 2016). Ev pirtûk alfabeaya Hewramî û hin qabîlîyetêñ bingehîn yên xwendinê hîn dike û di hin dibistanêñ taybet û di dersên Hewramî de li herdu alîyêñ sînor tê bikaranîn. Çend qanalêñ televîzyon û radyoyan hin materyalêñ Hewramî çap dikin ku ew bi gelempêri di formêñ muzîk û bernameyêñ hefteyî de ne. Çalakvanêñ ziman û çanda Hewramî di salêñ dawî de ji medyaya civakî sûd werdigirin. Belkî tişta herî muhum ew e ku bajarê Helepçeyê wekî parêzgehekê hate qebûlkirin ku sedî bîstê vê parêzgehê Hewramîxâvî in. Hewramîxâvî dê bikaribin hêzeke bêhtir bibandor bin di hilbijartinêñ heremî de û bi awayekî polîtik dê bikaribin di rewseke baştir de bin ji bo telepkirina perwerdeya bi zimanê zikmakî û di parastin û pêşxistina Hewramî de. Dîsa hemû işaret nîşan didin ku Behdînî ji ber ku zimanê defakto yê Duhokê ye dê pêşketina xwe berdewam bike.

Komên Guhertoyê Kurdî (Sheyhislami, 2015)



315

## References

- Anonby. Erik / Sheyhislami, Jaffer / Mohammadirad. Masud 2016. Kordestan province in the Atlas of the Languages of Iran. Paper presented at the 3th International Conference on Kurdish Linguistics. University of Amsterdam; August 25-26. 2016.
- Ferguson. Gibson. 2006. Language planning and education. Edinburgh: Edinburgh University Press.
- Garvin. Paul L. 1993. A conceptual framework for the study of language standardization. International Journal of the Sociology of Language, 100-101/1: 37-54.
- Gellner. Ernest. 1983. Nations and nationalism. Ithaca: Cornell University Press.
- Giles. Howard / Bourhis, Richard / Taylor. Donald. 1977. Towards a theory of language in ethnic group relations. In: H. Giles. ed. Language, ethnicity and intergroup relations. London: Academic Press: 307-348
- Hassanpour, Amir. 2012. The indivisibility of the nation and its linguistic divisions. International Journal of the Sociology of Language, 217: 49-73
- Kultumame. 2009. Li Zaningeha Soran Kurmanci qedexe ye.<http://www.kulturname.com/?p=3434&print=1> (2011/08/01)
- KNN. 2015. April 04. Hewramîyekan bo sê serokatîyeke u hizbekan: Ta key berhest leberdem zimanekemanda [deø danêñ] [Hewramîmis to the three leadership and [political] parties. For how long do you want to create obstacles in front of our language]. [www.knnc.net/Drejey-hawa.aspx?id=43856&LinkID=4](http://www.knnc.net/Drejey-hawa.aspx?id=43856&LinkID=4) (2016/09/05)
- Kurdistan. 2004. Constitution of the Iraqi Kurdistan Region. Unrepresented Nations and Peoples Organization. <http://www.unpo.org/article/538>. (2012/05/01)

- Longmanç 1998. Longman dictionary of English language and culture. Essex: Longman.
- Mackenzie. David. 2002 Gurâni. Encyclopedia Iranica. XI/4: 401-403
- Mackenzie. David N. 1962. Kurdish dialect studies I. London: Oxford University Press.
- May. Stephen. 2015. Language policy and political theory. In: D. C. Johnson / F. M. Hult. eds. Research methods in language policy and planning. A practical guide. Chichester: Wiley Blackwell: 45-55.
- May. Stephen. 2008. Language and minority rights: Ethnicity, nationalism and the politics of language. London/New York: Routledge.
- Mousazadeh, Fariborz / Faeq. Ne'man. 2016. Kalasu yoamu Horami (first grade Hawrami] Sulaimaniyah: Piramerd.
- Sheyhislami. Jaffer. 2015. Language varieties of the Kurds. In: W Taucher / M. Vogl / P. Webinger. eds. The Kurds. History, religion, language, politics. Vienna: Austrian Federal Ministry of the Interior: 30-51.
- Sheyhislami, Jaffer. 2012. Language policy and planning: Identity and rights in Iraqi Kurdistan. In: G. Kunsang / A. Snavely / T. Shaky. eds. Minority language in today's global society Vol. 2 New York: Trace Foundation: 106-128.
- Sheyhislami, Jaffer / Hassanpour, Amir / Skutnabb-Kangas. Tove. eds. 2012. The Kurdish Linguistic Landscape: Vitality. Linguicide and Resistance. International Journal of the Sociology of Language, 217.
- Sheyhislami. Jaffer. 2011. Kurdish identity, discourse and new media. New York: Palgrave Macmillan.
- Sonntag, Selma K / Cardinal, L. 2015. State traditions and language regimes: A historical institutionalism approach to language policy. Acta Universitatis Sapientiae, European and Regional Studies. 8/1: 5-21.
- Tollefson, James. 2006. Critical theory in language policy. In: Thomas Ricento. ed. An introduction to language policy: Theory and method. Oxford. Blackwell: 42-59.
- White. Paul. 1991. Geographical aspects of minority language situations in Italy. In: Collin H. Williams, ed. Linguistic minorities, society, and territory. Clevedon: Multilingual Matters: 44-65.
- Wright, Sue. 2007. The right to speak one's own language. Reflections on practice. Language Policy. 6, 323-330.

## **Yayın İlkeleri**

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından çıkarılan JMS (*The Journal of Mesopotamian Studies*), Kürt, Arap ve Süryani dili kültürü ve edebiyatları alanlarındaki bilimsel nitelikli çalışmalarla yer veren hakemli bir dergidir. Kış (Şubat) ve Yaz (Ağustos) sayıları olmak üzere yılda iki defa Yayınlanır. Yayınlanacak yazırlarda bilimsel araştırma ölcütlerine uygunluk, alana bir yenilik getirme ve başka yerde yayınlannamış olma şartı aranır. Bilimsel bir toplantıda sunulmuş bildiriler, yayınlanmamış olmak şartıyla kabul edilebilir.

### **Yazırlar Değerlendirilmesi**

Dergimize gönderilen yazılar, öncelikli olarak yayın kuruluna dergi ilkelerine uygunluk açısından incelenir. İlkelerde uygun bulunanlar, iki hakeme gönderilir. Yazarlar, hakemlerin önerilerini dikkate alıp gerekli düzeltmeleri yaparlar; fakat katılmadıkları noktalara itiraz etme hakkına sahiptirler.

Gönderilen telif makaleler, Editör Kurulu tarafından inceleştikten sonra değerlendirilmek üzere "kör hakem" yöntemiyle konunun uzmanı iki hakeme gönderilir. İki hakemin görüş ayrılığı durumunda, üçüncü bir hakemin görüşüne başvurulur. Makale, en az iki hakemden olumlu rapor gelmesi halinde Yayınlanır. Hakem raporları yazarla gönderilerek karar bildirilir.

Hakemlerden biri veya her ikisi, "düzeltmelerden sonra yayınlabilir" görüşü belirtirse, gerekli düzeltmelerin yapılması için makale yazarına gönderilir. Düzeltme yapıldıktan sonra hakemlerin uyarılarının dikkate alınıp alınmadığı hakem veya Editör Kurulu tarafından değerlendirilir. Ayrıca yazarların, hakemler tarafından belirtilen görüşlere itiraz etme hakkı bulunmaktadır. Yapılan itirazlar editör kurulu tarafından görüşlüp uygun bir karar alınır.

Yayınlanmasına karar verilen yazılar, sayfa düzenlemesi yapıldıktan sonra pdf formatında yazarlara gönderilir. Yazar son okumayı yapar ve gerekli düzeltmeleri metin üzerinde işaretleyerek dergiye geri gönderir.

Yayınlanmayan yazılar iade edilmez ve yazılırdaki görüşlerin yasal sorumluluğu yazarlarına aittir.

Yayınlanan yazılar için yazardan dergiye veya dergiden yazarra herhangi bir ücret ödemez.

Yayın aşamasında yazılar üzerinde esasa yönelik olmayan küçük düzeltmeler Editör Kurulu tarafından yapılabilir.

Yayınlanan yazıların yayın hakları MAÜ Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'ne devredilmiş sayılır. Bu devir, sanal ortam da kapsar.

Makale gönderimi ve değerlendirme süreci Dergipark sistemi üzerinden yürütülür.

Makaleler değerlendirme sürecine alınmadan önce iThentica intihal programı kullanılarak benzerlik analizine tabii tutulur.

### **Yayın Dili**

JMS'nin yayın dili Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanicedir. Ancak her sayıda, dergide yer alan çalışmaların en az yarısının Kürtçe ve onun çeşitli lehçelerinde yazılmış olması ilke olarak benimsenmiştir. Dergiye gönderilecek yazıların akademik dil kullanımıyla ilgili her türlü kusurdan arınmış olması gereklidir.

### **Yazım Kuralları ve Sayfa Düzeni**

Yazırlar A4 boyutunda kâğıda, MS Word veya uyumlu prog-

ramlarla yazılmalıdır. Yazı karakteri olarak Times New Roman kullanılmalıdır. Yazılar 12 punto ve 1.5 satır aralığıyla yazılmalı, sayfalar numaralandırılmalıdır. Makalelerin uzunluğu en fazla 9.000 sözcük olmalıdır. Özel yazı karakterleri kullanılmamalı, transkripsiyon işaretleri varsa bununla ilgili dokumanlar ullaştırılmalıdır.

Yazarın adı, soyadı, unvanı, görev yaptığı kurum, ORCID numarası ve e-posta adresi mutlaka belirtilmelidir.

Makalenin başlığı içerikle uyumlu olup koyu harflerle yazılmalı ve 15 sözcüğügeçmemelidir.

Makalenin başında, en fazla 150 ile 200 sözcükten oluşan bir öz yer almıştır. Türkçe dışındaki dillerde yazılan makalelerde öz makalenin orijinal dilinin yanı sıra Türkçe ve İngilizce olarak da yazılmalıdır. İngilizce öz kısmında makalenin ismine de yer verilmelidir. Özlerin altında genelde özele doğru sıralanmış 4 ila 6 sözcükten oluşan anahtar sözcükler bulunmalıdır.

Başlıklar koyu harflerle yazılmalıdır. Uzun yazınlarda ara başlıkların kullanılması okuyucu açısından yararlıdır. Ana başlıkların, 1., 2., ara başlıkların, 1.1., 1.2., 2.1., 2.2 şeklinde numaralandırılması tavsiye edilir. Ana ve ara başlıkların tümü (ana bölümler, kaynaklar ve ekler) koyu harflerle yazılmalıdır.

Metin içindeki vurgulanması gereken ifadeler, "tırnak içinde" gösterilir, eğik veya koyu karakter kullanılmaz. Hem "tırnak içinde" hem eğik veya hem koyu hem eğik yazmak gibi çifte vurgulama yapılmaz.

Bölüm ve paragraf başlarında girinti uygulanmaz.

Yazılarda kullanılan çizim, grafik, resim ve benzeri malzemeler JPEG ya da GIF formatında olmalıdır. Görüsel malzeme ve ekler gerektiğinde e-posta yoluyla ayrıca ullaştırılmalıdır.

### **Kaynak Gösterimi**

Alıntı yapma ve kaynak göstermede APA yöntemi kabul edilmektedir.

Dipnot ve kaynakların yazımı konusunda, yöntem bakımından kendi içinde tutarlılık şarttır. Uzun yapıt (kitap, dergi, gazete vb.) adları eğik, kısa yapıt (makale, öykü, şiir vb.) adları ise "tırnak içinde" yazılır. Ayrıca dipnotların yalnızca metne alınamayan ek bilgiler için kullanılması önerilir:

Bir yapitin derleyeni, çevireni, yayına hazırlayanı, editörü veya künnyede mutlaka gösterilmelidir.

Elektronik ortamda metinlerin kaynak olarak gösterilmesinde, yazarı, başlığı ve yayın tarihi belirtilmiş olanlar kullanılır. Ayrıca künnye bilgilerinde parantez içinde erişim tarihi belirtilmelidir.

Ulaşılabilir kaynaklarda ikincil kaynak kullanımından kaçınılmalıdır.

Atif yapılmayan çalışmalara Kaynaklar kısmında kesinlikle yer verilmemelidir.

Kaynaklar metnin sonunda, yazarların soyadına göre alfabetik olarak yazılmalıdır. Eserlerin yaynevleri açık şekilde ve makalelerin bulunduğu sayfa aralıkları belirtilmelidir.

Latin harfleri dışındaki alfabelerle yazılmış makalelerde Latin harfleriyle yazılmış başlık, özet, anahtar kelimeler, ve kaynakçaya (referanslar) yer verilmelidir.

# *The Journal of Mesopotamian Studies*

## (JMS)

### Publication Principles

The Journal of Mesopotamia Studies (JMS) is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The JMS is a peer-reviewed journal which gives places to scientific researches on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature. It is published semi-annually (Winter and Summer Issues). The articles to be published should bear criteria of scientific researches, be innovative, and also should not be published anywhere else before. If an article has been presented in a scientific meeting, it will be accepted on the condition that it has not been published anywhere before.

#### The Evaluation of Articles

Articles submitted for publication are firstly examined by editorial board in accordance with the publication principles of the journal. The endorsed ones are sent to two reviewers. The authors corrected the article according to the notes by reviewers; however they have right to object to the points where they do not agree with.

Articles submitted for publication are sent to two experts of the field via method of "blind review" after they examined by Editorial Board. In the case of split opinion of these two reviewers, the article is sent to another reviewer. The article is published if at least two reviewers express positive opinion. The reports by reviewers are sent to the authors to pronounce the evaluation result.

If one or both reviewers express "it could be published after certain revisions", the article is sent to the author for the required revisions. After revisions are done, they are checked by reviewers or the Editorial Board to evaluate whether they are done in accordance with the remarks. Besides, the authors have right to object to the reviewers' opinions. The objections are evaluated and resulted by the editorial board.

The articles that decided to be published are sent to the author in PDF formatted after page adjustment. The author makes the last reading and shows necessary revisions on the text and sends it back.

The unpublished articles are not returned back to the rightful owner, furthermore the authors are responsible for the opinions of the articles.

The journal does not demand any fees to publish their articles, and likewise does not pay any fees for publishing articles.

The Editorial Board may make small adjustments those are not on the main stage.

It is accepted that the copyright of the published articles are transferred to The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. This transfer includes virtual platforms.

Article submission and evaluation process is conducted on Deripark system.

Before Evaluation process starts, the articles are analyzed via iTentica plagiarism program.

#### Language(s) of Publication

The JMS gives places to articles in Turkish, Kurdish, Arabic, English and Syriac. However, it accepts as a principle that at least half of the studies in the journal should be in Kurdish and its various dialects. The articles sent to the journal must be free from all kinds of defects related to the use of academic language.

#### Writing Rules and Page Layout

The articles must be written on MS Word or compatible programs. Times New Roman should be used as typeface. The articles should be written in 12 font size in 1.5 ink line spacing and the pages

should bear numbers. The articles should be maximum 9,000 words. The custom typefaces should not be used and if there are transcription signs, their documents should be sent with the article.

The name, surname, title, place of work, ORCID number and e-mail address of the author(s) must be stated.

The title of the article must be in accordance with the content and written in bold face, and also must not be longer than 15 words.

There must be an abstract of maximum 150 to 200 words at the start of the article. For the articles written in languages other than Turkish, the abstract must be written both in the original language of the article and in English. The title of the article must be stated before the abstract as well. There must be maximum 4 to 6 key words that ranked from general to specific at the bottom of the abstract..

The title must be written in bold face. There should be intermediate titles in the long articles. It is recommended that the main titles numbered as 1., 2., and intermediate titles as 1.1, 1.2., 2.1., 2.2. All the main and intermediate titles (main sections, sources and appendices) should be written in bold face.

Expressions highlighted in the text, must be «in quotes», bold or italic faces must not be used. There must not be double highlighting as «in quotes» and bold or italic.

There must not be intents at the start of section and paragraphs.

Illustrations, graphics, images and other materials those used in text must be in JPEG or GIF format. Visual material and attachments must be delivered also via e-mail if required.

#### References

APA is accepted for citation and references.

Methodical consistency is essential for writing the footnotes and sources. Names of long works (books, magazines, newspapers etc.) should be written in italic face, names of short works (articles, stories, poems and so on) «in quotes». Also, it is recommended that to use footnotes only for the additional information that cannot be given in the text.

The compiler, translator, preparer for publication, editor must be shown in the tag if exist.

In case of the citation of the text of electronic media, the name of author, title and date of publication which are specified are used. The date of access should also be noted in parentheses in catalog information.

The secondary sources should be avoided if the primary resources are available.

The works those have not been cited must not be shown in the sources.

The sources should be given at the end of the text in alphabetical order. The publishing houses should be given clearly and the pages ranges of the articles should be stated.

Articles written in any alphabets other than Latin alphabet should include the title, abstract, keywords, and references written in Latin.